

**K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YÎLÊ
ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZÎMAN Û ÇANDA KURDÎ**



**JI BO ZAROKAN ÇÎROKÊN AJALAN
(MÎNAK ÇÎROKÊN KOVARA HENG 2001-2011)**

TEZA LÎSANS A BİLİND A BİTEZ

**AMADEKAR
MOHAMMED KHIDHIR**

WAN - 2017

**K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YÎLÊ
ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZÎMAN Û ÇANDA KURDÎ**



**JI BO ZAROKAN ÇÎROKÊN AJALAN
(MÎNAK ÇÎROKÊN KOVARA HENG 2001-2011)**

TEZA LÎSANS A BİLİND A BİTEZ

**AMADEKAR
MOHAMMED KHIDHIR**

**ŞÊWIRMEND
Doç. Dr. VECİHİ SÖNMEZ**

WAN - 2017

KURTE

JI BO ZAROKAN ÇÎROKÊN AJALAN

Zarok her dem ji xwandin, guhdarî û temaşe kirina çîrokan hez dikin. Çîrok di wêjeya zarokan de yek ji hunerên herî bi bandor e li ser hizr, derûn û kesayetiyê zarokan. Di nav cureyên çîroka zarokan de jî çîroka bi zimanê ajal, teyr, rehek û tiştên nejîndar çavkaniya herî dewlemend ya wêjeya zarokan e û cureya herî belave di nav hemî belavokên taybet bi zarokan. Di dîroka wêje û rojnamegeriya Kurdiya zarokan de, girîngiyê zêde bi çîroka zarokan û çîroka bi zimanê ajalan hatiye dayîn. Kovara Heng jî yek ji wan kovarane ku bi sedan çîrokên bi vî awayî têde hatîne nivîsandin û weşandin. Ev lêkolîn xebateke ji bo behskirin û zelalkirina “Çîroka ajalan ji bo zarokan” û mînakên vê di kovara Heng de.

Ev xebat li pêşgotin, destpêk, sê beş, encam, çavkanî û her wiha kurteya lêkolînê ya bi zimanên Tirkî û Înglîzî pêk tê.

Di beşa yekem de gotûbêj li ser çend mijarên sereke hatiye kirin, di nav wan de jî: Têkeliya di navbera mirov û ajal, zarok û ajal, ajal û berhemên wêjeyî, efsane û xurafeya ajalan, dîroka peydabûna çîroka ajalan, çend berhemên herî navdar yê cîhanê. Her wiha di wêjeya folklorê Kurdî de efsane û hikayetên jîndaran.

Beşa duyemîn jî behsa çend hêlên wêjeya Kurdî ya zarokan e û li sê mijarên sereke pêk tê. Dîroka destpêk û peydabûna wêjeya Kurdî ya zarokan, çîroka kurdî ya zarokan, heman dem cureyê çîroka ajalan e.

Di beşa sêyemîn de jî behsa sê mijarên sereke hatiye kirin. Di rojnamegeriya zarokan de geşedana çîroka zarokan, rola kovarên zarokan di xizmetkirina wêjeya zarokan de. Her wiha bi awayeke berfireh behs ji çend hêlên girîng yê kovara Heng hatiye kirin, digel anîna hin çîroka ajalan weke mînaka piratîkî ya lêkolînê. Di dawiyê de jî encama tezê di neh xalên girîng de hatiye pêşkêş kirin.

Peyvên Sereke: Wêjeya Zarokan, Çîroka Zarokan, Çîroka Ajalan, Kovara Heng.

ÖZET

ÇOCUKLAR İÇİN HAYVAN HİKAYELERİ

Çocuklar hıkaye okumayı, dinlemeyi ve resimli hikayeleri severler. Çocuk edebiyatında hikaye, çocukların fikir, psikoloji ve kişilikleri üzerinde etkili sanatlardan biridir. Çocuk edebiyatı türleri içerisinde, hayvan ve cansız varlıkların diliyle anlatılan hikayeler en zengin kaynağa sahip olan ve en yaygın olan türdür. Kürt çocuk edebiyatı tarihi de çocuk hikayeleri ve hayvan dilli hikayelerine büyük önem verilmiştir. Bu türden biri olan Heng dergisi bu türün yüzlerce hikayesini içermektedir. Bu araştırmada “Çocuk Hayvan Hikayesi” irdelenmiş ve açıklanmış ayrıca bu türün Heng dergisindeki hikayelerine yer verilmiştir.

Bu araştırma önsöz, başlangıç, üç bölüm, sonuç, kaynakça, araştırmanın özeti ayrıca araştırmanın İngilizce ve Türkçe özetinden oluşmaktadır.

Birinci bölümde birkaç önemli konu üzerinde durulmuş. Bu konularda insan ve hayvanlar, çocuk ve hayvan, hayvan ve edebi eserler, efsane ve hayvan hurafeleri, hayvan hıkaye tarihinin parlak dönemi, dünyada ünlü birkaç eser, ayrıca kürt folklor edebiyatı'nda efsane ve yaşayan varlıklar ile ilgili hikayeler üzerinde durulmuştur.

İkinci bölüm, üç ana konudan oluşup çocuk edebiyatının birkaç alanına dair bilgiler içermektedir. Bu konular; Çocuk edebiyatı tarihinin başlangıcı ve en parlak dönemi, kürt çocuk hikayesi, hayvan hıkaye çeşitlerinden oluşmaktadır.

Üçüncü bölümde ise şu ana konular üzerinde durulmuştur: Çocuk gazeteciliğinde çocuk hikayeciliği'nin gelişimi, çocuk dergileri ve bu dergilerin çocuklar arasındaki yeri, son başlıkta ise Heng dergisi birkaç önemli açıdan örneklerle etraflıca değerlendirilmiş ve son olarak araştırmanın sonuç bölümü de önemli dokuz nokta olarak sunulmuştur.

Anahtar Kelimeler: Çocuk Edebiyatı, Çocuk Hikayesi, Hayvan Hikayesi, Heng Dergisi.

ABSTRACT

ANIMALES STORIES FOR CHILDREN

Children like reading, listening and watching stories. Regarding children's literature, children stories considered to be the most powerful art on children's mentality and thoughts. Among the children's stories, Fable stories are being found to be the richest children's literature resources and explicitly flourished stories in the world of children's media. Going back to the Kurdish history of children's literature and media, we can find that very much paid attention to children stories in particular Fable stories. For example, 'Heng Magazine' is one of the well-known children magazines which published hundreds of this kind of stories.

This study attempts to explain and demonstrate 'Fable Stories to Children' including samples of 'Heng Magazine' stories. This study made of preface, introduction, three chapters, results and references. Moreover, the abstract is provided in English and Turkish language.

In the first chapter, several main subjects have been discussed. For instance, the relationship between human being and animals; animals and children, animals and literature, fables and myth, the beginning history of fables, and some famous international literary studies. Also in the first chapter, fables and myth are discussed bearing in mind the Kurdish Folkloric Literature.

In the second chapter, Kurdish Children's literature is discussed. This chapter made of three main topics including the beginning of Kurdish children's literature, Kurdish children stories and kinds of fable stories.

In the third chapter, the following three topics have been discussed. The first topic is about the flourish of children stories in the children's media view. The second topic is about children magazines and its role in the education of children. And the third topic is about important explanations of some examples of stories that 'Heng Magazine' published as a main practical method for this study. At the end, the results of this study have been presented through nine important points.

Key Words: Children's Literature, Children Stories, Fable Stories, Heng Magazine.

SPASNAME

Ji bo alîkarî, pêşniyar û têbîniyên wî ku di pêvajoya pêkanîna lêkolîn û nivîsîna tezê min de pêşkêşî me kir, gelek spasiya mamoste û şêwirmendê xwe yê birêz Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ dikim.

Gelek spasiya serokê beşa zimanê Kurdî mamoste yê biqedr Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ jî dikim ku bi awayeke berdewam di pêvajoya pêkanîna lêkolînê de gelek piştgirîya me kir û her tim ji bo hevkarîya min emade bû. Her wiha pir spasiya endamê lîjneya gotûbêja parastina tezê birêz Yrd. Doç. Dr. İbrahim SÜRÜCÜ dikim ku demên xwe yê nîrxdar ji bo me terxan kirin û bi nêrîn û têbîniyên xwe sûd gihandin vê tezê.

Ji bo ronahiya çavan diya xwe re vê xebatê diyarî dikim ku ji bo dûriya me gelek xemgîn bu. Her wiha spasiyeke zêde ji bo hevjin û her çar zarokên min ku hertim piştewaniya min kirin, ji bo min pir zehmet dîtin û zêde sebr kirin.

Gelek spas ji bo hevalê 'ezîz û hêja İdrîs Mohammed Sadiq ku bi awayeke berdewam ev hemî çavkaniyên pir sûd ji bo min re şandin û hertim piştgirîya min kir.

Ji bona alîkarîya wî pir spasiya xwe ji hevalê 'ezîz Mecrum Balîsanî re dikim.

Heman dem pir spasiya xwe ji mamosteyê hêja Ehmed Serhedî re ji bo rastnivîsê û hemî hevkarîyên wî dikim.

Ji bo alîkarîya Kurmanciyê pir spasiya hevalê hêja Sabir Ebdulahî Zad dikim.

Gelek spas ji bo hevalê 'ezîz Ehmed Meer ji bo wegerê zimanê Înglîzîyê.

Pir spas ji bo mamosteyê birêz Mehmet Ronî ji bo wegerê zimanê Tirkî.

Hêvî dikim di pêşerojê de ev xebata me ye watedar bi awayekî ber fireh bi Kurdiya Soranî û Kurmancî bi her du tîpên Latînî û 'Erebî bê çap kirin.

Mohammed KHIDHIR

Wan - 2017

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
ABSTRACT	III
SPASNAME	IV
NAVEROK	V
KURTEBÊJE	VII
PÊŞGOTÎN	VIII
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	2
1. TÊKILIYA DI NAVBERA MIROV Û AJALAN DE	2
1.1. DI NAVBERA MIROV Û AJALAN DE TÊKILIYA RUHANÎ.....	2
1.2. TÊKILIYA DÎ NAVBERA ZAROK Û AJALAN DE	3
1.3. TÊKILIYÊN AJAL Û BERHEMÊN WÊJEYÎ	5
1.4. EFSANE	6
1.4.1. Kurteya Efsaneyê	6
1.4.2. Efsaneyên Ajalan	7
1.5. XURAFE	8
1.5.1. Kurteya Xurafeyê	8
1.5.2. Xurafeyên Ajalan	9
1.6. ÇÎROKA AJALAN Û TOTEMÎSM	11
1.7. DÎROKA PEYDABÛNA ÇÎROKÊN AJALAN	14
1.7.1. Destpêk û Çavkaniya Çîrokên Ajalan	14
1.7.2. Di Wêjeya Cîhanê de Çîrokên Ajalan	16
1.7.3. Di Wêjeya 'Ereban De Çîrokên Ajalan	17
1.8. DÎ QURANA PÎROZ DE ÇÎROKÊN AJALAN	19
1.9. ÇEND BERHEMÊN HERÎ NAVDAR	22
1.9.1. Çîrokên Îsop an Îzop	22
1.9.2. Çîrokên Kelîle û Dimne	26
1.9.3. Çîrokên Hezar û Yek Şev	28
1.9.4. Çîrokên Lafontîn	30
1.10. DÎ WÊJEYA FOLKLORA KÛRDÎ DE AJAL	32
1.10.1. Wêjeya Folklorê Kurdî	32
1.10.2. Di Wêjeya Folklorê Kurdî de Efsaneya Jîndaran	34
1.10.3. Di Wêjeya Folklorê Kurdî de Hikayeta Jîndaran	35
BEŞA DUYEM	37
2. WÊJEYA KURDÎ YA ZAROKAN	37
2.1. DÎROKA DESTPÊK Û PEYDABÛNA WÊJEYA ZAROKAN	38
2.2. ÇÎROKA ZAROKAN	40
2.2.1. Dîroka Peydabûna Çîroka Kurdî ya Zarokan	43
2.2.2. Li Gor Naverokê Cureyên Çîrokên Zarokan	45
2.3. ÇÎROKA AJALAN	48
2.3.1. Navên Têgeha Çîroka Ajalan	49
2.3.2. Pênaseyên Çîroka Ajalan	51
2.3.3. Li Gor Qonaxên Temenê Zarokan de Cihê Çîroka Ajalan	51

BEŞA SÊYEM	56
3.DÎ ROJNAMEGERIYA ZAROKAN DE GEŞEDANA ÇÎROKÊN ZAROKAN	56
3.1.ROJNAMEGERIYA ZAROKAN	56
3.2.KOVARÊN ZAROKAN	58
3.3.KOVARA HENG.....	60
3.3.1.Teybetmendiyên Kovara Heng	61
3.3.2.Çîrokên Kovara Heng	61
3.3.3.Di Kovara Heng de Cureyên Çîrokên Ajalan	63
3.3.4.Di Kovara Heng de Nirx û Bihayên Exlaqî û Perwerdeyî.....	64
ENCAM	71
ÇAVKANÎ	73
PÊVEK-1	79
PÊVEK-2	80
JÎNENÎGARÎ	84

KURTEBÊJE

amd.:	Amadekar
b.:	Berg
b.n.:	Berhema navborî
b.z.:	Beriya Zayinê
bnr.:	Binêr
c.:	Cild
ç.:	Çap
g.:	Gotar
g.n.:	Gotara Navborî
h.b.:	Heman Berhem
h.b.n.:	Heman Berhema Navborî
h.g.n.:	Heman Gotara Navborî
h.r.:	Heman Rûpel
hwd.:	Her Wekî Din
j.:	Jimare
r.:	Rûpel
s.:	Sal
s.x.l.:	Silava Xwedê Lêbe
wer.:	Wergêr
weş.:	Weşanxane, Weşanên

PÊŞGOTÎN

Wêjeya zarokan pêvajoye perwerdehî, zanistî, hunerî ya berfireh û girîng e. Ji ber ku di perwerdekirin û pêgihandina kesayetiya zarok û bingehî danîna pêşeroja zarok de xwedî rola bi bandor e. Di encamê de jî dibe sedemê pêşkêşkirina kesek ya aktîf û bi sûd ji bo civaka her gelekî û ya mirovahîyê bi giştî. Di wêjeya zarokan de çîroka zarokan yek ji huner û cureyên bi bandor e li ser hizr û derûn û kesatiye zarokan. Zarok ji xwandin û guhdarî kirina çîrokê pir hez dikin. Di nava cureyên çîroka zarokan de jî çîroka bi zimanê ajal, teyr, rehek û tiştên nejîndar, çavkaniya herî dewlemend ya çîroka zaroka ye û cureyê çîrokê ya herî berfireh e di hemî belavokên taybet bi zarokan de.

Salane weşandin û belavkirina bi sedan hezar pirtûk, kovar û belavokên tijî ji çîrokên ajalan ku pîrn ji wêneyên balkêş û rengreng li ser asta cîhanê. Her wiha ji aliyê din afirandina bi hezaran film, animasyonên ajalan (animation movies) û mesrefekî mîlyon dolarî û qezanckirineke mîlyon dolarî, belgeya zindî ya girîngiya vê awayê çîroka zarokan e.

Di dîroka wêje û rojnamegeriya Kurdî ya taybet bi zarokan, girîngiyeke zêde ye bi çîroka zarokan û çîroka bi zimanê ajalan hatiye dayîn. Kovara Heng yek ji wan kovara ye ku bi sedan çîrokên bi vî awayî têde hatîne nivsandin û belav kirin. Em di vê lêkolînê de dixwazîn ku pêngavekê ji bo behskirina vê awayê çîrokê hilgirîn. Tevî ku dizanîn lêkolîna me bê kêmasî nabe jî, lê em li ser vê bawerîyê ne ku hewl û xebateke baş be ji bo pirtûkxaneyên Kurdî û meydana lêkolîna zanistî. Li ser vê hêvîyê ne ku ev xebata me bibe çavkaniyek ji bo lêkolînerên din ku bikarbin xebatên zêdetir li ser bikin û di vê mijarê de lêkolînên berfirehtir û xizmetên baştir ji bo zarokên gelê Kurd bîn pêşkêş kirin. Helbestvanê navdar Ehmedê Xanî jî dibêje:

Nûbar e eger şîrîn eger tal
Metbû'e ji rengê new'ê etfal
Min hêvî heye ji ehlê halan
Teqbîh nekin evan etfalan

Sernav û Sînorên Lêkolînê

Sernavê vê lêkolînê “Ji Bo Zarokan Çîrokên Ajalan, Mînak Çîrokên Kovara Heng 2001-2011”e. Yanî sînorên lêkolîna hanê tenê çîrokên zarokan û cureyê

çîrokên ajalan (Fabl)e, ji hêla piratîkî ya lêkolînê jî tenê mînaka çîrokên kovara Heng di salên 2001-2011 de û hejmarên (59-174)ê bingeh digre. Mebest li çîrokên ajalan tenê ev çîrokin ku xwemalî ne û ji aliyê nivîskarên Kurd weke pexşan hatîne nivîsandin û ev xebate çîrokên ku li folklorê hatîne amade kirin an li zîmaneke biyanî ve hatîne werger kirin, li xwe nagire. Her wiha yê ku bê sînariyo ne yanî wêne nebûye parçeyê sereke yê vegotina çîrokan.

Sedemê Hilbijartina vê Mijarê

Em dikarin du sedemên sereke ji bo hilbijartina vê mijarê destnîşan bikin:

1. Hez û xwasta takekesî ya me ji bo ev cureyê çîrokên zarokan û xebitîna me li sala 2005ê pê ve di hêla nivîsîn û wergerandina çîrokên zarokan di kovarên zarokan de bi taybet di kovara Heng de.

2. Xebata me ya bi fermî weke karmendê hikûmetê di kovara Heng de û wergirtina derfeta fermî ya xwandinê ji bo xwandina lîsansa bilind û lêkolîn di derbarê medya û wêjeya zarokan de.

Armanca Lêkolînê

Ev lêkolîn bibe pêngavek ji bo bêhtir nasandina cureya çîroka ajalan û nîşandana girîngiya ev awayê çîroka hezkirî yê zarokan ji hêla naverokê ve, ji bo ku nivîskar û pisporên perwerdeya zarokan bikaribin di çarçoveya ev cureyê çîrokê geşedanên zêdetir di zemîna wêjeya zarokan biafirînin û di hêla perwerde û derûniya zarokan de zêdetir sûdê jê bigrin.

Zelalkirina girîngî û bandora rojnamegerî û kovara zarokan da ku aliyên berpirsên rêveberiyê derka vê bikin û di weşandin û belavkirina kovara zarokan de bi şêwazeke serdemî û zanistî paşguhkarîyê nekin.

Astengiyên li Ser Rêya Lêkolînê

Em dikarin çend astengên li ser vê xebata me wiha diyar bikin:

1- Kêm bûna çavkaniyên zanistî û akademîk di vê hêlê de bi zîmanê Kurdî û bitaybet bi zaraveyê Kurmancî.

2- Xirabiya rewşa aborî û siyasî ya herêma Kurdistanê û qutkirin û kêmkirina debara memûrên dewletê, di heyama derfeta xwandinê de bandorek e pir xirab li ser jiyana taybet û malbatî ya me çêkir.

3-Ji ber mayin û rûniştina min li Tirkîyê û zehmetbûna hatinçûnê di heyama xwandinê de, bidestxistina hemî çavkaniyên pêwîst yê weke “pirtûk, kovar û belavok” bi zimanê Kurdî bi zaraveya Soranî kareke pir zehmet bû.

Rê û Rêbazên Lêkolînê

Ev lêkolîn bi rêbaza raveya wesfî bi şêwaza teorîk, piratîkî û li ser bingeheke zanistiyê hatiya pêkanîn.

Pîlana Lêkolînê

Ev lêkolîn li pêşgotin, destpêk, sê beş, encam, çavkanî û digel van kurteya lêkolînê bi zimanên Tirkî û Îngilîzî pêk hatiye. Bi wî awayî ku pêşgotin ji deriyekê û behskirina li sernav û sînoren lêkolînê pêk tê, sedemê hîlbijartina mijarê, armanc û tengasiyên lêkolînê, dîsa jî diyarkirina cureyê rêbaz û pîlana lêkolînê.

Di beşa yekemîn de behsa çend mijarên sereke hatiye kirin, di nav wan de jî têkeliya di navbera ajal û zarokan de û ajal û berhemên wêjeyî, efsane, xurafeya ajalan, dîroka peydabûna çîrokên ajalan, çend berhemên herî navdar yê cîhanê. Her wiha di wêjeya folklor ya Kurdî de efsane û hîkayetên jîndaran.

Beşa duyemîn taybet e bi çend hêlên wêjeya Kurdî yê zarokan û li sê mijarên sereke pêk tê. Dîroka destpêk û peydabûna wêjeya Kurdî ya zarokan, çîroka zarokan, heman dem çîroka ajalan.

Di beşa sêyemîn de jî behs ji sê mijarên serekê tê kirin. Di rojnamegeriya zarokan de geşedana çîrokên zarokan, kovarên zarokan û rola wan ji bo xizmeta zarokan. Di dawiyê de jî bi awayeke berfireh behs ji çend hêlên girîng yê kovara Heng ya zarokan hatiye kirin li gel anîna çend çîrok weke mînakên piratîkî yê lêkolînê.

Di Derbarê Mijarê de Xebatên Berê

A.Di Derbarê Mijara Çîrok û Hîkayeta Ajalan de

Pirtûka "Mindal û Edeb" ji aliyê nivîskar Newzad Elî Ehmed sala 1998 hatiye çapkirin. Pirtûkeke biçûk e lê di rûpelên vê de behs ji wêjeya zarokan kiriye û bi taybet lêkolîna di derbarê mijara çîroka zarokan de, nivîskar di pênc sernavan de behs ji gelek hêlên wêjeya zarokan dike. Ji bo destpêkê her beşekê jî pêşgotinek nivîsandiye û di dawiyê de jî encama vê diyar kiriye. Yek ji wan behsan têkeliya wêjeyî ya zarokan e digel folklorê Kurdî de. Ya girînge û têkeldarê lêkolîna me ye, eve ye ku lêkolîner di vê beşa lêkolîna xwe de her çiqas kêr jî be, lê bi awayeke

taybet behs ji təkeliya di navbera zarok û ajal kiriye, di berdewamiyê de jî hin mînakên çîrokên ajalan di folklorê Kurdî de aniye û li ser van nîqaş kiriye.

Lêkolîner di van çend rûpelên lêkolîna xwe de û di derbarê wêjeya zarokan û folklorê Kurdî, bi sîd wergirtin ji hin çavkaniyên 'Erebî û Kurdî, behs ji rola ajalan di nava çîrokên folklorî yê Kurdî li ser zarokan dike û li ser du beşan dabeş kiriye.

Di beşa yekem de bi awayeke têr û tijî, behs ji rola ajal dike û her wekî bixwe amajê pê dike, hewl daye təkeliyêke gûncav di navbera ajal û mirov û derdorê peyda bike.

Di beşa duyem de jî di derbarê çend serbehsên nû de gotûbêj dike, hevdem digel anîna çend mînakên gûncav ji bo her babetekê. Lêkolîner dinivîse ajal ev jîndar e ku zarok jê hez dike, hezkirina her ajalekê jî li bal zarok li gor hez û xwasta zarokî li çend hêlên ku girêdayî derûniya zarokan e diguhere.

Cihê balkişandinê ye lêkolîner baweriya xwe bi "Teoriya Geşeya Darwîn" û bandora vê bi vê awayê pirsê te'bir dike û dinivîse "Kê dibêje ku rojên mirov yê destpêkê li ajalan dest pê nekiriye, an jî guherînek bi ser de nehatiye!". Hêleke din ku cihê balkişandinê ye lêkolîner balinde ji ajalan cuda kiriye û her wekî bixwe amajê bi vê yekê dike ku ji ajal û teyran tenê beşek diyar kiriye ev jî ajal e û li ser vê bawerê ye ku piraniya nivîskarên Kurd wan duyane têkel hevdu dikin.

Pirtûka folklorên Şukriye Resûl "**Hîkayetî Folklorî Giyandaran Remzî Mar**" pirtûkeke hecim biçûk e, lê lêkolîneke pir girîng e û kom kirin û nirxandina komek hîkayetên taybet bi jîndaran li xwe digre. Her wekî amadekarê vê amajê pê dike, pêwîste sîd ji kom kirina wan hîkayetan bigre û nirxê wan bê diyar kirin. Di vê pirtûkê de ji bo cara yekemîn di wêjeya folklorê Kurdî de bi awayeke têr û tijî bes ji şiklê mar tê kirin û lêkolîna ji mar weke mînakê jîndaran hatibe kirin, bi taybet li gor rêbaza Antropolojî di navbera mirov û mar de û afirandina ev hemî çîrok, hîkayet, efsane û şîret û serhatî ku di hizra gelan û Kurdan de saz bûye. Ev lêkolîn dixwaze vê çendê zêde bike ku di dirêjîya dîroka mirovahiyê de jîndarek weke mar bi awayeke baş û xirab di nava hizr û dînên destpêkê û yê asimanî de rol gerandin e û bala mirovan kişandiye.

Amadekar di dawîya lêkolîna xwe de amajê bi gelek encamên girîng dike û di nav de. Hîkayeta jîndaran her ji destpêkê de serhildaye û di hizra netewan de pir tiştên seyr û balkêş di derbarê wan de hatiye gotin, ev jîndarane di hîkayetan de weke

remz ji bo armancekê hatîne bikar anîn, her wiha weke mirov xwenîşan didin û rola xwe dilîzin û bûne leheng. Hin ji wan ajalan bi mirovan re diaxivin, di nava wan de jî (mar) weke mînak di bîr û bawer û nerîna netewan de bûye remzek û di gelek hikayet û efsaneyên gelan û bi taybet gelê Kurd de bi awayeke berfireh cih girtiye.

Lêkolîna **Celal Enwer Se'îd** bi sernavê **Gêranewe be Zimanî Ajalan Romanî (Gemal)î Xwsrew Caf be Nimûne** di hejmara 36'ê ya kovara zankoya Koyê hatiye weşandin. Ji du beşan pêk tê, beşa yekem weke dergehê detpêke ji bo nav beşa duyem. Lêkolîner di sê pişkan ji hêla teorîk de behs ji têgeh û pênaseya çîroka ajal û destpêka peydabûna vê her wiha behs ji sedemên peydabûna ev awayê cureyê wêjeyê dike. Di beşa duyem de jî ku armanca sereke ya lêkolînê ye, bi awayeke teorîk û piratîkî behs ji teknîkên vegotinê di romana Gemal yê romannûsê Kurd Xwsrew Caf dike.

Lêkolîner di dawiya lêkolîna xwe de çend encamên girîng diyar dike, di nav wan de jî eve ku di her du wêjeyên devkî û nivîskû yên Kurdî de, me ji bo zarokan çîrok û helbesta ajalan heye, lê bo ev cureyê janra edebî ji bo mezinan, romana Gemal yekem romana nivîsandî ya wêjeya mezinan e di wêjeya Kurdî de. Lêkolîner dibêje nivîsandina romana Gemal bi zimanê ajalan vedigere rewşa siyasî, paşê jî ji bo bexşîna tam û xweşiyê bi xwendevanan. Eşkereye lêkolîner sûd ji gelek çavkaniyan wergirtiye, bi taybet çavkaniyên bi zimanê 'Erebî.

B.Di Derbarê Kovara Heng de

Teza lîsansa bilind bi sernavê "**Bînay Hunerî Çîrokî Mindalan le Çîrokekanî Govarî Heng Da (1993-2000)**" ya lêkolîner Rizgar Ebdûlqadir Se'îd e li zanîngeha Selaheddîn Îlona 2008ê hatiye parastin. Her wekî di sernavê tezê de derdikeve, ev lêkolîn tenê taybet e bi heft salên kovara Heng, sala 1993 heya 2000'ê û salên din li xwe nagire, her wiha tenê ev çîrok ji aliyê lêkolîner ve hatîne hilbijartin ku ji aliyê kesekê ve hatibin nivîsandin û bê sînariyo ne, wate wêne weke parçeyê bingehîn yê vegotinê cih nagire. Lêkolîner sedema hilbijartina kovara Heng di nava kovarên zarokan û bi taybet çîrokên vê kovarê, vedigerîne temen û berdewamî û girîngiya ku kovar dide çîrokên zarokan û bandora vê kovarê li ser zarokan, her wiha rola vê kovarê di pêşvebirina çîroka zarokan li wêjeya Kurdî de.

Lêkolîner di lêkolînê de rêbaza lêkolîna şiroveyî ya wesfî bi şêwazeke teorîk û piratîkî, li gor binyadeka zanistî û pîskolojîk ceribandîye. Lêkolîn ji destpêk û sê

beş û encamê pêk tê. Lêkolîner di beşa sêyemîn de bi awayekî berfireh behs ji binyadên hunerî yên sereke ya çîroka zarokan di kovara Heng de dike ku ev jî ev e:

Binyada bûyerê, binyada vegotinê, binyada kesayetiyê, binyada cih, binyada demê. Lêkolîner di dawiya lêkolîna xwe de encamên girîng di nava neh xalan de kom kiriye û di nava wan de kovara Heng weke yek ji kovarên bi temenên Kurdî ji bo zarokan, roleke berçav hebûye di geşekirina çîroka zarokan di wêjeya Kurdî de, her wiha encameke din ya girîng ya vê lêkolînê ev e ku binyada hunerî yê çîrokên kovara Heng bi awayeke giştî piraniya bingehên hunerî têde ne û ev bingeh jî bi awayeke serkeftî hatîne bikar anîn.

"Diyalog Der Dastanheyê Farsî ve Kurdiyê Kûdekan Ber Mebnayê Mecelat Kêyhanê Beçêha û Heng (1993-2000)" Teza lîsansa bilind e bi zimanê Farsî ya Pexşan Muhemmed Mehmûd li zanîngeha selaheddîn mijdarê 2009 hatiye parastin. Ev tez e bi sernavê gutûbêj di çîrokên zarokên Fars û Kurd de li kovara Keyhana Zarokan û Heng, di salên 1993 û 2000ê. Muqayeseke di nava her du kovarên Keyhan Biçêha û Henga zarokan de, ji sê beşan pêk tê, di beşa yekemîn de pênaseya wêje, mefhum û têgehên cur bi cur li ber roniya dîtin û nerîna rexnegir û nivîskarên pispor yên vê mijarê hatîne kom kirin, her wiha behs ji peydabûn û rola rojnamegerî di wêjeya zarok û nûcivanan kiriye, li beşa duyemîn de qala çîrok û derûnasiya zarok û nûcivanan kiriye, paşê jî şêwazên 'unsurên çîrokê pêşkêş kiriye, digel dîrokçeyê peydabûna wêjeya danberhevkarîyê.

Beşa sêyemîn jî qala nasandina diyalog û cureyên vê û çavaniya tewzîfkirina wan di çîrokê de kiriye ku mebest û armanca lêkolînê ye. Nivîskarê tezê li ser vê bawerê ye û gihîştîyê vê encamê, ku nivîskaran di her du kovaran de hewleke baş daye ji bo afirandina mijarên cur bi cur û şêwazên pir reng di bikargirtina cureyên diyalogê weke teknîkeke sereke di nivîsîna çîroka zarokan de.

Mohammed KHIDHIR

Wan - 2017

DESTPÊK

Têkiliya di navbera mirov û ajalan de vedigere serdemên herî kevn ku bi hev re li ser erdê jiyane. Her di wan serdeman de jî mirov bi ajalan re mijûl bûye û di navbera wan de têkiliyên ruhî çêbûne. Ev jî di encama xeyalên mirovî û bi alîkariya siruştên ajalan ku bi bêdengiya xwe ya tijî tarîfî, raz û nihênî û hêzek wiha ku tirsê têxe dilê mirovan. Dîsa jî di navbera mirov û ajalan de têkeliyên maddî jî çêbûne. Bi awayekê ku hin caran bûye sedemê pêşbaziye û hin caran jî bûye sedemê hevkarîye. Mirov ji ajalan şîretek wiha girt ku bibe alîkar ji bo serkeftina dereceyên şaristaniyê û ji bo rizgarbûn ji jiyana koçberiyê.¹

Ji aliyê têkiliyên maddî ve, ev têkiliya di serdema kevn û nû de û li ser esasê qencyên ajalê ji bo mirov hatiye berçav girtin. Rêjeyeke zêde ji lêkolîneran avabûn û geşekirina şaristaniyê bi girêdayî ji hîn bûna mirovî ji ajalan re di çaxên kevin de dibînin. Ajal bûn sedem ku mirov li cihekê kom bibin. Bêhêziya mirov li hember hin ajalan yek ji wan serdeman bû ku li cihekê kom bibin û hevdu nas bikin ji bo vê yekê ku li hemberî wan ajalên hêzdar xwe biparêzin. Mirov ji ajalan re hîn bû ku çawa tiştan 'embar bike. Ev tişt jî bû harîkar ku bikaribe li şûnekê cihgir bibe û li debara xwe ya rojane bigere. Her wiha mirov çend kar û pîşeyên din yê girîng di bin bandora ajalan de hîn bû.²

Di serdema destpêkê jiyane de mirovan ajal wek xwedî ruh û peyvîn didît û wisa hizir dikir ku ajal jî weke mirovane. Dibe ku mirov ajal weke hêmanek, wêneyeke xwedawendê an jî hêzek li jor hêza xwe nixandibe ku mirov nikare wî bibîne. Li ser vê esasê jî dest bi perestîşa ajal weke şikl û hêmaneke xwedawendê kirbe. Em dikarin bêjin ku di encama ev têkeliya ruhî de jî mirovan bi hizir û xeyala xwe gelek xurafe, efsane, hikayet û çîrokên ajalan afirandine.³

¹ Ebdulrezaq Hemîde, *Qises el-Heywan Fi el-Edeb el-'Erebî*, weş. Mektebet el-Enclu el-Mesiryê, el-Qahîre, (?), r. 9.

² *b.n.*, r. 16-19.

³ *b.n.*, r. 30.

BEŞA YEKEM

1. TÊKILIYA DI NAVBERA MIROV Û AJALAN DE

1.1. DI NAVBERA MIROV Û AJALAN DE TÊKILIYA RUHANÎ

Ji hêla peywendiya ruhî ve têtikiliya di navbera mirov û ajalan de gihîştîye astekê ku mirov bi çaveke pêroz li ajalan mêze bike. Heya wê astê jî ku weke afirînerêk îbadeta wan bike. Sedemê vê yekê jî ev e ku hişê mirovê berê ne di vê astê de bû ku nîrxandînek rast û dirust bike û xwedî vê hêzê nebû ku bikaribe sedemên rasteqîn yê tiştan fêhm bike. Ji ber vê çendê jî nerînên cuda di derbarê ajalan de çê bûn. Weke mînak ev ramana ku ajal jî weke mirov xwedî ruh e û paş mirinê jî ev ruh dê bimîne. Her wiha ev nerîn ku ajal zindî be an mirî, xwedî hêza qencî û xirabiyê ye ji ber vê yekê jî ev tişt asayî ye ku mirov hewl bide ku xwe li qencyê nêzik bike û hêza xirabiyê jî li xwe razî bihêle. Ev jî bi qurban kirin û pêrozanîna ajalan û îbadeta ajalan ya li ser vê esasê ku ajal e, yan jî xwedî ruheke pêroz e.⁴

Baweriya hin neteweyên destpêkê ev bûye ku ruha ajalê, berê ruha mirovekê li bûye, bi taybet dema hin ajalên ku dişibîyan heval an jî xizmên wan yê mirî didîtin, ji ber vê çendê jî wisa rêz û hurmet pê dibexşin ku nêzik asta îbadetê bûye.

Hin eşîr û êlên din jî li ser vê baweriyê ne ku ruha bav û kalên van diçe nav laşê ajalan. Ji ber vê çendê jî îbadeta ajalan dikin. Hin gelên din jî li ser vê baweriyê ne ku piştî mirina laş, ruh diçe nav laşêke din. Ev laşê nû jî dibe yê mirov an ajalekê be, ev pêvajoyê jî weke "Metempsychosis" an jî bi 'Erebî el-Tenasux tê binav kirin. Misriyên kevn û Budîstan bawerî bi veguhastina ruhê an jî bi wateyeke din tenasuxê hebû. Budîstan wisa hizr dikirin ku gelên din jî baweriya tenasuxê ji wan girtine û di bin bandora Budîzimê û Hînduiyetê pêk hatîye. Di bin bandora misriyan de filozofê Yewnanî Pîtagoras⁵ jî bawerî bi tenasuxa ruhê di navbera mirov û ajalan de hebû û wisa hizr dikir ku paqîjbûna mirov di jîyanê de bi dirûşmên olî û fikr û raman û felsefeyê pêk tê.

⁴ 'Ebdulrezaq Hemîde, *b.n.*, r. 10.

⁵ Pîtagoras (Pythagóras), filozof û matematîknasê yewnanî, di salên 580 û 500 B.Z. nê jiyaye. Teorema wî ya herî navdar, teorema Pythagoras e. Ew weke bavê hijmaran tê naskirin.

Di serdemên herî kevn de li Misrê îbadeta ajalan peyda bûye û ajalên weke golik, çêlek, pez, tîmseh û pisîk û hwd. îbadet kirine. Îbadeta ajalan heya îro jî di nav gelên paşketî de berdewam dike. Ev tişt di nav gelên xwedî şaristaniyet de jî tê dîtin. Di nav wan de Hindistan weke yek ji netewên herî girîng li cîhanê, Heya îro jî îbadeta ajalan têde maye û pîroziya çêlekê ne bi tenê ji aliyê Berahîmî û Hîndûyan ve tê parastin, belkî rojane tîm îbadetkîrin û sicdê ji bo wan dibin û gulan pêşkêşî wan dikin.

Ji bo daxuyandina tîkiliyên di navbera ajal û mirovan de, folklorist û nivîskarê Amerîkayî "Alexander Haggerty Krappe 1894-1947" behs ji vê çendê dike ku rêjeyeke pir ji ajalan bûne Xwedawend û remzên pîroz, dibêje "hin ji wan çîrokên taybet bi ajalan geşe kirine û bûne Xwedawend, ev çîrokane jî destpêkin ji bo wan çîrokên ku di çaxê xwedawendan de dihatin gotin û her wekî me gotiye, destpêkin ji bo Efsaneyan".⁶

1.2. TÊKILÎYA DI NAVBERA ZAROK Û AJALAN DE

Pir girîngdana zarokan bi ajal û jîneweran vedigere bîranînên rojên xweş yê di zaroktiyê de dema ku dê û xwedîkerên wan, çîrok û hîkayetên taybet yê ajalan ji bo wan digotin. Li gor nerîna zarokan ajal heval e û jînewer di cîhana zarokan de ku ji bizav û jîndariyê tujeye, xwedî ciheke girîng e. Ajal, alavek e zarok di nav leyizên xwe de bikar tîne û zarok bi heza serwerbûnê bi vê dike tiştên biçûk bi dest bixe û ji bo xweşiya xwe bikar bîne, vêca dibînin bi awayeke xurt jîneweran hez dike an jî berovajî, bi şewazeke şiddetê danûstandinê bi ajalên biçûk ên weke cûcîk, teyr, sinkepîsîk û mêşûmor dike.⁷

Piştî zarok tê dinê, çend astan derbas dike û di her astekê de dibe xwedî taybetmendiyeke cuda. Zarok di astên temenê destpêkê de hez dike zêdetir nêzî dinyaya ajalan bibe, bi taybet nêzî wan ajalên li derdora wî dijîn û ev jî dibe sedem ku weke pehlewaneke bikeve rola van ajalan, ji bilî ajalên rasteqîn, dema wêneyeke

⁶ Newzad 'Elî Ehmed, *Mîndal û Edeb*, weş. (?) Silêmanî, 1998, r 65.

⁷ Muhammed el-Seyd Helawe, *el-Edeb el-Qisesî Lilitifil*, weş. Miwesest Huris el-Dewliye, Eskenderiye, Mîsir, 2000, r. 88-89.

ajalan dibîne jî pê dilxweş dibe û pir caran çepikan lê dide û bi taybet ku bizava wan ajalan dibîne, her wekî di televîzyonan de tê dîtin.⁸

Ajalên kedî di jiyana zarokan de xwedî rolek e girîng in, bi taybet di salên destpêka temenî de, se, pisîk û mirîşk ev ajal in ku li kêleka wê/î ye û pir girîngiyê pê dide. Zarok ji hevaltiya ajalên kedî hez dike. Ji ber wê çendê ye ev ajal ji bo zarokan tenê çavkaniya demqetandin û hevalîniyê nîn e. Ev ajal xwedî hin sûdan e ji bo geşekirina zarokan. Li gor lêkolînan hatiye eşkerekirin têkiliya di navbera zarok û wan ajalên ku jê hez dikin de, bi awayeke xwezayî dibe alîkarê geşekirina cestayî, ebstimolojî û civakî û hwd.⁹

Sala 2003'yê, "Fînîsa Lob" jine lêkolînera Emrîkî ya di warê derûnînasiyê de¹⁰, li ser vê çendê tekez kir ku meyla mirov ji bo ajalan pêvajoyek xweziyî ye, belgeya vê jî ev e ku zarokên temenê sê salî, li tevlihev kirin bi ajalên kevî re zêdetir dilxweş dibin ne bi lîstikan, ev e di demekê de ku azadiya wan hebe di hîlbijartinê de.¹¹

Bi heman awayî, lêkolînerên din amajê bi vê çendê dikin ku ajalên kedî li malê di mijara baştirbûna reftara civakî û sincî de yarmetîderê zarokan e. Ev ajal, zarokan hînî dilovanî dikin di hember wan yên ku ji wan bêhêztir in. Ajal, wan hînî pergal, xwebawerî û berpirsiyariyê dikin. Ev jî di dema cîbicîkirina berpirsiyariya xwarindan û dermandana ajalan derdikeve pêş. Her wiha ajal dibe çavkaniyek ji bo naskirina dinyaya derve ji aliyê zarokan ve.¹²

⁸ Newzad 'Elî Ehmed, *b.n.*, r. 65.

⁹ "Keyfe Tiwesir Terbiyet el-Heywanat el-Menziliye Fi Nemu el-Tifil"

[<http://alrai.com/article/581053.html>], Gihîn: 20 Sibat 2017.

¹⁰"el-Însan uel-Heywanat el-Elîfe 'Elaqet Leha Esraruha",

[<https://www.lebarmy.gov.lb/ar/content/الإنسان-والحيوانات-الأليفة-علاقتها-أسرارها>], Gihîn: 25 Çile 2017.

¹¹ Ji bo bêtir agahîyan li ser mijara: psikolojiya ser têkiliya di navbera zarok û heywanan de, bnr.

"Seykuluciyet el-'Laqe Beyine el-Tifil uel-Heywan", [<http://paulaharika.com/goeoeergd>], Gihîn: 20 Sibat 2017.

¹² "el-Etfal uel-Heywanat.. Sedaqe Wistikşaf el-Sifat",

[<http://site.alroeya.ae/2013/08/04/81634>], Gihîn: 20 Sibat 2017.

1.3. TÊKILIYÊN AJAL Û BERHEMÊN WÊJEYÎ

Di derbarê sûda herdu tÊkiliyên daringî û menewî yên ajalan de ji bo peydabûn û peydabûna berhemên wêjeyî berê û niha, dikare bê gotin ku di encama vê tÊkiliya ruhî de hin diyardeyên wêjeyî hatîne afirandin. Weke mînak yên ku bi şewaza çîrokên efsanewî hatine berhem anîn û bi navê "Mîtolojîk" tên nasîn û xurafe ku bi sernavê " Fables" bi wateyê geştî tên nas kirin, her wiha çîrokên ku xwedî armancên sincî ne û belkî parçeyek ji xurafeyên bi navê "Apologue"¹³ bin ku bi şîret û şîret tên nasîn.

Her wekî wan çîrokên dînî yên ku ajal têde bûye derhoze (mu'cîze) û bûyera çîrokê bi awayêke rasteqîn rû daye, di nav de jî çîrokên Qur'ana pîroz weke çîroka çêlek, hêştîr, morî, dîksilêman (hudhud) û hwd. ne. Her wiha tÊkiliya madî ya di navbera mirov û ajalan de çavkaniyek wêjeyî ya herî xurt bûye ku di wesfkirina şikla ajalan û behskirina sûd û taybetmendiyên wan an jî danasîna bedewî û vegotina hin serhatiyên nêçîra ajalan.¹⁴

Weke mînak di dîroka kevn ya wêjeya rojhilat de nevê ajalek weke "guhdirêj" hatiye, di helbesta danayî û sufîzm û felsefî de ker bûye çavkaniya wêneya gelek jor di helbestê de! Di wêjeya kilasîka Kurdî de helbestvaneke mezin weke Nalî (1856-1800) xezelek bedew a yazdeh malikî ji bo ajaleke wekî ker nivîsandiye ku di destpêkê de dibêje:

Hey kerêkim bû, çi peyker teykerî hevraz û lêj

Sîne pan û mûçe kurt û şane berz û giwê dirêj

Naliyê mezin di vê helbestê de ker weke remza xebat û wefayê digel mirovê bêkar mûqayese kiriye. Helbestvan zêdetir ji nîva helbesta xwe ji bo wesfa sîma û roxsarê kerê xwe terxan kiriye. Dikare bê gotin wesfek fotografîk e. Raste ku ev wesfa Nalî rastiyeke li xwe digre, lê ev rastî kiriye nav wêneyeka afirînerîya şîrî ve. Lûtkeya dahênana helbesta vî jî di malika dawî de ye dema ku kerê vî bi xebardan tê û bersiva Nalî dide û dibêje:

Çend pêm xoş bû, zubanî halî deywit (Nalî)ya

¹³ Apologue (xurafeye exlaqî), xurafeyêke kurt an jî çîrokeke remziy e, armanc jê ev e bibe sedem û alava armanceke exlaqî yan jî ji bo pêşkêşkirina wane û dersek bi feyde.

¹⁴ 'Ebdulrezaq Hemîde, *b.n.*, r. 19.

Her dû heywanîn, etû guê kurt û emniş guê dirêj¹⁵

1.4.EFSANE

1.4.1.Kurteya Efsaneyê

Efsane di erebiyê de ji peyva Yewnanî ya "Istoria" hatiye girtin, Istoria jî di pir aliyan de bi peyva dîrokê ve (history) eleqedar e. Di serdema "Herodot" dîroknivîsê Yewnanî de (derdora 484-425 B. Z.), efsane û dîrok girêdayî hevdu bûn e. Ev jî tê wê wateyê ku efsane an jî Istoria di bingeha xwe de buyereke rastî ya dîrokî (History) bûye ku paşê jî ev buyer berbelav bûye, bi şewazek ji vegotina nevî ji bo neviyan berfireh û mezin bûye û gelek tişt jî jê hatîne zêde kirin.

Efsane çîrokek mêtafîzîk, jor sirûşt û xeyalê ye. Di şaristaniyetên kevn de serhildaye û di vê demê de jî baweriyêk tam li naveroka efsaneyan bexşîne û pîroz zanîn e. Efsane pênasekirina destpêkî yê cîhanê, sirûşt û mirov e. Armanca efsaneyê lêkolînkirina diyardeyên sirûşt û kevneşopiyên civakî û têfikirîna li ser jiyânê û mirinê ye (ku li quncê felsefê de li efsaneyê bê mêze kirin, dikarin weke awayeke hişyariya civakî pênase bikin. Her wekî weke hewldaneke destpêkî yê mirov ji bo ku li dinyayê fêhm bike û binase, tê zanîn).¹⁶

Zanista derûnnasiyê li ser vê bawerê ye ku li pişt bementiqî û bê eqlaniyetiya efsaneyê, mantiqek destnîşankirî hatîya veşartin û ev jî mantiqê hewesên hîssî yên kûr ya şexsî ne. "Kar Yong", dahênerê têgeha "Nehişmendiya kolektîf" li ser vê bewerê ye ku efsane te'bîrek aşopîye ji nehişmendiya kolektîf di nav civak û teke kesan de.¹⁷

Peyva "Ostore" û efsane pir li mêje û nêzîk hezar sal beriya zayînê li Vîda û heftsed sal beriya zayînê li Avêsta, pêncsed sal beriya zayînê di nivîsên "Hîrûdûts" û zêdetir li hizar û çarsed sal pêş niha li Qurana pîroz de hatiye bikar anîn. Ev jî vê çendê piştrast dike ku efsane (Ostore) çî mîna têkistek efsanewî û çî mîna peyvê, navê vê têkistê her tim hebûye û pir kevn e.¹⁸

¹⁵ Me'rûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, b. III, ç. 2, weş. Aras, Hewlêr, 2010, r. 145-146.

¹⁶ Newzad Ehmed Eswed, *Ferhengî Zarawekanî Edeb û Zanîste Mirovayetiyeke*, ç. 1, weş. Xezelinûs, 2015, r. 44,46.

¹⁷ *B.n.*, r. 47.

¹⁸ Mewlud Îbrahîm Hesên, *Geran Bediway Nemirîyda*, ç. 1, weş. Aras, 2002, r. 18.

Efsane însayklopêdiyaya kevn û dewlemend û pir ji nihênî ya gişt mirovahiyê ye. hemî hoz û netewe û dînên kevn û nû di avakirin û dewlemendkirina vê de hevbeşin. An jî efsane ev çîrok e ku danerê vê nediyar e û di nav civatên xelk de tê vegotin û kesayetiya efsaneyê bi amêr û keresteyên efsanewî û di dem û cihên efsanewî karên efsanewî têde dikin.¹⁹ Mewlud Îbrahîm Hesên dibêje peyva efsaneyê di berê de di nav Kurdan de hatiye bikar anîn û di nava ferhenga devkî û li bal xwendevanan û di nav ferhenga nivîskî û li bal ronakbîran jî bêhtir ji wateyekê ji xwe re peyda kiriye.²⁰

1.4.2.Efsaneyên Ajalan

Li destpêka peydabûna mirov a li ser gerdûnê û "heskirina bi hebûna xwe, hewla vê çendê daye li dinyayê tê bigehe. Her tim hilsengandin û nirxandina gerdûnê kiriye. Pir diyardeyan di dinyayê de bala wî kişandiye û bûye sedema balkişandina wî û ji bo ku bikare bigihije bersiva wan pirsên ku di mêjiyê wî de peyda bûne, hander bûn".²¹ Di nav van diyardeyan de jî, gerdûn û çawaniya avabûna vê, jiyan, mirin, û her wiha jîndar û rêjeyek zêde ji diyardeyên din. Lê ji ber vê çendê ku nekariye bigihije nirxandin û têgehiştinekê û razî nebûye ku bêyî şirove jê derbas be, di dawiyê de û bi armanca zelalkirin û têgehiştina wan hemî pirsan, mirovê kevn, pena ji bo Efsaneyan (Myth) bir. Perçeyeke mezin a van efsaneyan jî di derbarê ajalan de bûye û heya vê astê ku hin caran pileya ajalan heya pileya afirîneriyê bilind bûye.²²

Her ku mirov di destpêkê de jîngeh û derdora xwe nas kiriye, ji bilî du çavkaniyên girîng yê xwarin û xurekê tu tiştê din nebûye, ev jî ajal û berhema rehekê û dar bûn e. Di civakên destpêkê û cotyarî de dar û dirext jî xwede nirxeke taybet bûn e û di efsaneya miletan de, dar jî weke ajal tişteke pîroz bûye û weke remza jiyan û hikmet û nemiriyê hatiye danan. Dar jî ciheke sereke di nav komelên xelkî de hebûye, heya astekê ku hin gel û hozên berê dar peristin e, her ji ber vê

¹⁹ *B.n.*, r. 33-34.

²⁰ *H.b.n.*, r. 16.

²¹ Hesên Caf, *Çîrokî Niwêy Kurdî*, weş. Dezgay Roşinbîrî û Bilawkirdinewey Kurdî, Bexda, 1985, r. 102.

²² Ebdulrezaq Hemîde, *b.n.*, r. 20-21.

çendê jî di wêjeya folkloriya her neteweyekê de li kêleka efsaneyê, bawerî û hikayeta efsaneyî ya jîndar û rehek qadeke berfireh ji bo xwe girtine.²³

Di vê rewşê de, ji ber ku peydabûna efsaneyê bi giştî berhemê vê çaxê ye ku mirov li hemberî siruşt bê desthilat bûye û nekariye ku di rûdawên siruştî fêhm bike û şirove bike penaya xwe biriye bo hizirîn û xeyala xwe û bi vî awayî jî ew efsanê berhem aniye û bi şêwazeke sade texmîna rûdawên siruştî kiriye. Ji ber vê jî hin zana li ser vê bawerê ne ku çimkî ev efsane berhemên destpêka jiyana mirovan in, yanî serdema zaroktiya jiyana mirovahiyê, li hestên zarokan nêzîk in û zarok ji wan çîrokên efsaneyan hez dikin û wan ji bîr nakin.²⁴

1.5.XURAFE

1.5.1.Kurtiya Xurafeyê

Hemî civakek xwedî xurafeyên taybet e, xurafe li gor pênaseya herî zelal pêk hatiye ji: "Ev bîr û piratîk û nerîten ku li gor tu belgeyekê eqlî nîne û girêdayî tu wate û manayeke zanistî nîne".²⁵

Li wêjeya 'Erebî de ji bo peyva xurafeyê (الخرافة) hatiye bikar anîn, wiha tê bawer kirin ku xurafe navê zilamekî bûye li hoza Cuheynî an Ezre û ev zilam serdemekê ji aliyê meçêtiran ve tê rifandin û paş demekê ku vegeyriya, êdî axaftinokên pirûpûç û bê bingeş û bê wate kirine ku tu eqlê qebûla vê nekiriye, her ji ber vê çendê jî ji vê demê şûnde her kesê ku tiştek an gotineke ne fêmkiriy û bê wate kiribe û cihê beweriyê pê nebe, dihat gotin ku: "gotina xurafe ye", her wiha di zimanê 'Erebî de tê wateya berê daran û bitaybet berê Xurmê. Li gor nerîneke din jî xurafe tê wateya têkçûna/tunebûna aqil di temenê pîrbûnê de". Di Kurdî de peyva efsaneyê li hemberî peyva "أسطورة" 'Erebî û xurafe jî ku xwe bixwe peyvek 'Erebî ye li hember peyva "pirûpûç" a Kurdî tê bikar anîn.²⁶

Hin kes efsane û xurafeyê li devsa hev dizanin û li hevdu cuda nakin, lêbelê ev çend şaş e û herçend her du jî hikayetên xeyalî ne, lê di hikayeya xurafî de xuriskî û zêdegaviyeke bê sînor di xeyalê de tê kirin, bi awayekê ji bawer pê kirinê dûr dibe.

²³ Ji bo bêtir agahîya li ser mijarê pîroziya daran di efsane û bawerên kevin û mîlî de bnr.: Mihemed Silêman 'Ebas, "Pîrozî Darudirext Le Efsane û Bawerî Kon û Mîlîda", *Raman*, J. 180, 2012, r. 61-71.

²⁴ Îzeddîn Mustefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, ç. 3, weş. Aras, Hewlêr, 2010, r. 17.

²⁵ *Raman*, j. 161, r. 114.

²⁶ Celal Enwer Se'îd, "Gêranewe be Zimanî Ajelan Romanî (Gemal)î Xwsrew Caf be Nimûne", *Govarî Zankoy Koye*, J. 39, 2016, r. 114-115.

Efsane ku t keliya mirov li gel jiyan   sir st   afir dan  fade dike, di  aristaniy n mezin de pir caran cih  bawer p kirin  b . L bel  xurafe pir li rastiye d r b ye   cih  baweriy  neb ye.

Xurafey  li ser ziman  mirov an ajalan  fadeya  ret   hikmet  kirine. Weke m nak H kayet n “Kel le   Dimne” an H kayet n “Hezar   Yek  ev” tij  ne ji h kayet n xuraf , nek efsaneyan. L  bel   rokeke weke “Gelgami ” yek ji efsaney n her  kevn y n dinyay  ye ku xwed  rehendeke efsanew  ye   behs ji ger na li d v nemir y  dike, her wiha li rojhilat de gelek efsaney n din j  hene.

Li destp k  de p   ku S mer    Ekediy n li mizapotamiyay  de ni tecih b n,   t de baj r ava kirin   efsaney n cih  baweriy  afirandin, pa   wan afir d n xurafe j  di efsaney n xwe de bikar an  ku la   wan la   mirov e l  ser ser  ajalan an teyr   pir caran ev afir d n xuraf  b  xwed  balan in.²⁷

Xat n Marie de France (1160-1215) weke yek ji niv skar n her  navdar ye xurafeyan t  naskirin d  sedsal n nav n de   weke diyar pa   w  Lafont n   y n din t n. Du away n sereke y n xurafey  hene ku ev j  ev in:

Xurafeya Exlaq : ev j  h kayeteke exlaq  ye li ser esasek e xeyal . Armaneke h nkirin    perwerdey , bi awayeke balk   li ser ziman  ajalan t de hatiye, weke h kayet n Isop   Kel le   Dimne.

Xurafeya Watedar: H kayeteke remz  ye li ser ziman  ajalan, bi awayek  sade   sanah , kesayetiyy n v  li ajal an j  re ey n nediyar an j  h kayet n jor sir st .²⁸

1.5.2.Xurafey n Ajalan

Xurafey n heywanan ev cure  rok in ku t de heywan rola mirovan digirin. Di ziman   ngil z  de ev  rok weke "Fable" t n binav kirin, ku di bingeha xwe de li peyva "Fabula"y  Lat n  hatiye girtin. Ber  ev peyv amajeyek b  bi wan peyv n   hikayey n reng n   cuda y n p     b s d, l  d re weke t gehek  cih  xwe girt   hat wateya hem  wan  rok n ku p hlewan n wan ajal an ti t   b ruh n din   an j  mirov bin.

²⁷ Newzad Ehmed Eswed, *b.n.*, r. 45-46.

²⁸ Muhemmed el-Tunc , *el-Mu'cem el-Mufessel Fi el-Edeb*,  . 2, we . dar el-Kutub el-Lmiye, Beyrut, 1999, r. 395.

Li ser vê esasê jî pêhlewan di Fable'yan de tenê ajal nîn e û dar û tiştên nejiîndar jî dibine pêhlewan. Li gor vê pênaseyê çîrokên ajalan parçeyekî Fable'yê ye. Lê ji ber ku ajal û çîrokên ajalan beşeke mezin ji wan pêk tîne, ji ber vê jî di mêjiyê xwendevanan de cih girîtiye ku fable tê wateya çîrokên ajalan.²⁹

Dr. Johnson di Ensîklopediya Brîtanî de di derbarê Fable de, wisa pênase dîke "Dibe ku xurafe di baştirîn û hestyartirîn rewşên xwe de, çîroka kesayetiya ajalan an nejiîndar be, ji bo armancek sincî, rolê digêrin, dipeyvin û her weke gel xwedî hest û sozin".³⁰ J. A. Cuddon di ferhenga termên edebî de bi vî awayî pênaseya Fable dîke "Vegotinek a kurt e bi şikla pexşan an helbest ku amajê bi dersek exlaqî dîke. Pir caran leyizvanên vî, jiîndarên ji mirov cuda û nejiîndar in, taybetmendiya sereke ya wan çîrokan jî pêşkêşkirina kesayetiya mirovan e bi şewaza ajalan".³¹

Di Ensîklopediya Yehûdî de, Fable wisa tê pênase kirin "Çîrokek remzî ya sincî e ku ajal an hin caran rehek jî tede dileyizin û weke mirovan dipeyvin".³² Ensîklopediya Emrîkî jî bi vî awayî pênase dîke "Vegêrana çîrokek kurt e di derbarê jiyane de şîretekê pêşkêş dîke. Ji bo leyizvanan jî ajal an tişt an hêzên sirûştî yan jî her tişteke din bikar tîne".³³

Cudayîya di navbera xurefe (Fable) û çîroka ajalan (beast tale) de ev e ku di çîroka ajalan de tu mexza û armancek nîn e, herçend ku ajal tede rola mirovan bileyize. Charles Aubertin (1825-1908) di pirtûkê xwe bi sernavê "Xurafeyên Lafontîn" de dibêje ku peyva xurafe yan jî Fable dikare du wate hebe. Wateya giştî ku li "çîrokên xeyalî" nêzîk e, wateyek jî taybet û sînordar. Ev peyv e di wateye xwe de amajê bi kurteçîrokên helbestî yan pexşanî dîke ku di şewaza şanoyê de gelek caran şanoger ajalin. Lê her tim xwezaya mirovî tede diyar û zêdetir e.³⁴

²⁹ Celal Enwer Se'îd, *Govarî Zankoy Koye*, J. 39, 2016, r. 114.

³⁰ Ebdulrezaq Hemîde, *b.n.*, r. 25.

³¹ *Govarî Zankoy Koye*, J. 39, 2016, r. 114.

³² Ebdulrezaq Hemîde, *b.n.*, r. 25.

³³ *Govarî Zankoy Koye*, J. 39, 2016, r. 115.

³⁴ Ebdulrezaq Hemîde, *b.n.*, r. 25-26.

Li gor baweriya lêkolînerê Ereb 'Ebdulrezaq Hemîde xurafeya ajalen bi du taybetmendiyan tèn nasîn û pêwîste herdu tê de hebin û mirov dikare li ser esasê wan 'unsuran xurafeyan nas bike, ev jî.³⁵

- Kesayetiyan vê ji dinyaya ajalan tèn hilbijartin û pêwîste piştewaniyê lê bike û nûnertiya jiyana rasteqîn an xwezayî, daringî ya her cureyekê bike û rê neyê dayîn ku tu jîndareke remzî yan xeyalî têkel bibe.
- Ji aliyê din ev afirîdên rasteqîn ku pêhlewane çîrokên xurafî ne, bi aqil û peyvîna mirovane tèn naskirin, ev ji ajalan in, lê te'bîr li jiyane beşeka gel dikan.

Her lêkolîner 'Ebdulrezaq Hemîde di lêkolîna bi qîmeta xwed de, wiha diyar dike ku çend wateyan cûrbicûr ên xurafeyan hene weke jêrî:³⁶

- Çîroka ajalan e û tu mebest û wateyeka xwe nîn e. (Beast Fable)
- Çîroka ajalî ye û xwedî mexza û wate ye û di vê demê de jî hember e digel (Apologue).
- An jî tê wateya çîroka xeyalî (Fiction) û di vê mijarê de jî ji çîrokên ajalan firehtir e.

Lê weke têgeh û termeke wêjeyî ku hemû dîroknivîsên wêje, rexnegir û ensîklopediyan li ser yekdeng bin ev e:

Xurafe (Fable), çîroka ajalan e ku tê de ajal dipeyive û gotûbêjê dike. Li kêleka parêzgarîya ji ajalbûna xwe, xwedî naverok û wate ye. Wê demê jî tu cudayiya wê û şîretê nabe (Apologue), tevî van cudayiyan ku Ensîklopediyaya Birîtanî behs jê dike.

1.6. ÇÎROKA AJALAN Û TOTEMÎSM

Perestîn û pîroz zanîna ajalan weke Totemism û Lamîsas tê binav kirin. Herçenda ku ev peyvên nû ne di nav zimanên şaristanî de, lê ji aliyê wateyê ve peyvên kûr in û di nav gelek hoz û netewan de cihê xwe hebûye. Sala 1791'ê zayînî,

³⁵ Hemîde, *H.b.n.*, r. 26.

³⁶ *H.b.*, h.r.

ji aliyê hozeke Hindiyên Emerikaya Bakûr yê bi navê "Objway"yê dikeve nav zimanê Înglîzî, peyva "Totem" ji aliyê vê hozê ve ji bo ajalên pîroz hatiye bikar anîn. Ev hoz, vê ajala navborî îbadet dike û endamên hozê jî ev yeke weke totem binav kirine. Dibe ku totem tiştê bêcan, rehek an jî ajal be, lê totemê ajal, navdartir û berbelavtir e û her yek ji endamanên hoza totem li ser vê baweriyê ne ku di navbera wan û totemê wan de têkeliyek weçe û bingehîn heye. Totem wan diparêze û hevkarîya wan dike.³⁷

Totem harîkarek bûye ji bo yêkgirtina vê hoza ku bawerî bi yek Totemê hebûye û girêdêriya bi Totemê jî bûye bingeha rêjeyeke zêde ji erk û berpirsiyariyan, ku girîngtirînê wan ev e ku weke taboo an jî Lamisas tê binavkirin. Ev jî pergalek e li ser esasê çend bingehên dînî hatiye avakirin ku hin tiştan pîroz dide naskirin ku bikaranîn, lênêrîn, lênêzîkbûnê qedexe dide zanîn ku bingeha xwe ji pîrozbûna ajalan an jî pîsbûna wî/ê kesî digire.³⁸

Di derbarê pênaseya Totemismiyê de, di ferhanga zaraveyên wêjeyî û zanistên mirovahîyê³⁹ de hatuye ku: Totemism, bi 'Erebî (الطوطمية) Totem ji aliyê hozên destpêkê yên Emrîkî, Efrîqî û Awistralya Kevn, navê teyr an ajal an jî navê rehekekê ye. Ev li ser vê baweriyê ne ku secereya wan li wan ajal an rehekê hatiye. Ji ber ku di vê baweriyê de ne ku li serdemeke kevn de mirov li nîv mirov û nîv ajal pêk hatiye û li ser gerdûnê jiyan kiriye. Ku her hozek xwedî çend şax û parçeyan be, her yêk ji wan parçeyan jî totemeke taybet bi xwe yê hey, li dewsa afirînerêkê ku wan diparêz e. Di vir de totem pîroz e, bi rêzdarî û pîroziyeke taybet tê berêxwe dan, an ku totem pêk hatiye ji heram an jî taboo.

Ger ev totem ajal an jî teyr be, nabe ku bê kuştin an jî goştê wê bê xwarin, ger revêk jî be nabe bê xwarin, belkî pîroz tê kirin û li malê de tê parastin. Piraniya van ajalan jî ev in: hirç, ga, kîsel, çeqel, simbûre û hin yên din.

Hin kes li ser vê baweriyê ne ku gotina cîrokê bi zimanê ajalan vedigere serdema totemismiyê, ev dema ku netewên kevn li ser vê baweriyê bûn ku dihê wan û ajalên ku îbadet dikin yeke. Ev jî tê vê wateyê ku li ser vê baweriyê bûn kal û pîrên

³⁷ *B.n.*, r. 14.

³⁸ *H.b.*, r. 16.

³⁹ Newzad Ehmed Eswed, *b.n.*, r. 132

wan newiyên wan ajalan bûn e. Ji bo bîranîna wan jî li ser esasê zimanê wan hîkayet saz kirine, êdî bi vî awayê jî wan bîranînan vegotina çîrokan bi ser zimanê ajalan serhêdan e. Mîtolojnas jî ser vê baweriyê ne ku peydabûna çîroka ajalan vedigere serdema wan xwedawendan ku weke ajal dihatin fikir kirin an jî hêman ji bo wan bi wêneya ajalan hatiye çêkirin.⁴⁰

Li bal Yewnaniyên berê Xwedayê mezin "Ziûs" bû ku weke eyloyê hatiye kişandin. Her dîsa li bal wan, xwedayê şarê Esînayê "Bom" û xwedayê jinanîne "Çelek" bû. Xwedayê Cihûyan, Kenaniyan, Hindî û rêjeyek zêde ji gelên din yên berê jî "Ga" bûye, an jî weke Ga hatiye nexşandin. Her wekî ku nivîskar "Heme Kerîm Hewramî"⁴¹ amajê pê dîke û dibêje "ku li ser hurgiliyên ayînên îroyîn jê bê lêkolîn kirin, di hin jî wan ev rastiyên balkêş bêne dîtin, di dîne Êzidiyan de jî ev tişt bi awayeke berçav tê dîtin". Li ser vê esasê jî tişteke siruştî dibe ajal têkeve nav xeyal û bîr û bawera mirov û bibe alavê bingehîn yê wêjeyê.

Lê folklornasê navdarê Kurd "Şukriye Resûl" li ser vê dibêje "bi nerîna me merc nîne ku hîkayeya ajalan bi bîr û bawerê totemismiyê têkel bibe, ji ber vê dema ku mirov li ajalan mêze kiriye, pir tiştên xerîb têde dîtiye weke hîkayeya hokarî ku di nav pîraniya gelan de berbelav bûye".⁴²

⁴⁰ Heme Kerîm Hewramî, *Edebî Mindalani Kurd*, b. 1, ç. 1, weş. korî zaniyarî Kurdistan, Hewlêr, 2005, r. 124.

⁴¹ *H.b.*, r. 125.

⁴² Şukriye Resûl, *Hîkayetî Folklorîy Giyandaran*, ç 1, weş. Înstîûtî Kelepurî Kurd, Silêmanî, 2005, r. 15.

1.7.DÎROKA PEYDABÛNA ÇÎROKÊN AJALAN

1.7.1.Destpêk û Çavkaniya Çîrokên Ajalan

Ji bo vê pirsê ku destpêk û çavkaniya peydabûna çîroka ajalan û çavkaniya ev cureyê çîrokan vedigere kuderê? Bo cara pêşîn ji dîrokê de li bal kîşan gel û netewê serheldaye? Amaje bi vê baweriyê tê kirin ku tenê xwedî yek çavkanî nîne. Wekhevîbûna jiyana mirovan li her cihê û ji berê de heya îro bûye sedem ku ev awayê çîrokan peyda be. Li ser vê esasê jî çavkaniya wan tenê cihê an netewek taybet nîne. Gişt mirovahî li destpêka avabûna xwe de xwedî çîrokên ajala bûye.

Hin kes destpêbûna çîroka ajalan vedigerînin bo Yewnaniyan û amajê bi çîrokên "Hesiod" yê sedesala 8 ya berê zayînê dikin û her wiha "Îsup" yê sedesala 4 ya pêş zayînê de. Hin kesên din li ser vê baweriyê ne ku destpêka çîrokên ajalan, çîrokên "Cataka" ne ku di sedesala 5 ya berê zayînê weke çîrokên ji dayîkbûna Bûda hatîne navbirin û her wiha komçîroka "Pançtrantra" ku di sedesala 5'an heya 2'yan de çêbû û weke bingeha çîrokên "Kelîle û Dimne"yê tî naskirin. Yê din amajê bi çîrokên Misra kevn dikin ku dîroka vê vedigere sedesala 12'ê ya pêş zayînê. Lê hin ji lêkolîneran jî amajê bi herdu çîrokên Hindî û Misrî dike, bêyî ku destnîşan bikin kîjan ji wan pêşî bûye.⁴³

Hin ji lêkolîneran li ser vê baweriyê ne çîroka zarokan çavkaniya xwe ji Îraqa kevn digire. Di nav wan de jî "Dawid Selum"⁴⁴ di vê baweriyê de ye ku di nav mirovên şaristanî de çîrokên ajalan ji bo cara yekê li Babilê û li "Welatê di navbera du çeman de - Mezopotamya", yanî Îraqa kevn peyda bûne. Ev awayê çîrokê di serdema Sûmeran de hatiye destpêkirin û her li Îraqê de jî derbazî Hind û Yewnanê bûye. Paşê jî di heyama sedesalên navîn de bandora xwe li şaristaniyeta Ewropî kiriye û derbazî vê derê bûye. Wan jî ev berhem wergirtine û danane ber destê zanayên zimanê xwe yê di vê hunerê de û bi vî rengî jî perçeyek ji wan çîrokan bi navê Isopê zanayê navdar yê Yewnanî hatiye naskirin.

⁴³ Celal Enwer Se'îd, *Govarî Zankoy Koye*, J. 39, 2016, r. 117.

⁴⁴ Dawid Selum, *Kitab Qises el-Heywan Fi el-Edeb el-'Erebi el-Qedîm*, weş. Dar el-Reşîd lilneşîr, el-Raq, Bexdad, 1979, r. 9,35.

Her di vê derbarê de jî, Îzzeddîn Mistefa Resûl li ser vê baweriyê ye ku kevntirîn mînaka efsaneyê di nav Sûmeriyên de peyda bûye, lê ji ber ku lêkolîn li ser dîrok û samana wan dereng destpêkiriye, ji ber vê jî piraniya çandnasan heya îro jî li Yewnaniyan dest pê dikin. Her wiha dibêje ku her çeqas vî bixwe jî di destpêkê de ev rê girtibû der xwe lê li ser vê baweriyê ye ra rast ev e li efsaneyên Sûmerî bê dest pê kirin, ji ber ku beriya hemî berhemên hizrî yê mirovahiyê peyda bûne. Ji bo vê nerînê jî piştî xwe dide çavkaniyek e girîng weke (Teha Baqir, Milhemet Gilgamiş).⁴⁵

Nivîskar Heme Kerîm Hewramî, di derbarê destpêk û çavkaniyên peydabûna çîroka ajalan, amajê bi çar nêrînên girîng yê cuda dixe:⁴⁶

Nerîna Yekem: Li ser vê baweriyê ye ku cara pêşîn di nav gelên yewnanê de serhildaye. Çîrokên "Hesiodos" yê di B.Z. sedsala 8'ê de û her wiha çîrokên Îsop yê di B.Z. sedsala 6'ê de jî weke mînak digire.

Nerîna Duyem: Li ser vê baweriyê ye ku çavkaniya sereke ya çîrokên ajalan, welatê Hindê ye. Ji ber ku cara yekem Hindiyên çîroka ajalan îcad kiriye. Wan "Bûda" weke ajal û jîndar kişandine, nesîhet û şîretên wî jî di nav wan hikayetan de ye ku çend sedsal berî zayînê jî Bûda di nav wan de jîyan kiriye. Beydeba hişmendek Hindî ye ku Kelîle û Dimne nivîsiye. Çîrokên Bûda riya ev şewaza çîrokan ji bo wî kesî xweş kiribû.

Nerîna Sêyem: Li ser vê baweriyê ye çavkaniya ev şewaza çîrokan welatê Misrê ye, 12 sedsal berî zayînê ne. Misriyên berê ev çîrok dizanîn û jê hez dikirin. Ji ber vê jî di nav asewarên Fir'ewin de jî parçe çîrokek li ser cure kaxezekê hatiye dîtin û şarezayên vê zanistê texmîn dikin ev çîrok 4 hezar sal berî zayînê bi awayeke rojane ji bo zarokan hatine gotin.

Her çend ev çîroke vê rastiyê nîşane dide ku Misriyên berê jî çîrokên ajalan dizanîn her wiha anîne ser kaxezê jî lê destpêka peydabûna hemû çîrokên ajalan diyar nake.

⁴⁵ Ji bo vê, bnr.: Îzzeddîn Mustefa Resul, *b.n.*, kenara r. 17.

⁴⁶ Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 126-128.

Nêrîna Çaremîn: Li ser vê baweriyê ye ev awayê çîrokan ji yek çavkaniyê nayê girtin û avabûna jiyana mirovî bûye sedem ku her ji berê heya îro mirov li her derê be jî, van awayê çîrokan biafirîne. Li ser vê esasê jî çavkaniya van tenê yek gel an jî yek cihê taybet nîn e û hemû gel ji destpêka peydabûna xwe xwedî wan çîrokan e û çavkaniya belavbûna wan jî ev çîrokên netewî ne ku ji eliyê hemû netewên dinyayê tên dîtin.

1.7.2. Di Wêjeya Cîhanê de Çîrokên Ajalan

Dikare bê gotin ku çîrok yek ji cureyên te'bîra hunerî yên herfî kevn e ku mirovan her di destpêkê de bikar aniye. Mirovê kevn van diyardeyên ku di siruştê de didîtin, ji bo şîrove û ravekirinê bikar di anî û wateyên cuda cuda ji bo didanî û hertim wêneya xwe û ajalan çêkiriye û weke çîrok jê behs kiriye, her di wan çîrokan de efsane peyda bûye, piştî ku ji bu hevdu vegotine. Ev efsane û xurafeyên ku li ser zimanê gel dihatin gotin di her dema jiyana mirovan de te'bîr dikir ji têbîniyên wan yên di derbarê jiyane û derxistinek bû ji bo hest û xeyalên wan.

Wêjeye zarokan di destpêka peydabûna xwe de li ser efsane û xurafeyan dihat avakirin û her bi vî awayî jî hîn bûn ku çawa rêzikên sincî cihgir bikin û şîretan pêşkêş bikin. Li ser vê esasê jî dikarin bêjin ku ev çîrok û efsane bûne bingehe wêjeya zarokan.

Yek ji berhemên wêjeyî yên netewî ku xwedî bendoreke mezin e li ser wêjeya cîhanê û jiyana gel û hin nivîskaran xebat kirine li ser vê esasê çîrokan biafirînin, hikayetên jîneweran yên bi navê "Panchatantra" ye ku weke gencîneya pêncbendiyan jî tê nas kirin. Ev berhem li Hindistanê û bi destê Berahîmiyeke navdar û bi zimanê Sanskrît hatiye nivîsîn. Paşê jî bi zimanên din hatiye wergerandin. Weke mînak ji bo cara yekem bi zimanê Pehlewî hate wergerandin.⁴⁷

Hikayetên "Kelîle û Dimne" li piraniya welatên dinyayê, çavkaniyeke din a çîrokên zarokan bû. Ev berhem tijî çîrokên mebestdar û gotinên xweş û zaniyarî û amojgariyên cur bi cur e ku mirov dikare di piraniya astên jiyane de jê sûd bigire. Nivîskarê vê berhemê bi navê "Beydeba" van çîrokan bi zimanê ajal û teyran

⁴⁷ Hadî Nu'man el-Hîtî, *Seqafet el-Etfal*, weş. el-Meclis el-Wetenî Lilseqafe uel-Finun uel-Adab- el-Kiweyt, 1988, r. 151.

vedibêje. Bi kelkwegirtin ji vê berhema binirx bû Ewropî karîn, rêkarêk gûncav ji bo belavkirina şîret û reftarên ciwan hîn bibin.⁴⁸

Her wiha çîrokên efsanewî yên Îzop kevntirîn berhêma wêjeyî ya Ewropayê ye û yek ji berhemên destpêkê ya ku zarokan sûdeke zêde jê girtine. Li kêleka vê yekê ku di salên 1480-1475'an de ji bo mezinan hatiye weşandin jî, lê ev efsane alîkareke baş bûn ji bo nivîsandina berhemên destpêkê yên taybet bi zarokan, ku hin ji wan weke çîrok hatin nivîsandin û hin ji wan jî di nav pirtûkên xwandina xwendevanan de cih girtin.⁴⁹

Ji ber girîngiya berhemên Îzop gelek kes li ser vê baweriyê ne tu ronakbîrek di cîhanê de nemaye di heyama zaroktiya xwe de neketibe bin bandora berhemên vî.

Çîrokên "Hizar û Yek Şêv" jî her çend di bingeha xwe de taybet bi rojhilata navîn e, lê bandoreke mezin li ser wêjeya cîhanê kiriye. Ev bandor jî vê demê dest pê kir ku bi zimanên ewropî hate wergerandin û bû sedemê belavbûna çîrokên efsanewî. Di sedsala 18'ê de çîrokên Hezar û Yek Şev bi zimanê fransî hatine wergerandin û belav kirin. Paş vê çendê jî her li Ferensayê helbestvanê navdar "Lafontîn" ku weke navdartirîn nivîskarê berhemên zarokan li fransayê dihat naskirin, weke mîrê Hikayetên efsanewî tê navbirin û efsaneyên vî dikevin nav wêjeya zarokan.

Her dîsa li Ewropayê û li Birîtaniyayê ku paş Fransayê di wêjeya zarokan de navdar e, pêvajoya wergerê destpêkir û rêjeyek zêde ji berhemên Fransî hatine wergerandin. Robirt Samber hikayeta "Dayke Qaxzeke" ya "Tşarlz Bîro" nivîskarê Fransî wergerande zimanê Îngilîzî. Her wiha nivîskarê navdar yê Birîtanî "Daniyal Dîfo" ku xwedî berhemê "Robênson Krozo"yê bû bi hikayetên "Hezar û Yek Şev" û "Hey Kurê Yeqzan"ê Îbn Tufeyl, pir şaşmayî û êcêbgirtî bûye. Piraniya lehengên berhemên nivîskar "Klîf Stabil Loîs" jî ajalin.

1.7.3.Di Wêjeya 'Ereban De Çîrokên Ajalan

Di derbarê edebiyata "Ereban de jî fituhatên Îslamê bûne sedem ku rêjeyek e zêde ji çîrokên netewên din weke Fars, Rom, Yewnanî, Hindî û Îspanî bikevin nav wêjeya "Ereban. Piraniya wan jî efsane û çîrokên xurafe û çîrokên ajalan bûn. Îcar pêvajoya wergerê destpêkir û pirtûkên weke Kelîle û Dimne û yên din bo ser zimanê

⁴⁸ Hadî Nu'man el-Hitî, *b.n.*, r. 151.

⁴⁹ *H.b.n.*, r. 152.

'Erebî hatine wergerandin û li kêleka çend berhemên din yê weke çîroka Hey Kurê Yeşzan û çîroka Seyfê Kurê Yezin.⁵⁰

Di rastiye de, kesê ku çîroka bi zimanê ajalan di welatên 'Erebî de belav kir û da naskirin, wêjevan Îbn el-Mûqefe' bû ku sala 750'ê hîcrî Kelîle û Dimne weke komçîroka ajalan wergerand ser zimanê 'Erebî. Ev pirtûk parçeyek e ji fikra edebî ya hindî ku li vê derê derbazî herêma ariyayî bûye û paşê jî ji aliyê Îbn el-Mûqefe' bi zimanê 'Erebî hatiye wergerandin û di nav netewên din de jî belav bûye.⁵¹

Di sedsala 17'an de jî afirandina berhemên nû ji aliyê erwopiyan û bi taybet fransiyan ve bûye sedemê afirandina berhemên nû ji aliyê 'Ereban ve ku weke wergêr pênaseya zimanê ajalan dike. Bi vî awayî jî wergerandina hin çîrok û Hîkayetên biyanî ji aliyê "Refae Tehtawî" ve bandoreke mezin li ser geşekirin û belavbûna wêjeya zarokan hebû, li welatên 'Erebî bi giştî û bi taybet li Misrê.⁵²

Refa'e Tehtawî paş vegeza xwe ji Fransayê bo Misrê, di vê mijarê de bû xwedî roleke girîng û rêjeyeke zêde ji çîrok û hîkayetên biyanî wergerandiye ser zimanê 'Erebî. Paşê jî helbestvanê navdar "Ehmed Şewqî" dema ku li fransayê bû û her bi vî awayî wêjeya zarokan nas kir û hin çîrok bi zimanê ajal û teyran nivîsand. Weke mînak jî "Ravçî û Çûleke", Bilbil, Rêwî û Dîkil. Ehmed Şewqî di destpêka "Şewqiyat"ê de amajê bi vê çendê dike ku di bin bandora çîrokên ajalan de yê "Lafontîn" û bi awayekê ji bo Misriyan gûncav be û kelk jê bigirin, ev pirtûk nivîsiye.⁵³

Her di Misrê de nivîskar "Mohammed Osman Celal" komek ji çîrokên Lafontîn wergerandine û di gel hin çîrokên din yê 'Erebî di pirtûka "العيون اليواقظ في الأمثال والمواعظ" de kom kiriye. Ev nivîskarê navbirî bi pirtûka xwe ya ku bi zimanê jîndar û bêgînan hatiye nivîsandin, di afirandina cureya çîroka zarokan de roleke girîng dît.⁵⁴

Yek din ji nivîskarên bihêz û navdar yê çîroka zarokan "Kamil Geylanî" ye ku bandoreke xurt li ser wêjeya zarokên 'Ereb hebûye. Ev jî bi nivîsandin û wergerandina çend çîrok û pirtûkên weke: Efsaneyên Ajalan, Efsaneya Afrîqiyan,

⁵⁰ Razaw Reşîd Sebrî, *Çîrokî Mindalan Le Edebî Kurdîda (1991-2005)*, weş. Bilawkirawekani Ekadîmyay Kurdî, Hewlêr, 2010, r. 27.

⁵¹ Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 128.

⁵² Razaw Reşîd Sebrî, *b.n.*, r. 28.

⁵³ *B.n.*, r. 29.

⁵⁴ *H.b.n.*, r. 29.

çîrokên Hezar û Yek Şev ku hin ji wan weke çîroka 'Elîbaba û çîroka 'Elaêddîn ji zimanê Îngilîzî hatine wergerandin.⁵⁵

Rest e di nav çîrokên Hezar û Yek Şev û Kelîle û Dimne de hin çîrokên di asta hest û soza zarokan de tèn dîtîn lê Heme Kerîm Hewramî dibêje: "Nabe ev mînak e weke destpêka peydabûna wêjeya zarokan bê pênase kirin. Ji ber ku afirînerên van bi vê armancê ev pirtûk neafirandine ku taybet be bi zarokan. Ger peydabûna wêjeya zarokan di vê çarçûveyê de bê nirxandin, bi sedan mînakên din di nav çîrokên netewî yên gelan de dê bèn dîtîn".⁵⁶

1.8.DÎ QURANA PÎROZ DE ÇÎROKÊN AJALAN

Qurana pîroz weke pirtûka pîroz ya misilmanan, bi zimanê "Erebî û bi awayekî perçe perçe ji aliyê Barîte'ala ve ji bo pêxemberê dawî Muhammed (s.x.l.) hatiye rêkirin. Ji bilî vê çêndê ku behs ji îman û baweriya misilmanan dike û jiyana sincî û civakî bi rêxistin dike, her wiha ji hêla dahênana wêjeyî ve çavkaniyeke pir girîng e û bandoreke xurt li ser ronakbîrî, çand û wêjeya 'Erebî û hemî netewên din kiriye. Ji bilî vê, Quran ji aliyê afirîneriya wêjeyî û hunerî ve di asta herî bilind daye. Quran yek ji wan pirtûkên girîng e ku weke şahkar û çavkaniya edebî tê dîtîn û tenê taybet bi 'Erebî û netewên misilman nîn e, belkî di samana hemû mirovahiyê de têkel bûye.⁵⁷

Di Qurana pîroz de hin serpêhatî, çîrokên watedar û şîret tèn dîtîn ku ji aliyê hunerî û wêjeyî ve di asta herî bilind dane. Di nav wan de jî tiştên ku girêdayî mijara me ye, çîrokên ajalan e.

Qurana pîroz nîrxê ajal û teyran bilind dike û wan afirandiyên ji hêla mafan ve wan weke mirovan û netewên ser erdê dibîne. Xwedayê te'ala di vê ayetê de qala vê dike û dibêje: "وَلَمَنْ دَابَّةً فِي الْأَرْضِ وَلَا طَائِرٍ يَطِيرُ بِجَنَاحَيْهِ إِلَّا أُمَمٌ أَمْثَلَكُمْ مَا فَرَّطْنَا فِي الْكِتَابِ" "Çi heywanekî ku li erdê bimeşe û çî teyrekî ku bi her du perên xwe (li hewayê) bifre, her ew jî weke we umet in (rewşa wan, rizq û ecelê wan jî hatine nivîsandin). Me tiştê di kitêbê (Lewhul Mehfûzê) de kêr nehêştîye. Paşê ew ê bi bal perwerdigarê xwe ve li hev bêne civandin".

⁵⁵ H.b., r. 30.

⁵⁶ Heme Kerîm Hewramî, b.n., r. 46.

⁵⁷ Me'rûf Xeznedar, b.n., b. I, r. 173-174,176.

⁵⁸ Sûreyê En'am, ayeta 38.

Qurana pîroz di çîroka pêxember û mirovên qencîkar de behsa hin ajalan dike ku di dîroka mirovahiyê de rola wan hebûye. Weke ev qijika reş ku Xwedê te'ala ji bo Qabilê kurê Adem şand da ku hîn bike çawa termê birayê xwe oxir bike. Her wiha ev teyrê Îbrahîm pêxember (s.x.l.) ser jê kir û her perçeyê bir li ser çiyayekê dana, vê carê xwedayê mezin dubare ew sax kir.

Çêleka Benî Îsraîl ku Musa pêxember (s.x.l.) ji bo eşkerebûna tawana kuştineke nediyar, fermana serbirînê bo der kir. Yan ev gurê ku bi neheqî sûcdarê kûştina Yusif pêxember (s.x.l.) kir, hudhuda Silêman pêxember (s.x.l.) ku hevala şajin Belqîsê pê ragihand. An ev dabbeya ku gopalê Silêman pêxember (s.x.l.) xwar, dema li ser kursiyê wefat kir û ji ber vê jî kete ser erdê. Ev mûrîya bang ji mûrîyên din kir vegerin malên xwe ji bo vê çendê nekevîne bin piyê leşkerên Silêman pêxember (s.x.l.).⁵⁹

Kerê 'Uzeyr pêxebmer (s.x.l.) ku Xwedê te'ala ji bo sedsalan ji ber çavên wî mirand û paşê zindî kir. Ev nihinga Yûnis pêxember (s.x.l.) qurt kir û paşê avête der, seyê hevalên şikevtê ku ji bo 309 salan bi wan re raza û filê Ebrehe padşayê Yemenê ku bi lêşkerên xwe re ji bo têkdana Ke'îbeya pîroz îrabû.

Di Qurana pîroz de hin ajal hene di rastiya xwe de ayetên Xwedê te'alane û di jiyane de xwedî bandor in. Ev ajal li ser şanoya rûdawan tên dîtin û paşê winda dibin. Qurana pîroz tenê behsa wan dike, biryarek an jî çend biryarên wan vedibêje.⁶⁰

Di Qurana pîroz de rêjeyeke zêde ji ayetan behsa ajalan dîkin, hin ji wan ayetan behs ji sûtên ajalan û yên din jî behs ji şîretgirtina ji wan ajalan dîkin. Hin ji wan jî weke mînakgirtinê tên bikaranîn. Hin ji wan ayetan behs ji wan hikm û fermanan dîkin ku taybet bi ajalan e. Hin ji wan taybet in bi bîr û bawerî û kevneşopiyên kevn yên girêdayî ajalan, dîne Îslamê bawerî pê neaniye û weke pirûpoç binav kiriye. Hin ji wan ayetan jî ji bo pêşandana Mu'cizeyên pêxemberan (s.x.l.) hatine. Hin girîngtirînê wan jî weke mînak.⁶¹

⁵⁹ Ehmed Behcet, *Qises el-Heywan fi el-Quran*, ç. 4, weş. dar el-Şîruq, el-Qahîre, 2000, r. 7.

⁶⁰ *H.b.*, r. 7-8.

⁶¹ Ebdulrezaq Hemîde, *b.n.*, r. 68-81.

Mûrî û Dîksilêman (Hudhud):

Di sûreta Neml de çîrokek herî giring di derbarê du ajalan bi hev re hatiye behs kirin, ev jî di çîroka Suleyman pêxember (s.x.l.) daye. Yek ji wan mûrî û ya din jî teyreke weke dîksilêman e. Di derbarê behsa zimanê teyr û mûrî û dîksilêman de, nêzikî rûpelekê di Quranê de hatiye zimên.⁶² Di ayetên 16 - 29'ê yên sûreta "el-Neml" bi awayekî rêkûpêk û behsa armanc û sedema vê dike.

Weke Xwedê te'ala di ayeta 18 de dibêje: " حَتَّىٰ إِذَا أَتَوْا عَلَىٰ وَادِ النَّمْلِ قَالَتْ نَمْلَةٌ يَا أَيُّهَا النَّمْلُ ادْخُلُوا مَسَاكِنِكُمْ لَّا يَدْخُبَنَّكُمْ سُلَيْمَانُ وَجُنُودُهُ وَهُمْ لَا يَشْعُرُونَ "Heta ku hatin newala mîroyan, mîroyekê got: gelfî mîroyan! Bikevin kûnên xwe, bila suleyman û leşkirên wî bêhayî we nepelçiqînin!".

Her weke di ayeta 20an de Xwedê te'ala bi ser zimanê Suleyman pêxember (s.x.l.) dibêje: " وَتَقَفَّ الطَّيْرُ فَقَالَ مَا لِيَ لَا أَرَى الْهُدُودَ أَمْ كَانَ مِنَ الْغَائِبِينَ "Suleyman piştî çavê xwe li teyran gernad got: Çima ez Hudhud (li vir) nabînim? Ma ew ne hazir e?!"

Qijika Du Kurên Adem:

Ev jî çîrokeke din ya taybet bi ajalan e Qurana pîroz di derbarê her du kurên Adem pêxember (s.x.l.) de behs jê dike ku herduyan qurbanî pêşkêş kir lê qurbaniya Habîl qebûl bû û ya Qabîl qebûl nebû. Ji ber ku hesûdî bi birayê xwe anî, birayê xwe kûşt, lê nezanî dê çi ji laşê wî bike ji ber ku ev mirovê yekem bû ku mir. Ji ber vê jî xwedayê mezin du qijik rêkirin şer di navbera wan de çê bû, yekê yê din kuşt. Qijikê kujer bi nikil û pencikên xwe çalek çêkir û qijika kuştî xist nav vê çalê.⁶⁵

Di sûreta Maîdeyê de Xwedayê te'ala dibêje: " فَبَعَثَ اللَّهُ غُرَابًا يَبْحَثُ فِي الْأَرْضِ لِيُرِيَهُ كَيْفَ يُورِي سَوْأَةَ أَخِيهِ قَالَ يَا وَيْلَتَا أَعَجَزْتُ أَنْ أَكُونَ مِثْلَ هَذَا الْغُرَابِ فَأُوَارِي سَوْأَةَ أَخِي فَأَصْبَحَ مِنَ النَّادِمِينَ "Xwedê qijikek şand ku wê bi nikil û lingên xwe ax dikola (û di avêt ser qijikeke mirî) da ku nîşanî wî bide ku ew dê termê (cesedê) birayê xwe çawa veşêre. (Birayê kujer) got: wey li min be! Min nekarî ez bibim wekî vê qijika hanê vêca ku ez cendekê birayê xwe veşêrim, êdî ew bû ji poşmanbûyîyan!".

Ji naveroka çîrokê wisa tê fêhm kirin ku ev ajal weke hînker û rênîşanderek bûye ji bo ev tawanbarê ku kurê Adem bû. Her bi wî awayî jî "Îbn Tufeyl" di çîroka

⁶² Ji bo bêtir agahîya li ser vê mijarê bnr. Fezil Hesên 'Ebas, *Qieses el-Quran el-Kerîm*, ç. 3, weş. Dar el-Nefays, 'Emman, el-Urdin, 2010, r. 658-663.

⁶³ Sûreyê Neml, ayeta 18.

⁶⁴ Sûreyê Neml, ayeta 20.

⁶⁵ Bnr. Fezil Hesên 'Ebas, *b.n.*, r. 716-721.

⁶⁶ Sûreyê Maîde, ayeta 31.

"Hey bin Yeqzan" de sûd ji vê destanê girtiye dema "Hey" ji qelereşikê hîn dibe Askê oxir bike.

Çîroka Fîl û Teyrê Ebabîl:

Ajaleke weke fil di dîroka Îslam û 'Ereban de xwedî rudawek e ku weke navnîşana dîroka sala rûdana mezin tê naskirin. Pêxemberê Îslamê (s.x.l.) di salê 571ê zayînî ji dayk bûye yanî sala ku weke sala fil tê naskirin. Her di derbarê vê bûyerê û eshabên fil de jî sûreteke temam ji bo pêxember hatiye ku weke sûreta fil tê nas kirin. Sûret tenê pênc ayet e û di destpêkê de peyva fil derbas bûye ku ew jî heywanekî naskirye, Xwedê te'ala dibêje: "أَلَمْ تَرَ كَيْفَ فَعَلَ رَبُّكَ بِأَصْحَابِ الْفِيلِ".⁶⁷ "Ka ji min re bêje: xwedayê te çi bi serê xwediyê Fîlê (Ebreheyê Hebeşî û leşkerê wî) anî?".

Li ser vê esasê jî çîroka fil xwedî bingeheke dîrokî ye û armanca Qurana pîroz ev nîn e ku bi awayekî berfireh behs jê bike. Belkî armanc ew e ku weke şîreteke amajê pê bike û muşrik bi xwe jî nêzîkî vê serdemê bûn û rêjeyek ji wan ev bûyer dîtîbû û hê jî dijiyan. Di rastiye de çîrokeke balkêş e û fil û teyra Ebabîl tê de xwedî hêzeke pahlewanî ya eşkere ne.

Her wiha çîrokên weke Çêleka Benî Îsrâîl û Hêştira Salih Pêxember (s.x.l.) û gelek ajal û teyrên ku Xwedayê te'ala di Qurana pîroz de bi kurtî û bi awayekî kurt behs li wan dike, armanc ev nîn e dema pê derbaz bike an sûretê pê dirêj bike, belkî armanc di vegotina behsa wan de şîret e ji bo pêxemberê Îslamê (s.x.l.).

1.9.ÇEND BERHEMÊN HERÎ NAVDAR

1.9.1.Çîrokên Îsop an Îzop

Mirov dikare bêje ev çîrok berhemên hizra hemû mirovahiyê ne û li cem hemî netewe û miletan xuya ne. Ji hemû aliyan ve beşdarî dahênan û girîngîdana bi wan hîkayetan kiriye. Ji ber ku diyare ev hîkayetane berhemên hizr û bîrkirina mirovên kevn û destpêkê ne û ji ber vê çendê ku mirovên kevn pir nêzîkî ajalê keví û kovî bûne, hîkayet bi zimanê wan ajalan afirandiye û kul û kovan û kesera xwe pê aniyê ziman û pir caran rexne girtiye û ku ger rasterast rexne bigirtan e, dibe asteng biketin e ber wan.

⁶⁷ Sûreyê Fîl, ayeta 1.

Zanayê navdar yê Kurd 'Ezîz Gerdî dibêje "Li gorî nerîna min ev hîkayeyane û yên din jî derencama hizra hemû netewên din e û di folklor û di kelepûra hemî netewên din de bi sedan hîkayetên wisa xuya dikin. Ev tişt bû sedem ku Yewnanî di xwendinê de pêş bikevin û di zanist û huner û yasa û hemû qadan de bibin xwediyê asta herî berz û bikarin pêşengiyê bikin û wan hîkayetan darêjin ser lînûsê û li ser navê xwe tamam bikin."⁶⁸

Di dawiya sedsala 5'an ya beriya zayînê de navê Îsop li Yewnanê kete rojevê. Rastiya jiyana wî aloz û nediyar e û hemî zelal nebûye. Îsop fabîlnûsekî kevn yê Yewnanê ye li derdora salên 620-560 beriya zayînê jiya ye. Jiyanê Îsop zêdetir weke çîrokeke xeyalî ya heya weke jiyaneke rastî bê dîtin.

Hin kesên behsa Îsop kirine, li ser vê bawerê ne kesekî bi vî navî nebûye ku çîrokên ajalan gotibe û Îsop remzek bûye ji bo afirandina vî awayê çîrokan ku dibe pir kes di afirandina wan de beşdar bûne. Ji ber ku yek ji kevneşopiyên Yewnaniyan ev bû ku her awayê wêjeyê li ser navê nivîskarekî/ê mezin didan nasandin. Lê hin dîroknas li ser vê baweriyê ne ku Îsop di rastî de nivîskark bûye û bi armanca nesîhet û şîret û şêwirê ev hîkayet afirandine û berbelav kirine.⁶⁹

Dîroknivîsê Yewnanî "Hîrodots" di dîrokê xwe de behs ji hebûna Îsop dike û teqez dike ku afirînerê çîrokên ajalan e û di naverasta sedsala 6'ê berî zayînê jiyaye. Ev kes li gorî Hîrodots xelkê girava Samos e û bi xwe kole bûye, dawiyê jî bi destê xelkê Delfî'yê hat kuştin.

Dibe ku Îsop paş azadbûna vî ji aliyê xwediyê vê sefera Misr û Babilê kiribe û paşê çûbe Asiyaya Biçûk û demekê di derbarê Kirzosê şayê Lîdî jiyabe û her ji aliyê vî kesî ve ber bi Yewnanê hatibe rêkirin. Di wan alûgorane de Esîna di bin desthilata û femandariya "Pîsîstra Tosda" de bû. Îsop bi vê helkeftê hîkayeta "Bûqan Paşayê Devê" dinvîse da ku Yewnaniyan îqna' bike ji bo guhertina femandarê wan.⁷⁰

Paş ku Îsop ji aliyê Kirozos ji bo şarê Dîlfîs ku perestgeha Epolon tê de bû hate vegerandin, di vî şarî de bi tawbarkirina bêrêziya bi payebilindên pîroz, bi

⁶⁸ Îzop, *Çîrokekanî Îzop Yan Lenaw Giyandaran Da*, (Wer.: 'Ezîz Gerdî), weş. Çapxaney el-Hewadis, Bexda, 1982, r. 4.

⁶⁹ *H.b.*, r. 5.

⁷⁰ "Aesop", [http://www.hewalnews.com/Topic_4147_14], Gihîn: 11 Çile 2017.

awayekî trajîk ji aliyê gel ve hat kuştin. Nivîskarên din jî behs ji Îsop dikin û di derbarê kuştina wî de ji aliyê gelê Dîlfiyê ve hevdeng in.

Paş sed sala 5'an ya berê zayîne hikayeyên Îsop cihê xwe di nav gel de peyda kirin û bi awayekî giştî berbelav bûn. Rêjeyeke zêde ji nivîskarên mezin behs ji çîrok û hikayeyên Îsop dikin. Weke minak "Erestûvan", "Zînefon", "Flatûn", "Erestû" û hwd. Lê diyar nîn e ku Îsop an jî nivîskareke serdema wî deqê çîrokan nivîsandiye an paş wî hatine komkirin û nivîsandin û belavkirin? Lê ev qase hertim mayinde ye ev hikayet li ser navê Îsop hatine qeydkirin û belavkirin.⁷¹

Hin ji hikayetên ajalan di nav helbestên sedsalên 7 û 8an yê Yewnanê de hen e, lê di helbestên Homerê babkalê dastanê yewnanî û cîhanî, tu hikayeteke ajalan nayê dîtin.

Her di destpêkê de di navbera wêjeya Hindî û Yewnanî de tîkelî hebû û di dema xwe de komhelbesteka Hindî ya ajalan hatiye wergerandin ji bo Yewnanîyê û hin kes li ser vê baweriyê ne ev hikayet weke mînakên çîrokan ji aliyê Îsop û çîroknivîsên din yê Yewnanî ve hatibe bikar anîn. Lê ev hikayeyên Hindî ji sed sala 4'an a pêş zayîne kevntir nîn e, ji ber vê jî ev nerîn bê bingehe tê dîtin. Lê dîsa jî hikayeta Hindî û Yewnanî pir nêzîkî hevdu ne û her di serdemên berê de bandor li hevdu kirine û mifa ji hevdu girtine.

Tê texmîn kirin ji bilî hikayeta Hindî, çîrokê Misrî û Asorî jî derbazî nava Yewnanî bibin û rê ji bo vî awayê wêjeyê xweş kiribin. Yewnanî binêşedanerên vî awayê wêjeyê ne û hikayeta ajalan bi destê wan hatiye tomarkirin û ev (janr) şewaza wêjeyê jî weke piraniya berhemên hizrî yê mirovan, her di vê derê de gihiştîye asta herî bilind û li dinyayê belav bûye.⁷²

Ev hikayetên li ser navê Îsop hatine qeyd kirin û di serdema wî de hatîne gotin, gelek hikayet û efsane tê da ne ku çavkaniya xwe ji sedsalên berê digrin. Ev hikayetan cara pêşîn ji aliyê Dîmîtros Falromî ve û di sed sala 4an ya berî zayîne bi şewaza pexşanan hatine komkirin. Paşê beşek din ji heman çîrokan ji aliyê Barbiyos ve bi şewaza helbestan hatiye amadekirin û bûne çavkaniya helbestwanên Yewnanî û latînî yê sedsalên bê. Lê ev çîrokên li ser navê Îsop belav bûne nêzîkî sêsed û

⁷¹ Îzop, *Çîrokekanî Îzop Yan Lenaw Giyandaran Da*, (Wer.: 'Ezîz Gerdî), r. 5-6.

⁷² Îzop, *Çîrokekanî Îzop Yan Lenaw Giyandaran Da*, b.n., r. 7.

pênceh çîrok û efsane ne ku rêjeyeke pir kêr ji wan yêr Îsop in û yêr din yan yêr wî nînin an jî di dirêjahiya dîrokê de gûhirtin bi ser de hatiye.⁷³

Pehlewanê pîraniya çîrokên Îsop jîndar in. Hin caran ajal û jîndarên nasiyar in. Wekî mînak Helo, Terlan, Dal, Kûtîr, Gakovî û Rovî û hin car jî ajalên nenas tê de hene weke Kurukudîl û tiştên wisa. Di hin çîrokan de jî pehlewaniyên mirovî rolê dilîzin, ku an jî gemjeyên civakê ne an jî navdar in û kesayetiyên xwedayî ne. Hin jî wan çîrokan di derbarê mijarên exlaqî de ne weke başî û xirabî û yan mijarên efsanewî ne. Ev çîrok pir kurt in û rengdaneweya taybetmendiyan mirovî ne. Weke mînak şêr weke remza mezinatî û rêzê, rovî weke remza fêl û firtan hatiye bikaranîn.

Awayê gotina çîrokan pîr hêsan e û bi zimanê diyalog û giftûgokirinê ne. Armanca Îsop ev bû rênimayî û şîretên exlaqî û perwerdeya gel bike. Pîraniya wan hikayetan ne bi zimane hunerî hatine gotin lê helbestvanên ku ev çîrok bihîstine bi awayekî hunerî weke helbest nexşandine.⁷⁴

Îsop yek ji wan kesan e ku ji ber bîr û baweriya xwe pîr azar dîtiye. Di vê derbarê de jî mirov dikare weke Soqrat lê mêze bike ku amade bû jehrê vexwe, lê li hember bîr û baweriya ew kesên jê re nakok bûn, dest ji baweriya xwe berneda. Îsop jî aliyê kahinên perestgeha Dîlfî ve hat kuştin. Ji ber ku tîrsa wan ji rexne û zimanê wî yê tund hebû. Ji ber vê jî ji cihê bilind avêtin xwarê. Her çend Îsop hewl da ku ew ji aliyê wan neyê kuştin bo ve jî hewl da bandorê li ser dil û hest û soza wan bike bi vê hincetê ku ew li bal wan mêvan bû.⁷⁵

Hin lêkolîner li ser vê baweriyê ne hûrgiliyan pêkenok di derbarê kesayetiyê Îsop de tên gotin encama nerîna serdema navîn e. Lê di rastiyê de Îsop xwediyê tu kirêtiyan nebû. Belkî berovajî tekstên berî van gotinan erê nakin.

Zanyar li ser vê baweriyê ne peydabûna van awayên çîrokên efsanewî yêr ajalan encama nêzîkbûna mirovê kevn li jiyana seretayî û peywendiya bihêz ya bi wan ajalan re ye. Di heman demê de jî berdewamiya wan çîrokan di serdema şaristaniyê de bingeha xwe li peydabûna dîktatoran û siyaseta şidetê digre.⁷⁶

⁷³ "Aesop", [http://www.hewalnews.com/Topic_4147_14], Gihîn: 11 Çile 2017.

⁷⁴ "Aesop", [http://www.hewalnews.com/Topic_4147_14], Gihîn: 11 Çile 2017.

⁷⁵ Dawid Selum, *b.n.*, r. 32.

⁷⁶ Dawid Selum, *b.n.*, r. 32.

1.9.2.Çîrokên Kelîle û Dimne

Kelîle û Dimne li ser rûyê cîhanê navdar e. Berî îslamê û paşê jî ji bo zimanên cuda cuda hatiye wergerandin. Piraniya van çîrokan xweş û bikelk û tijî şîret in. Dîroka çîrokên vê pirtûkê digihîje 100 heya 500 sal beriya zayînê. Feylesofê Hindî bi navê Beydeba ev çîrok ji bo Dibşelîmê padşahê Hindistanê vegotine.

Pirtûka herî navdar ku di serdema Sasaniyan de ji zimanê Sanskirîtî bo zimanê Pehlewî hatiye wergerandin pirtûka Kelîle û Dimne ye. Çavkaniya wê ya bingehîn jî "Panchatantra" ye ku ji 5 beşan pêk tê û îro li ber dest nîn e.

Di serdema Enuşîrewan de "Borzuyayê Pizîşik" ev pirtûk bi ser zimanê Pehlewî wergerandiye. Hin çavkaniyên din jî weke "Mihabiharât" lê zêde dikir lê ev çavkanî jî îro li ber destê me nemaye.

Çîrokên pirtûka Kelîle û Dimne di bingeha xwe de Hindî ne û bi zimanê Hindî hatîne nivîsin. Ebdula kurê Moqeffe'î jî di serdema Ebbasiyan de ji zimanê Farsî weke pexşan wergerandiye zimanê 'Erebî û paşê jî çend helbestvanan weke helbest wergerandine ser zimanê 'Erebî. Di dema wergera Kelîle û Dimne de pir caran tişt lê hatine zêdekirin û pir caran jî jê hatine kêmkirin.⁷⁷

Çîrokên vê pirtûkê bi zimanê ajalan hatine nivîsandin, beşeka zêde ji wan çîrokan bo zarokan dibe. Kelîle û Dimne navê du çeçelên birayê hevdu ne ku weke sernavê pirtûkê hatiye destnîşankirin. Çîrokên vê pirtûkê ji aliyê nîrx û kiryarqencî û ders û şîretên bikêrhatî û henekên xweş, pir dewlemend e.

Kelîle û Dimne di dema sasaniyan de û her wiha di dema îslamê jî pir girîng hat dîtin. Kelîle û Dimne ya Îbn el-Mûqefe' ku di wê serdemê de hatiye wergerandin û paşê jî xwediyê girîngiyeke zêde bû. Ev pirtûk bi zimanên serdestan hate wergerandin û di wêjeya cîhanê de cih girt û bandor jî lê kir. Pirtûka Kelîle û Dimne weke şahesereke bêmînak û nemir tê binavkirin û bi piraniya zimanên dinyayê hatiye wergerandin. Kelîle û Dimneya Îbn el-Mûqefe' her di destpêkê de ji bo hemî wergerên navdar yê cîhanê bingehêke binîrx bûye.⁷⁸

⁷⁷ 'Ebdulah Îbn el-Mûqefe', *Gelawêjî Kurdistan Kelîle û Dîmine Be Kurdî*, ç. 1, (Wer.: Hacî Mela Kerîmî Zengene), weş. Aras, 2001, r. 12.

⁷⁸ "Mêjuwî Edebî Mindalan", [<http://www.emrro.com/mejuyedebimindalan.htm>], Gihîn: 11 Çile 2017.

Îbn el-Mûqefe' ku weke wergêrê çîrokên Kelîle û Dimne ye, di destpêka pirtûka xwe de behsa çar armancên pirtûkê dike û dibêje: "Yê ku vê pirtûkê dixwîne bila bizanibe li ser çar armancan hatiye dabeş kirin. Ya yekem ji ber vê çendê bi zimanê ajalan hatiye nivîsandin da ku xwînerê herze û genc di xwandinê de pele bike, êca bala wan dikşîne ji ber ku mebesta çîroka ajalan dinyaya wan ya balkêş e. Ya duyem zelalkirina endêşeya ajalan e bi reng û awayên cuda, Ji bo vê çendê ku bibe hevdemek ji bo dilê şehenşahan û girîngîdana wan pir zêde dibe ji bo ku geştê di nav wan wêneyan de bikin. Armanca sêyem jî pêwîste ku li ser vê taybetmendiye be da ku şah û gelê bazarî jî bixwîne û pirtir navdar be û hejmareke zêde jê berbelav bibe. Bi vê çendê jî ji aliyê darayî ve pilansaziye jêre dike û yê ku bikartîne qazancê jê dibin. Armanca çaremîn jî taybet e bi feylesof.⁷⁹

Nivîskar Mihemed Emîn Doskî jî di pêşgotina wergerandina xwe de,⁸⁰ çend xalên giring nîşan dike û dinvîse ku pirtûk ji pênc pişka pêk dihêt, her pişkekê bihayê xo yê giring heye, nexasme ji layê dîrokî û edebî ve, zêdebarî ku dibine binyatê nasandina wê û ji ber ku faktor û egerêt danana pirtûkê diyar diken:

1-Pêşgotina (Behnudê kurê Sehwanî), yê ku bi 'Eliyê kurê şahê farsî dihête nîyasîn, têda behsê wê egerê diketin ya ku hêlay şahê Hindistanê (Beydeba)yê feylesûf raspêrt bo danana pirtûkî, zêdebarî wê danustandina dinavbera herdwan da peydabûy li dor danana wê û digel saluxetdana wan hêrşêt Îskenderê Romî (zu elqerneyn)î dijî deverêt rojhelat kirîn.

2-Hinartina (Berizeweyhê) dixtor ji layê şah (Enuşîrwanî) ve, bo îrana pirtûkê ji pirtûkxaneyê şahê Hindistanê, ku riwîdan û serhatiyêt wê wexerê bi renekê berfire têda hatîne behskirin.

3-Nîşadana pirtûkê ji layê 'Ebdula Îbn el-Mûqefe' ve, têda behsê giringiya pirtûkê û bihayê wê yê zanistî diketin, zêdebarî çendîn serhatî û şîret a.

4-Babetê jiyana (Berizeweyhê) dixtor ku ji layê aqldar û zanayê fursê (Buzurkmêhrê kurê Bextekanî) ve, hatiye nivîsîn, ev babete bi şeweyekê berfrih yê hatiye nivîsîn li dor gelek layenêt jiyana wî kesê şiyay vê pirtûka giring bighînite pirtûkxaneyê şahê fursê, dîsan çendîn serhatî û şîret yêt têda hatîn, ku bihayekê zêde ji layê edebî ve heye.

⁷⁹ Celal Enwer Se'îd, *Govarî Zankoy Koye*, J. 39, 2016, r. 118.

⁸⁰ 'Ebdulah Îbn el-Mûqefe', *Kelîle û Dmine*, ç. 1, (Wer.: Mihemed Emîn Doskî), weş. Spîrêz, Dihok, 2004. r. 7-8.

5-Cewherê pirtûkê ku dibîte deqê Kelfîle û Dimine diramayeka 'Entîke li ser zarê ajel û hova li dor babetê giringê jiyana mirovan, mîna peywendî yê dinavbera serok û cemawerî da û herwesa yê dinavbera nêzîkê şah û mîran da, yê dinavbera heval û hogran da. zêdebarî babetê mêhvandarîyê û dinyadariyê û toreyî yê dî yê mirovan û çendîn pend û hikmetê dî li dor gotin û kiryar û hizirê mirovînî.

1.9.3.Çîrokên Hezar û Yek Şev

Tê gotin ku yek ji sedemên rojhilatnasyê Orientalism⁸¹ li Ewropayê wergerandina çîrokên Hezar û Yek Şev e ku li rojava bi sernavê "Şevên 'Erebî" tên naskirin. Paş ku ev çîrok ji aliyê rojava ve bo zimanên wan hatin wergerandin û hatin şirove kirinev karê wêjeyî yê mezin weke îlhamekê bû ji bo parçeyek zêde ji hunermend û nîgarkêş û mûzîkjenên Ewropî.⁸² Çîrokên Hezar û Şevê ev çîrokin ku di edebiyata cîhanê de xwediyên cihekî taybetî ne û tesîreke mezin li nivîskarên serdema Romantîkê kirine, wek tê zanîn ev çîrokên han ji hezar û yek çîrokan pêk tên. Vêca ev hezar û yek çîrok di hin zimanan de bûne dih berg, di hin zimanan de bûne diwanzdeh û di hinan de jî bûne panzdeh.⁸³

'Ereb vê pirtûkê bi "ألف ليلة وليلة" an jî bi pirtûka xurafeyan binav dikin. Wate çîrokên nebawerî û destkri. Her wiha nivîskarên mesîhî yê Ewropayê jî di derbarê çîrokên Hezar û Yek Şev de xwedî nerîneke erênî nebûn. Li rojhilata navîn jî heya demeke dirêj tu nerîneke erênî di derbarê vî cureyê çîrokan de nebû. Di sedsala 19'an de ev baweriya xurafe berbelav bû ku her kesê vê pirtûkê bixwîne dê di heyama salekê de bimre. Di sala 1985an de komele û komên dînî li hember belavbûna bergeke ji pirtûka Hezar û Yek Şev nerazîbûna xwe î'lan kirin.⁸⁴

Di sedsala 8'an ya zayînî de li Mezopotamiyayê an Îraqa îro pirtûkeke bi navê Pirtûka Hezar Efsane hate nivîsîn ku di nav 'Ereban de weke hezar xurafe navdar bû.

⁸¹ Rojhilatnasyê yan Orientalism bi 'Erebî الاستشراق tê wateya lêkolîna zanistî û akadîmî ya civakên rojhilata dûr û nêzîk li gor nerîna rojavayê. Peyva Orientalismê di zimanên Ewropîyan û di xeyala rojavayîyan de tê wateya civakên ku li vî aliyê behra şîpî nîştecih in. Di sedsalên berê de wan li ser esasê zanyariyên geştiyar û hunermendên ku serdana welatên rojhilatê dikirin, nirxandînan dikirin ku rojhilat weke herêmeke pir ji efsane û xeyalên balkêş ditîne û paşê jî bûye ilhambexşê huner û xebatên wan yê wêjeyî. bnr. Newzad Ehmed Eswed, *b.n.*, r. 166.

⁸² "Orientalism- el-Îstîşraq: el-Nez'e el-Şerqiye"

[<http://www.feedo.net/LifeStyle/Arts/PlasticArts/Orientalism.htm>], Gihîn: 25 Çile 2017.

⁸³ *Çîrokên Hezar û Şevê*, (Wer.: Serdar Roşen), weş. Nûdem, Stockholm, 1998, r. 8.

⁸⁴ Ehmed Rehmanî, "Çîrokekanî Hezar û Yek Şewe", (Wer.: Sara Ermenî), *Raman*, J. 116, 2007, r. 105.

Bergê herî kevn yê vê pirtûka di sala 1879ê de li Îraqê hatiye nivîsîn. An ku cihê desthilata Ebbasiyan ku di sala 1750yê zayînî de fermanrevayiya Îraq û hin cihên din kirine. Lêkolînên zanistî vê çendê piştrast dikin ku heya îro jî hemû tiştên di vê pirtûkê de weke tax û bazar û hemû van zaniyariyan rast in ku li Besre û Baxda û Şam û Qahîre û Boxarayê hatine nivîsandin.⁸⁵

Li gor baweriya hin kesên jî çîrokên vê pirtûkê parçeyek bûye ji wêjeya perwerdeyê, bi awayekê ku dersên dilovanî, nermî û dadmendiye hînî xelîfeyên tûre bikin. Çîrokvanên şareza li gor nerîn û hunera xwe rûdawa çîrokên xwe diguherandin û bi awayekê digotin ku hin caran bîseran an jî xwîneran destpêka çîrokê bibîr ne dianî.

Hejmara çîrokên pirtûka Hezar û Yek Şev digehêje dused daneyan. Tê texmînkirin ku gotina hin ji wan çîrokan çend şevan dewam kiribe. 'Ereban navê hin ji wan çîrokên Îranî û Hindî li ser vê esasê ku ji bo wan nenas û degmen bûn guhertin. Nivîskar kelkê ji çîrokên Hezar û Yek Şev werdigrin. Hin kesên di derbarê çîrokan de pişpor in dibêjin ev pirtûk bingeha xwe ji navdartirîn çîrokên rojhilata navîn digre ku ew jî digehîjin Misra kevn.

Di derbarê çîrokên vê pirtûkê de ev bîr û bawerî heye ku di serdemên cuda de bihîstina wan çîrokan bi domdarî û her roj di dema êvaran de bû û çîrokbêjên bi hêz her parçeyê çîrokê bi komek rûdawên balkêş û bitam, bi awayekî taybet digotin. Ev awayê çîrokê, taybet ji bo zarokan nebû. Piraniya dê û kalên kolanê şevê li dewra hevdu kom dibûn û ji bo hevdû ev çîrok digotin. Di serdema Ebbasiyan de di gihandina destpêkî ya nîfşê nû de ku bikaribe karekê jî bidest bixe, wêjeya çîrokê roleke bibandor hebû.⁸⁶

Tê texmînkirin ku hunera wênegirtinê, teknîkên weşandina pirtûkan û hunera muzîkaya Ewropayê bandora xwe ji wan çîrokên romantik yên Hezar û Yek Şevê girtibe. Wisa xuya dike ku rengavrengbûna di nav efsaneyan de nîşaneyê wê çendê ye ku dilxweşîya jiyana şar, rindî û behre ji jiyane birin, parçeyek e xeyal a parçeyên cûrbicûr yên civakê wê demê bûye, xewin û xeyala jiyana pak û rengreng û romantik a di xerîbiyê de. Dibe ku sefera ji bo welatên rojhilatê heya îro jî xwîneran bi coş

⁸⁵ G.n., *Raman*, J. 116, 2007, r. 105-106.

⁸⁶ G.n., *Raman*, J. 116, r. 106.

tîne. Bi baweriya hin civaknasan jî naveroka wan çîrokan nîşaneyê vê çendê ye ku mirovên serdemên berê jî li dûv bajarekî bûn dadmendî tê de serwer be.⁸⁷

Di çîroka Hezar û Yek Şev de du cureyên ajalan (di şevê de) tên dîtin.⁸⁸

Ya yekem: Ajalê efsanewî bê sînora Sîmorxa Mezin û Sendbada Deryayê, an "Hespê baldar"yê çîroka Kûlhilgir û Sê Kîçan, an çîroka "Firzâh" pirtir weke çîrokên efsanewî tên pênasekirin û di nav koma xwende û nexwende de belav bûye.

Ya duyem: Ev çîrokên ku tê de ajal bi armanceke taybet tê de weke remzekên bikaranîn. Ev jî tê wateya berdewambûna hin baweriyên efsanewî yên kevn weke tê gotin: "Gayê دنیا یە hilgirtî".

Li gor lêkolîner 'Ebdulrezaq Hemîde de, çîrokên ajalan di nav çîrokên Hezar û Yek Şev de, bi van çend şiklan xuyan dibe.⁸⁹

-Hin ji wan weke çîrokên Kelîle û Dimne ne. Weke çîrokên bazergan û ajalên vî (ker, ga, se û dîkil) ku di destpêka pirtûkê de hatine û her wiha çîrokên ajal û teyran di beşa duyem de û çîrokên wîrdxan di beşa çarê de.

-Ev çîrokên ku ajal tê de her weke xwe tên bikaranîn û bi armanca razîkirina xeyal û hêvîyên mirov ji bo firîne li ser piştê xalîçe firîne, li ser bale teyran. An jî li ser hespê balder weke hespê Ebenûs.

-Ev çîrokên ku têde ajalên balkêş û namû hene. Weke çîroka Hasib Kerîm Eldîn û çîroka Sendîbad.

-Ev çîrokên ji bilî yên Sihravî ku mirov tê de diguhere û dibe ajal yan bêgiyanek .

Bêşik cudayîya dem û gavên çîrokan û serdemên wan bûyê sedema cudayîya cureyên ajalên nav çîrokên Hezar û Yek Şev. Di vir de jî cudayîya di navbera wan çîrokan û yên din weke Kelîle û Dimne derdikeve holê.

1.9.4.Çîrokên Lafontîn

Jean de La Fontaine, nivîskar û helbestvanê firansî di dîroka çîrokên xurafe yên ajalan de weke yek ji nivîskarên herî navdar tê naskirin. Lafontîn nivîskarekî mezin yê çîrokên helbestên efsanewî yên zarokan e. Di cîhanê de bi çîrokên "Fable" navdar bûye ku weke helbest nivîsandiye û hêz û zanîn û bilîmeta wî nîşan dide.

⁸⁷ H.g.n., *Raman*, J. 116, 2007, r. 107-108.

⁸⁸ Şukriye Resûl, *b.n.*, r. 26-27.

⁸⁹ Ebdulrezaq Hemîde, *b.n.*, r. 196-197.

Heya îro jî di vê bebetê de tu nivîskarekî nekariye bigehêje asta Lafontîn. Lafontîn di sala 1621'ê de li herêma "Şambayn", li bakûrê rihilatê Fransayê hatiye ser dinê.

Di sala 1641'ê de ji bo xwendina Lahût diçe Kenîsê. Piştî demekê ji Kenîsê derdikeve. Ji ber ku babê wî berpîrsê daristanên malbata şah bû, dikarî pir caran biçe nav wan daristanan û têkel siruştê be û bi hûrgilî li ajalan binêre, bibe hogirê wan û bi taybetî ajalên ku pirtir jê hez dikir. Li Parîsê xwendina bilind berdewam kir. Lafontîn di zimanê firansî de pir jîr û şareza bû. Weke endamê Akademiya Fransayê hate hilbijartin. Di sala 1695'ê de jî li Parîsê jiyana xwe ji dest da.⁹⁰

Lafontîn weke afirînerê çîroka halbestî ya efsanewî naye naskirin. Ew bixwe jî li ser vê baweriyê ye ku çîroka efsanewî ya Îsopê Yewnanî û Beydebayê Hindî û Fîderê Latînî û çend çîroknûsên din bandor lê kirine û sêdeke pir zêde ji wan girtiye. Heya astekê ku beşek ji çîrokên wî têkel çîrokên Îsop bûne û hin ji çîrokên Îsop weke çîrokên Lafontîn hatine naskirin. Her wiha berovajî jî tê gotin.⁹¹

Çîrokên xwe bi zimanê ajal û teyr û jîndaran nivîsiye. Di hin ji çîrokan de jî mirov role digêre. Lafontîn dibêje ku "Min ajal ji bo rêberiya mirov bikar aniye". Lafontîn bi zamanê wan ajal û teyr û daran rexneyan ji zordaran, sitemkaran, fêlbazan, napakan, pozbilindan, nezanan, bedkaran û nedadperweran digre û şîreta dilovaniyê, soz, xweşewîstiyê û rehmê dike. Piraniya çîrokên Lafontîn bi şîret an hevokeke rênîşander bi dawî tên. Weke mînak di çîroke "Leklek û Rovî" de armanc ev e ku bêje "yê ku fêl bike dê fêl jê bê kirin"... û di piraniya çîrokên xwe de armanca çîrokên xwe ji ron kiriyê.⁹²

Çîrokên xwe yê helbest bi awayeke nazik û şîrîn dariştiye ku xwedî şewaz û taybetmendiyên cuda ye. Çîrokên wî kurt in û pîrbêjî tede tune ye. Bi zimanek nazik û sade nivîsandiye. Ev tişte jî bûye sedemê cudayîya çîrokên Lafontîn yê efsanewî. Çîrokên Lafontîn li Firansayê ketin nav dev û zarê zarok û mazinan û bi gelek zimanên dinyayê hatin wergerandin. Gelek ji helbestvan û çîroknivînan bandor ji

⁹⁰ Sasî Behîce, *Hikayet el-Xurafe 'Ela Lisan el-Heywan (Îbn el-Muqefe' we Lafuntîn Enmuzecen)*, (Teza Master), Kulliyet el-Adab we el-Luxat, Camî'et Telmesan, el-Cezayir, 2012, r. 26.

⁹¹ Lafuntîn, *Hikayat Min Lafuntîn*, (Wer.:Cibra Îbrahîm Cibra), ç. 1, weş. Dar Seqafet el-Etfal, Bexdad, 1987, r. 6.

⁹² "Lafontîn Keleefsanenûsî Çîrokeşî'r Bo Mindalan", [<http://www.emrro.com/lafontin.htm>], Gihîn: 11 Çile 2017.

efsaneyên wî girtine. Di nav wan de jî "Ehmad Şewqî" mêrê helbestvanên ereb ku di eslê xwe de Kurd e û di destpêka dîwana xwe de jî amajê bi vê bandorgirtinê dike. Her wiha çendîn helbestwan û çîroknivîsên din jî li Lafontîn bandor gitrin e.⁹³

1.10.DÎ WÊJEYA FOLKLORA KÛRDÎ DE AJAL

1.10.1.Wêjeya Folklorî Kurdî

Wêjeya folklorê berhemê ser ziman û nenivîsî ya dahênerên nav xelk û gel e. Her li vê roja mirov li ser ruyê erdî hest bi bedewiya xwe û jiyana û sirûşt kir, wêjeyeke serzimanan ya nenivîsandî peyda bû û li nifşek bû nifşa din weke mîrat ma. Ev wêje di nava mêjî de hatiye parastin û bi ziman û bi awayeke jiber kirî hatiye gotin. Di dawiyê de ev wêje ya nenivîskî bûye çavkaniyek girîng ji bo wêjeya nivîskî.

Gelek ji berhemên navdar yê cîhanê, wêjeya nenivîskî bûn û paşê jî bûne wêjeya nivîskî. Çavkaniya sereke ya piraniya berhemên yekemîn yê kilasîk a netewan û gelek ji şakarên wan yê edebî, wêjeye folklorê bûye. Weke mînak di wêjeya Kurdî de şakara wêjeya Kurdî "Mem û Zîn"ê Ehmedê Xanî ji "Memê Alan" yê folklorî ya di nav gel de îlham girtî ye.⁹⁴

Her berhemek wêjeya folklorî, wêjeya nivîskî dewlemend dike, ji ber ku her wekî hat gotin, destpêka wêjeya nivîskî li bal hemî gelekê ve folklor bûye. Maksîm Gorkî (1868-1936) dibêje: "Rewreweya dîroka millet nahê zanîn heya ku folklorê vê nehê zanîn". Bi rêya folklorê ve gelek hêlên cuda a folklorê netewan eşkere dibe. Her wekî hêla ayînî, dîrokî, civakî û rewşa derûniya gel.⁹⁵

Wêjeya milî ya neteweyên kevn yê Hindî_Ewropî û Hindî_Îranî li efsane, çîrok û hikaye û straniyan demek dirêj cewhera wêjeya folklorê Kurdî bûn. Wêjeya Kurdî bi rêrewa kilaman sirûştê welatê Kurdewarî û jiyana civakî li gel ev cewherên kevn têkel yê kir û di nav hevdu de helandin. Weke mînak wêjeya kurmanciya jor di destpêka xwe de jî wêjeya folklorê netewî nêzik bûye, heya derketina hozanvanên

⁹³ "Lafontîn Keleefsanenûsî Çîrokeşî'r Bo Mindalan", heman malpera berê.

⁹⁴ Me'rûf Xeznedar, *b.n.*, b. I, r. 179,180.

⁹⁵ Şukriye Resul, *Edebî Folklorîy Kurdî - Beşî Duwem*, weş. Zanikoyî Selaheddîn, 1984, r. 175.

weke Melayê Cizîrî (1567-1640) û Ehmedê Xanî (1650-1707) û Pertewê Hekarî (1756-1825).⁹⁶

Folklor di perwerdekirina netewî û hişyarkirina hizirê û xebata li ser derun û tigihiştina û hişmendîya zarokan de xwedî girîngiyeke pir zêde bûye. Li gor Maksîm Gorkî, folklore goşekerê zarokane bi zimanê daykê û hişyarkerê tama ciwannasiyê ye.⁹⁷

Têkeliyeke xurt di navbera hunera folklore mezin û zarokan de heye. Berhemê folklore mazinan, paş ku ji hin hêl û şêwazan ve tê guhertin û şêwaz û armancên nû digre, vêca têkel folklorê zatokan dibe. Armanca folklorê zarokên Kurd heman berhem û dahênanên milî yên ser zimanê wan e, her wiha ev dahênanên mezin ku ji bo zarokan hatine afirandin, li kêleka dahênanên zarokan bixwe.⁹⁸

Wêjeya folklorê Kurdî jî her wekî wêjeya piraniya gelan û bitaybet gelên rojhilata navîn, pêk hatiye ji çend cureyên bingeşên yên wekî: Efsane, îpos, çîrok ku hin ji awayên wê di Kurdî de weke beyt, hîkaye û hozanên lîrîk tîn naskirin. Her wiha wêjeya folklorê Kurdî xezîneyek dewlemend ji şîret ên pêşîniyan û henek û metelokan e.⁹⁹

Hîkayeta folklorê Kurdî parçeyek mezin û berfireh ji wêjeya folklorê e ku dev bi dev û nîş li duw nîş gihiştîye me û bi awayê pexşaneke hunerî hatiye vegotin û taybetmendî û dîroka xwe ya kevn di hişmendîya civakê de parastîye. Hev di destpêkê de Kurdan edet kiriye şevên dirêj û heyama bêkariya xwe bi vegotina hîkayetan bi dawî înan e û meclîsa civîna xwe pê germ kirine û alîgirê hîkayetan bûne û tam jê birin e. Nirx û buhayê wan hîkayetan tenê alîgirbûna zarokan nebûye. Lêbelê mirovên mezin û şehênşa jî alîgir bûn e û li rêya wan hîkayetan ve şîret girtin e.¹⁰⁰

Şûkriye Resûl hîkayeta Kurdî li ser wan cureyan de dabeş dîke û dibêje: Di nav gelên dinyayê de çend cureyên hîkayetan hene ku ji bo gişt dewranan dibin û ev jî ev in:

1-Efsane û Serhatî

⁹⁶ Me'rûf Xeznedar, *b.n.*, b. I, r. 180.

⁹⁷ Nahîde Ehmed, *Seretayek Derbarey Serheldani Edebî Mindalani Kurd*, ç. 1, weş. Mukriyanî, Hewlêr, 2005, r. 8.

⁹⁸ Nahîde Ehmed, *b.n.*, r. 19,22.

⁹⁹ Îzeddîn Mustefa Resul, *b.n.*, r. 15.

¹⁰⁰ *B.n.*, r. 9.

- 2-Hîkayetên Jîndaran
- 3-Hîkayetên Meçêtiran
- 4-Hîkayetên Netewî yên Civakî
- 5-Hîkayetên Henekan
- 6-Hîkayetên Şîretbar¹⁰¹

1.10.2.Di Wêjeya Folklorî Kurdî de Efsaneyên Jîndaran

Efsane û çîroka efsanewî di nav folklorî hemî gelên dinyayê de heye, bûye beşek nemir a kelepûra milî û netewî. Hin ji çîrokên efsanewî bûne efsaneyên gerdûnî, her gelek jî esaleta vê li xwe dizane. Bêguman gelê Kurd jî xwedî gencînek tijî ye û bi dehan çîrokên efsanewî û folklorî û milî û hîkaye tê de hene .

Efsaneyên Kurdî wêneya nakokîya di navbera dêw û mirov dike, weke nîşaneyên ev kêşeyên di serdema kevn de li civata mirovî de û di navbera hêza baş û hêza xirab de, an hêza xêrxwaz û hêza xirab û nebaş de hebûye. Weke mînak wêneyê mar di efsaneyên Kurdî de wêneyek ji hêza xirabe ye. Zanyarên mîtolojîk wê çendê bi baweriyêke dînî ya kevn ve girê didin.¹⁰² Mirov ew çiqasê di derbarê mar de raman û efsane afirandine, di derbarê tu mijarek din de bi wî awayî neafriandiye.¹⁰³

Mewlud Îbrahîm Hesên, di vê bawerî de ye ku lêkolîna Kurdî tu girîngiyê berçav nedaye efsaneyê, yê ku hey jî hin ji nivîskarên Kurd li kêleka behsa ji cureyên Hîkayetên behs ji efsane û cureyên vê jî kirine. Ji bo vê jî çend nivîskarên Kurd weke mînak diyar dike. Di nav wan de jî “Qanatê Kurdo”ye ku çîroka Kurdî le ser çend cureyan dabeş dike, di nav çîrokan de cihekê jî bo efsaneyê berçav digre. Lê her wekî ku Mewlud dibêje, Qanatê Kurdo efsane û hîkaye ji hev dû cuda nekirye û di dabeşkirina xwe de tenê di xala çaremîn de navê efsaneyê tîne. Herçiqas ew dikar bû ku hemî xalan weke efsane binav bike û li dewsa çîrokê jî binvîse efsane. Qanatê Kurdo gotiye ku çîrok û hîkayetên Kurdî li ser wan komên jêr de parve dibin:

- 1-Çîrok û Hîkayetên di derheqê jîna mirov de, di derheqê jîyan û ayîna wan de.
- 2-Çîrok û hîkayetên dîrokî.
- 3-Çîrok û hîkayetên derheq heywanan, teyr û terewalan.

¹⁰¹ *H.b.n.*, r. 16.

¹⁰² Îzeddîn Mustefâ Resul, *b.n.*, r. 19-20.

¹⁰³ Şukriye Resûl, *b.n.*, r. 141.

4-Çîrok û hîkayetên efsanewî û xeyalî.¹⁰⁴

Mewlud Îbrahîm Hesên wisa hizir dike ku efsaneya Kurdî pir dewlemend û kevn e. Her ev dewlemendî û kevnar bûne jî bûye sedem gelek şewazên efsaneyê di nav efsaneya Kurdî de kom bibin. Her ev di lêkolîna xwe ya biqîmet de efsaneya Kurdî li ser deh cureyan de dabeş dike. Ya ku ji bo me girîng e û girêdayî mijara me ye eve ye ku cureyê nehem weke efsaneya jîndaran binav dike û di wesfa vê de dibêje: ” Di gelek ji efsaneyan jîndaran jî xwedî rola serekene û efsane li ser rola wan li hember mirovan kesayetiyêke din yê di nav efsaneyê de hatiye damezrandin. An jî heman jîndar efsaneyê birêve dibin. Di vê awayê efsaneyê de jîndar gelek rewîştên baş û xirab ên mirovan di nav kar û kiryarên xwe de bikar tînie û awayê sirûştê xwe jî diparêzin. Tevî ku di hin efsaneyan de, bi taybet jîndaran bi cadû an jî bi sedeme efsanewiyên din, şiklguhertinê dikin û li kincekê diçin kincek din. Ev xweguhertin taybet bi jîndaran nîne, belkî hin car mirov û bitaybet mirovê sehirbaz û bedkar jî vê xweguhertinê dike û ev xweguhertin jî weke hemî karên efsanewî gelek ji nişkê ve rû dide”.¹⁰⁵

1.10.3. Di Wêjeya Folklorê Kurdî de Hîkayeta Jîndaran

Li kelepûra gelan de tê xuyakirin ku hîkayeta jîndaran li her şûnwar û di nav hemî gelan de heye û di nav hemî awayên wêjeya folklorê de weke wêjeya ronakbîriyê an jî wêjeya bilind û binirx tê binav kirin ku bûye sedemê rakêşana bala mirovên mezin û şehensahan û filosof û wêjevanan.¹⁰⁶

Hîkayeta jîndaran awayêke taybet a cureyên hîkayetê ye, ji ber ku di kevn de peyda bûnem ev hîkayetane teswîra bala mirovên serdemên kevn di derbarê jîndaran de nîşan didin. "Ev jî tê vê wateyê ku baldarî û ceribandina ravkerê yekemîn û ravkirina yekemîn û paşê jî şivanê yekemîn û xwedî mer û malat ziq dikin".¹⁰⁷

Hîkayeta jîndaran di kevin de mil bi milê efsaneyan pêşketî ye, rûberek berfireh ji kelepûra Kurdî li xwe digre û kevnar bûna vê jî di vê çendê de tê dîtîn ku ev ajal li derdûra miravan jiyan kiriye û mirov jî hogirê wan bûne û jê hez kirine. Vegotina hîkayetan li ser zimanê ajalan armancek destnîşankirî ya civakî hebû û ajal

¹⁰⁴ Mewlud Îbrahîm Hesên, *b.n.*, r. 21-22.

¹⁰⁵ Mewlud Îbrahîm Hesên, *b.n.*, r. 27.

¹⁰⁶ Şukriye Resûl, *b.n.*, r. 20.

¹⁰⁷ Nahîde Ehmed, *b.n.*, r. 36.

bûne remzek ji bo merem û armanca mirovên baş û xirab. An jî pir caran ji bo derbazkirina demê û tam jê girtin hatine vegotin.¹⁰⁸

Ev awayê çîrokane di wêjeya piraniya gelan, di wêjeya nivîskî û wêjeya devkî xuya dike. Kelîle û Dimne mînake berçav ya ev wêjeyê ye ku weke mîrata hemî gelên rojhilatê tê naskirin. Îro di wêjeya dinyayê de û her wiha di wêjeya riyalîzmê de jî tê dîtin. Ev çîrokane di lapereya îroyîn de girîngîdana wêneya jîndar û ajal û teyreke wêjeya folklorê gel e. Şêwaza taybet a dewrekê bi wan ve ye ku mirov gav bi gav şarezayê wan jîndaran bûye û ketîye kevîkirina wan.¹⁰⁹

Di folklorê Kurdî de hejmareke mezin a hîkayeta jîndar û teyr û mêtû heye ku têde ev jîndar jiyaneke pir ji xweşî û fikirîn û serkeftinê derbaz dikin. Her wiha Hîkayeta jîndaran bala zarokan dikêşe xwe û sînore dinyayê ji bo wan berfirehtir dike. Ev hîkayetên jîndaran li kêleka vê çendê ku dem derbazkirineke xweş ji bo zarokan dabîn dike, her di vê demê de jî xwedî armancên perwerdehiyê ne û her yek ji wan xwedî yek an çend şîretan e. Zarok bêyî ku bixwe jî hest pê bike sûd jê digre.¹¹⁰

¹⁰⁸ Şukriye Resûl, *b.n.*, r. 10.

¹⁰⁹ Îzeddîn Mustefa Resul, *b.n.*, r. 26-27.

¹¹⁰ Nahîde Ehmed, *b.n.*, r. 39.

BEŞA DUYEM

2.WÊJEYA KURDÎ YA ZAROKAN

Zarok hêviya pêşeroja gel in. Pêşveçûna civakê dikeve ser situyê wan. Ji ber vê jî pêwîste bi awayekê bîn perwerde û amadekirin ku bibin xwedî fikr û hizreke hişyar û berfireh. Cîhana zarokan cihaneke taybet e. Ji hêla hemî wan tiştên ku bala mirov dikşînin û awayê pirsan, şewaza hizrkirinê, cureyê bersivdanê, ev tişt û cihên ku di leyizan de bikar tînin û her wiha ev tiştên ku dilxweş an jî dil pûç û nexweş dike. Ev cîhana taybet ya zarokan pêwîste weke rastiyeke ku tu cihê gumanê nîne, her tim li ber çavê wan nivîskar û perwerdekarên be ku ji bo zarokan dinvîsin û zarokan perwerde û hîn dikin.¹¹¹

Wêjeya zarokan ji kareke hunerî ya mezin pêk tê ku di zaroktiyê û di sazûna kesayetiye de bi tememî beşdar dibe, di pêşerojê de bi vê sedemê zarok dibe endameke nû yê civakê.¹¹² Wêjeya zarokan hemî mijarên têkildarî jiyanê li xwe digre û di hemî evraz û nişîvên jiyanê de alîkariyê dide zarokan. Girîngiyê dide hêza xeyala wan, ezmûnên cuda cuda û pir reng têxe ber dest, şeyana afirineriya wan têxe ger û geşedarê. Armancê ev cureyê wêjeyê tenê hînkirina xwandin û nivîsandinê û her wiha amadekirina mijarên reftarî û exlaqî ji bo zarokan nîne.

Di her babetekê de ku ji bo zarokan tê nivîsandin, pêwîste ku awayeke jêhatî û rêyek ji bo wergirtinê hebe ku zarok vê babetê baştir hîn bin, încar babet xeyalî û fantezî be an rastî. Pêwîste nivîskarên pirtûkên zarokan hewlên xwe li ser vê çendê zêde bikin ku zarokan bi haydariyeke zêdetir li dinyaya ku têde dijîn rêberî bikin.

Perwerdekirin an jî hewla guhertina sîmayê reftara zarok vê demê serdikeve ku nivîskar an jî hînker kesê li ber destê xwe bi hûrgilî û bi awayeke rast binase, an ku bizane ev kes (zarok an genc) kê ye û çava pêş dikeve.¹¹³

Wêje ji bo zarokan, hozan an jî çîrok an her cureyeke din, her cureyek li gor sirûştta xwe ji bo zarokan xwedî taybetmendiyan xwe ye, ji bo ku ev awayê wêjeyê ji bo zarokan bi dest bikeve, pêwîste nivîskar wan taybetmendiyan berçav bigre û

¹¹¹ Mihemed Reşîd Fetah, *Nimûne û Lêkolînewe Le Edebî Mindalanî Kurd*, ç. 2, weş, Berêweberayeti Zincîre Kitêbî Mindalan, Hewlêr, 2009, r. 4-5

¹¹² Mihemed Rehîm Remezani, *b.n.*, r. 9.

¹¹³ Yûnis Rezaî, "Edebî Mindalan Çirayek Leser Rêyi Dahatû", *Raman*, J. 168, 2011, r. 64-65.

pêbendê wan mercan jî be ku di her asteke taybet ya zarok li serê wî ferz dike. Ger beşa vê wêjeyê çîrok be, pêwîste çîrokê dinyaya zarokan berçav kiribe, têkeliyeke xurt jî bi pêdawîstiyên re hebe, bîrokeyeke ronîker ya mirovî ya eşkera wisa pêxe nav hiş û xeyala wan de ku weke kevirê binêşeya kesayetiyê, paşerojê ronak li serê bê ava kirin, li bê hêvîti, bêhintengî û xeman dût bike. Bêyî ravekirina çîrokê bixwe bi awayeke mîkanîzmî armanca vê bike sirûstek di derûnê wan de xoşiyê bilav bike û deriyê xeyaleke rengîn ji wan re veke. Êdî ew çîrok rastî be an jî dastan be, li ser zimanê zarokan be an jî bi zimanê ajal û jîndarên din be.¹¹⁴

Ji bo wêjeya zarokan çend pênaseyên cuda hatine pêşkêş kirin, dikare bê gotin ku hemî pênase li ser wan du pênaseyên jêr kokin:

Wêjeya zarokan di wateya giştî de ew berhemên hizrî ne ku di nav pirtûkê de ji bo zarokan hatibin nivîsandin û di wateya taybeta xwe de jî tê wateya koma gotinên xweş ku tam û xweşiyê pir wate bide hûndirê zarokan û hiş û soza wan ber bi vê wateyê bikêşin. Êdî ev wate bi awayeke helbestî hatibe honandin an jî bi nesir, bi awayeke dewkî û bihîstin be an jî xwandin û nivîsandin an sitran û sirûd û gotar.¹¹⁵

Wêjeya nivîskî ji bo zarokan weke diyardeyê nû tê naskirin û li başûrê Kurdistanê di destpêka sedsala bîstan de peydabûye. Demê ku tê gotin wêjeya zarokên Kurd li destpêka sedsala bîstan de serhildaye, armanca ev wêje ye ku ji bo wan û bi armanca rêberiya wan hatibe nivîsandin. Wêjeya zarokan ji wan berhemên nivîskî yê zanistî û hunerî pêk tê ku bi awayê taybet û rasterast ji bo wan hatine nivîsandin. Her wiha parçeyek ji wan nivîsan jî li xwe digre ku ji bo mezinan hatine nivîsandin, hin guhertin tede pêk hatine, heya li gel dinya û heyama fikirîna zarokiyê bê guncandin. Bi taybet ev berhemên ku parçeyek ji wêjeya kilasîk û wêjeya netewî ne. Ev jî roleke mezin digrin di perwerdekirin û ciwannasî û morala zarokan û şarezaiya wan berfireh dikin û bi jiyana re girê didin.¹¹⁶

2.1.DÎROKA DESTPÊK Ê PEYDABÛNA WÊJEYA ZAROKAN

Wêjeya zarokan parçeyê zindî ya wêjeya hevdem ya gelê Kurd e û nîşaneyê berçav ya asta pêşveçûna kultura Kurdistanê ye. Eşkera ye di destpêkê de di çand û kelepûra netewa Kurd de jî her weke netewên din, komek berhemên şe'irî û

¹¹⁴ Heme Kerîm Hewramî, "Merca Gşitîyekanî Edebî Mindalan", *Raman*, J. 160, 2010, r. 160.

¹¹⁵ Heme Kerîm Hewramî, *Edebî Mindalanî Kurd*, b. I, r. 15.

¹¹⁶ Nahîde Ehmed, *b.n.*, r. 7-8.

çîrok û berhemên cûrbicûr yê taybet bi zarokan hebûye. Lê wêjeya nivîskî ya zarokên Kurd li Kurdistana başûr di dehsalên bîstan yê sed sala bîstê de dest pê kiriye.

Ji bo diyarkirina destpêk û bingeha peydabûna wêjeya Kurdî ya taybet bi zarokan, lêkolîner û nivîskarên Kurd amajê bi çend berheman dikin weke mînak:

Ferhenga “Nûbihara Biçûkan” ya Ehmedê Xanî

“Nûbihara Biçûkan” yan “Nobara Biçûkan” ferhengokeke Xanî ye ku sala 1682’yê ji bo zarokan hatiye nivîsandin. Ev jî bi armanja hînkirina zimanê 'Erebî û Behrên 'Erûzê ji bo zarokan û hem bi armanca perwerde û şîretkariya zarokan. Her wekî diyar e ev cureyê helbestê jî perwerde û hînkarî ye “Dîdaktîkî”. Ji ber vê yekê jî dikare bibe berhemê yekem ya ji bo zarokan û helbesta zarokan di wêjeya Kurdî de.¹¹⁷

Ferhengoka Ehmedî ji aliyê zanayê dînî “Şêx Marifê Nodê”

Ev ferheng hin peyvên Kurdî li gel wergera wan ya 'Erebî li xwe digre. Şêx Marifê Nodê (1766-1838) ev pirtûke ji bo “Kake Heme-Kak Ehmedî Şêx (1792-1887) yê kurê xwe dana ye bi vê armançê hînî zimanê 'Erebî bibe. Ev berheme heya salên pêncî jî yek ji çavkaniyên hînbûna zimanê 'Erebî bû ji bo zarokan.¹¹⁸

Helbesta Mewlewî (1882-1896) an jî “Eqîdey Mewlewî”

Ji aliyê Mewlewiyê helbestvan ve hatiye danîn. Helbesteke dirêj e û bi zimanek e hêsan û rewan behs ji bingeheên dînê îslamê dike.¹¹⁹

Pirtûka Alfabe Kurdî (1920)

Ji aliyê zanayê Kurd “Mihemed Başqe” ve û bi hevkarîya Emîn Zekî Beg ve hatiye nivîsandin. Weke pêngaveke girîng tê zanîn di meydana nivîsîn ji bo zarokan û alîkariya zarokan daye di destpêkirina xwandina bi zimanê Kurdî û bûye bingeha pirtûkên Kurdî yê xwendegehan.

Lêkolîner “Nahîde Ehmed” li ser vê bawerê ye ku qonaxa yekemîn ya geşedana wêjeya zarokên Kurd li Kurdistana Başûr, vedigere dehsalên bîstan heya dehsalên çilê yê sed sala bîstan. Her wiha dibêje ku “Di dehsalên sed sala bîstan de

¹¹⁷ Bnr.: A- Me'rûf Xeznedar, *b.n.*, b. II, r. 447-448.

B- Fazîl Mecîd Mehmûd, "Helsingandî Kitêbî (Edebî Mindalanî Kurd)", *Raman*, J. 207, 2014, r. 77-78.

¹¹⁸ Me'rûf Xeznedar, *b.n.*, b. III, r. 36-37.

¹¹⁹ Bnr.: 1-Nahîde Ehmed, *b.n.*, r. 64-65.

2-Me'rûf Xeznedar, *b.n.*, b. III, r. 438.

mil bi milê pirtûkên xwandina Quranê, pirtûk û berhemên hêsan ji bo zarokan peyda bûn e ku armanca wan berfirehkirina hizr û hişê zarokan bûye. Ev pirtûk bi piranî li helbestan pêk dihatin û hin car jî helbestên wergerandî jî têde hebû. Her wiha çendîn hîkayetî Kurdî û farsî jî di bergê pirtûkê de taybet ji bo zarokan hatine weşandin û belav kirin”. Di nava wan nivîskar û helbestvanane de jî: Zîver, Pîremêrd, Bêkes û Goran.¹²⁰

Hozanvan û nivîskarê navdar yê zarokan, Rostem Bacelan dibêje ku “Dikarîn bêjîn ku li dehsalên sîyê û çilê de wêjeya Kurdî ya zarokan ji dewsa vegotinê anku hîkayetên fulklurî yên (beragirdan), bi awayê nivîskî bûna xwe bi zarokên Kurd da nasandin. Ev rastiye jî bi çîrokên “Kurd Yekin” û “Şêrê Teyn Ehmedê Xanî”, yên Nûreddîn Zaza (1988-1919), Çîrok Ji bo Zarokan (1933), Havrêy Mindalan (1948) yê Şakir Fetah (1988-1914) tê piştrast kirin. Di rastî de çîrokên Nûreddîn Zaza xwemalî ne û berhemên Şakir Fetah jî yê yekê werger e û yên din jî komekê gotaran e ku bal û hesta zarokan ji bo aliyê xwe ra dikêşe”.¹²¹

Li ser vê esasê jî destpêka wêjeya zarokan, helbest û hozan bûye û paşê çîrokên nivîskî yên zarokan ser hildaye û peyda bûye .

2.2.ÇÎROKA ZAROKAN

Zanyar di nav wêjeya zarokan de çîrokê weke hunera herî bi bandor û damazrênerê bîr û baweriyên xwe dizanin. Her ji ber vê çendê jî li bal gelên pêşketî yên ku çîrokê ji bo zarokan dinvîsin li yên ku helbestan ji bo wan dinvîsin zêdetir in. Lê belê di welatê me de ev tişt berovajî ye. Belkî ji ber vê yekê be ku netewên bindest yên weke Kurd li mêje derfeta nivîsadina çanda wan ya netewî jê hatiye zêft kirin, an jî ji bo wan nehilketiye. Ya ku hilketiye jî tenê ji bo helbestê bûye ji ber ku helbest zû tê ber dest û zû digehe armanca xwe.¹²²

Mîrvet Mihemmed Kamil, weke piraniya lêkolîneran li ser vê bawerê ye ku: “Guncavtirîn rêya gihiştina bi zarok û hêvîyên wî, çîrok e. Bi rêya çîrokê zarok xêr û şeran di jîyanê de ji hev cuda dike. Di vir de jî bi awayeke nerasterast zarokan ji bo

¹²⁰ Nahîde Ehmed, *b.n.*, r. 66.

¹²¹ Rostem Bacelan, "Çîrokî Mindalan (çemik, wergêran, nûsîn, amadekrdin, wênekêşan)", *Raman*, J. 117, 2007, r. 185.

¹²² Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 68.

aliyê xêrê radikêşe û li şer dûr dike. Zarok bi rêya çîrokê zaniyariyên tam bidest dixê. Fêhm dike ku kîjan rast e û kîjan çewt e".¹²³

Her di destpêka jiyan de pêdiviya zarokan bi ronakbîrkerîna heye û pêwîste ev çend ji bo bîna dabîn kirin ku tiştên pir sade ne, ji ber ku zaniyariyan bi başî verdigre û di mêjiyê vê de dimîne û ji bîr nake. Heta ku ger nekare ifade bike jî, li destpêkê de ji tiştên biçûk destpêdike. Her tiştê hebe, bi zimanek sade û hêsan hîn bikin, paş ku wêneyê vê dibîne bixwe dîsan dubare dike. Her çendê temenê wî mezintir dibe, li gor temenê xwe tiştan verdigre û perwerde dibe, ev tiştê jî destpêka ji bo ronakbîrkerîna zarokan. Di vî rewşê de zarok di halê xwandin û xwe ronakbîrkerîna ye. Ji ber vê jî pêwîste her di destpêka jiyanê de hîn xwandina çîrokan bikin. Pêwîste çîrok jî pir sade bin û behs ji hezkirin, lêborîn û rastgoyiyê bikin.

Zarok ji leyzvanên çîrokê pir tiştan hîn dibe û kesayetîya vê de dijî û dixwaze teqlîd bike. Bi vê mercê dê û bav zaniyariyan bi başî bigehînin. Ku zarok jî kesayetiyên baş teqlîd bike, hest bi hebûn û kesayetîya xwe dike. Ji ber vê jî pêwîste bi awayekê hişyarî û bi zanebun çîrok ji bi vî bîna hilbijartin ku dûr be ji şidet û mirin û xwînriştin û ruhê tolhildanê û karakterên xirab yê di nav çîrokan de bi awayekê bêne nîşandan ku tûşî poşmanî û şirmezarî û cûda bûnê dibe. Di vî halê de bê şik zarok dê li hember karakterê xirab hest bi nefretê bike, xwe ji wan karên nebaş dê biparêze ku jê nefret dike, di heman demê de jî xwe di kesayetîya baş de dibîne û hewla teqlîdkirinê dide.¹²⁴

Rizgar Ebdulqadir Se'îd di teza xwe ya mesterê de bi vî awayî çîroka zarokan pênase dike: Çîroka zarokan berhemek wêjeyî û hunerî ye ku ji hizra mirov diafire, û bi rêya ziman û bi awayê helbestê berhem tê û bi endîşe û xeyal û hest û sozê e weke zarokan tê xemlandin. Di avabûna xwe de jî naverokên cur bi cur yê weke perwerdehî, civakî, zanistî, ayînî û hwd li xwe digre û regez û bingehên huneriyên çîrokê yê weke rûdaw û kesayetî û vegotin û dem û cih û hwd li xwe digre. Ev hemî jî di çarçoveya dinyaya zarokan de dicivin û bi awayeke bi bandor û gûncav di gel tiwan û heza zarokan de tîna pêşkêş kirin û li gor ziman û hiş û îdrak û mêjiyê zarokan tîna dariştin, bi armanca tîkelbûna li gel hest û hişê zarokan û bandor jê kirinê. Armanca wan hemîyan jê ev e ku çend demên xweş û bi cûş û bi sûd ji bo

¹²³ Mihemed Ferîq Hesên, "Mindal û Çîrok", *Raman*, J. 161, 2010, r. 131. Ew jî li: Mîrvet Muhemmed Kamil, *Medxel Îla Sehafet el-Etîfal*, ç.1, weş. Dar el-Fîkr el-'Erebî, el-Qahîre, 2003, r. 88.

¹²⁴ Yûsûf 'Ebdulqadir Resûl, "Cîhanî Taybet Be Mindal", *Raman*, J. 186, 2012, r. 160.

zarokan bê dabîn kirin; da ku ji aliyê derûnî û exlaqî û civakî û hişî pê bîn perwerde kirin.¹²⁵

Hevdem li gel guhertina cîhanê û hatina sedeyeke nû ku medya û derbazkirina demê zêde bûn e, hêş jî awata xelkî çîrok e. Îcar nivîskî bin an jî dîtînî, weke dramayên Tv û filmên sinemayî an jî bi rêya vegotinê, ne her weke xwe, Belkî ev meyl û hezkirine zêde jî bûye. Xelk li caran bi kelecantir çîrok û romanên dixwîne. Li berê zêdetir, bi vehesînên dirêjtir, li ber zincîre diramayan rûdinên, heya dawîya çîroka wênekirî diçîn, zarok jî wek mezinan, hêş zêdetir jî, awata guhgirtina çîrokan û vexwandina çîrokan dikin.

Çîrok û hîkayet geşedanê didin xeyala zarokan û berfirehtir dikin. Hemî dahênanekê jî pêdivî bi fireh bûna qada xeyalê yê hey. Ev cureyên zarokan balkêş dikin, ku ji bo her dahênanekê, zanistî an hunerî û wêjeyî, bingeh û palpiştin. Her wiha zarok ji guhgirtina çîrokê a'ciz nabe.¹²⁶

Çîrok li bal zarokan pir hezkirî ye û yek ji bingehên geşekirina fikr û hizrê ye. Zarok bixwe ji bihîstina çîrok û serpehatî û gotinên xweş sûtê digrin. Mirov bi giştî ji ber hebûna hizr û xeyalê, jîndareke pirsker e, bi taybet zarokên ku 3 heya 4 salî ne, tişî ne ji pirsan û gelek pirsan dipirsin ku dê û bav û kesên li derdorê jî nikarin bersiv bidin.¹²⁷

Meyl û arezûya zarokan ji bo cureyê çîrokê li gor temenê wan diguhere, Mihemed Rehîm Remezan li ser vê bawerîye ku “Ev çîrok û behs ji bo zarokan bi ser dikevin ku bi zimanê jîndaran bîn gotin an jî bîn nivîsandin. Ji ber ku zarok hez ji piraniya jîndaran dike paş ku tirsan vî ji wan nema, û hez dike wan bibîn e”.¹²⁸

Yek ji taybetmendiyan derûnî yên zarokan taybetmendiya wijdanî ye û ji ber vê taybetmendiye jî zarok di çîrokê de bi awayekê wijdanî beşdar dibe. Ev beşdariye jî pir bibandor dibe dema ku kesayetiyên di nav çîrokê de jîndar bin. Zarok wisa hizr dike û wisa jî hez dike ku dar û ber û jîndar biaxivin. Di wêjeya cîhanê de jî her jîndarekê cureyekê taybetmendiyan heye, weke mînak ruvî bi fêl û firtan navdar e û şêr şehenşahê ajalan e û hwd. Her wekî ku çîrok bandoreke mezin li ser aliyê derûnî

¹²⁵ Rizgar 'Ebidulqadr Se'îd, *Bînay Hunerîy Çîrokî Mindalan Le Çîrokekanî Govarî Heng (1993-2000)*, Teza Master, Kolêcî Ziman, Zankoy Selaheddîn, 2008, r. 28.

¹²⁶ Mihemed Ferîq Hesen, "Mindal û Çîrok", *Raman*, J. 161, 2010, r. 132-133.

¹²⁷ 'Elî Reza Mihemedînîjad, "Çon Be Witnewey Çîrok Felsefe Fêrî Mindalan Bîkeyin?", *Raman*, J. 208, 2014, r. 95.

¹²⁸ Mihemed Rehîm Remezan, *Mindal û Çîrokî Mindalan*, weş. Çapxaney Zankoy Selaheddîn, 1984, r. 8.

û perwerdehiya kesayeta zarok dike, bi heman awayî jî çîrok di mijara hînbûna ziman de roleke bi bandor digre.¹²⁹

2.2.1. Dîroka Peydabûna Çîroka Kurdî ya Zarokan

Destpêka peydabûna çîrok û wêjeya zarokan li destpêkê heya îro jî, ji aliyê Kurd û hemî netewên din yên gerdûnê li ser bingeha efsane û wêjeya neteweyî hatiye ava kirin. An ku nivîskarên wê mijarê berhemên efsanewî û netewî yên xwe kirine havênê dariştin û çêkirina ev wêjeya ku weke wêjeya zarokan hatiye binav kirin. Girîngtirînê wan mîratên wêjeyî yên netewî û efsaneyên ku bi vî awayî hatine nivîsandin û yekemînên wêjeya zarokan di piraniya welatên cîhanê de sûd jê girtibe, pêk tên ji hikayetên Pancatintra, koma çîrokên efsanewî yên Isop, hikayetên Kelîle û Dimne, çîrokên Hezar û Yek Şev û hwd.¹³⁰

Çîroka zarokan di wêjeya Kurdî de her wekî çîroka zarokan di wêjeya cîhanê de xwedî dîrokeke serbixwe ye ku weke dîroka çîroka zarokan di wêjeya Kurdî de tê nas kirin û bingeh û zemîna peydabûna vê jî vedigere folklorê. Ev folklor dewlemend ya Kurdî ku bingeh û binêşeya hemî cureyên wêjeyê yên wekî çîrok û helbest û wêjeya mezinan û zarokan e.

Di derheq diyarkirina çîroka yekemîn di wêjeya Kurdî de ya ku ji bo zarokan hatibe nivîsandin, lêkolîner Newzad Elî Ehmed li ser vê bawerî ye çîroka “Kelekok” a Îsa Elî ku bi zaraveya Kurmanciya jor sala 1354a hicrî li weşanxaneya “Zaraveyê Kurmancî” hatiye nivîsandin¹³¹ di wêjeya Kurdî de çîroka yekemîn ya zaroka ye. Ev jî ji ber vê çendê ku ev çîroke yek ji wan nivîsên Kurdî ye ku mijara vê li xeyala zarokan nêzîk e û zarok pir baş jê fêhm dike. Her wiha ew ajal û rehekên ku navê wan di çîrokê de hatiye, di dinyaya zarokan de hene û zarok di nava piraniya wan de jiyane dike. Her wiha dibêje ku em dikarin vê çîrokê weke cureyê çîroka kenok (Henekî, el-fukahe) destnîşan bikin.¹³²

¹²⁹ Bnr.: 1-Zeyto Şêxanî, "Saykolojiyay Çîrokekanî Dapîre", *Raman*, J. 107, 2006, r. 183.

2-'Usman Mihemed Hewramî, "Zimanî Mindal û Zimanî Nûsîn Bo Mindal", *Raman*, J. 109, 2006, r. 89-97.

¹³⁰ Hîmdadî Husên, *Derwazeyek Bo Rexiney Edebîyî Kurdî*, ç. 1, weş. Mukriyanî, 2007, r. 225.

¹³¹ Bnr.: Îsa 'Elî, *Çîrokî Kelebab*, (Wer.: Bo Ser Diyalêkta Kirmanciya Jêrî Giywî Mukriyanî), ç. 3, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr, 2582î Kurdî.

¹³² Newzad 'Elî Ehmed, *b.n.*, r. 41-44.

Her bi vî awayî û di heman lêkolînê de li ser vê bawerê ye ku li gor dîrokê çîroka duyem ya zarokan di wêjeya Kurdî de hatibe nivîsîn, çîroka “Xweşî û Tirşî” an “Bizinoke û Meroke”yê nivîskar û dîroknasê Kurd Huseyn Huznî Mukiryani ye (1893-1947)¹³³ ku sala 1926’ê her dîsa di weşanxaneyê Zarê kurmancî de hatiye weşandin. Ev çîroke jî çîrokeke folklorî ye û bi zimanê jîndaran ji bo zarokan hatiye nivîsandin, çîrok bi şêwaza hozanê gotûbêjeka di navbera gur û pez û bizinekê nişan dide. Diyare ku çîrok tijî ye ji şîret ji bo zarokan.¹³⁴

Berovajî baweriya berê lêkolîner Xalîde Qadir Ferec li ser vê bawerê ye ku çîroka “Kelekok”a çîrokeke xeyalî ye û zarok hez ji wan cureyê çîrokan dike, lê aqilê mirov qebûl nake ku kesek bixwaze bi dîkekê seyranê bike!? Ji ber vê jî çîroka Biznoke û Meroke ya Husên Huznî Mukiryani li gor naverokê, weke çîroka yekemîn ya zarokan tê destnîşan kirin, ji ber ku li sirûştê Kurdewarî nêzîke û duyem çîroka nivîskî ya zarokane û weke helbets hatiye honandin û di dawiya sedsala bîstan de hatîye belav kirin.¹³⁵

Dûrtir ji her du nerînên jorî, Heme Kerîm Hewramî dibêje ku wêjeya zarokan û bi taybet çîrokên zarokan li dehsalên çaran yê sedsala borî de derbazî Kurdistanê bu ye. Ev jî dema ku ji bo cara yekemîn li rojhilatê û li ser destê Refa'e Eltehtawî di sala 1879’yê de peyda bû paş vê çendê ku li ewropayê vejeriya ev şêwaza wêjeyê li Ewropayê ve anî Misrê, ev car her li vê derê de di nav welatên rojhilatê de belav bû.¹³⁶

Hewramî herdu çîrokên nivîskar Nûreddîn Zaza weke mînak digre ku li hejmarên 30 û 32 ya kovara Hawarê de ji bo zarokan nivîsandiye û belav kirî ye, ye yekemîn bi navê “Kurd Yekin” û ya duyem bi navê “Şêrê Teyn Ehmedê Xanî” her wiha dinvîse her du çîrok û bi taybet çîroka “Kurd Yekin” vê ji mirov dike ku bêjî: li destpêka dehsalên çîlê yê sedsala borî, berê binêşeya çîroka zarokên Kurd “Nureddîn Zaza”yê danaye, lê ji ber ku kovar di kuncêke tarî û dûrê Kurdistanê de hatiye weşandin û dereng gihîştîye destê xwendevanên xwe û xwendegêha Kurdî jî nebûye ku zû li dûv ev awayê wêjeyê biçe, ji ber vê jî çîrok her wiha di nava kovarê

¹³³ Husên huznî, *Sercemî Berhemî Husên Huznî* (Kokrdinewe û Leçapdan: Aras), b. I, ç. 1, weş. Aras, Hewlêr, 2007, r. 97-124.

¹³⁴ Newzad 'Elî Ehmed, *b.n.*, r. 44-45.

¹³⁵ Xalîde Qadir Ferec, *Çîrokî Mindalan Le Edebî Kurdîda 1970-1990*, ç. 1, weş. Çapxaney Şehab, Hewlêr, 2013, r. 41.

¹³⁶ Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 266.

de asêmayî mayne û kareke wisa di hizra zarokên Kurd de nekîrî ye û tu berhemên din li dûv xwe de neanîn e.¹³⁷

Di vir de ya ji bo me girîng ev e ku ji bilî diyarkirina her du çîrokên yekemîn yên zarokan, her wiha di herdukan de ajal û jîndar rola sereke dibînin, bi taybet di çîroka “Biznoke û Merokey” ya Huznî de. Anku herdu çîrokên “Kelekûk” û “Biznoke û Meroke”du çîrokên zarokan in û di dawiya dehsalên bîstan yên sedsala borî de hatne belavkirin, wate destpêka çîroka zarokan di wêjeya Kurdî ya taybet bi zarokan, ji cureya çîrokên ajal û jîndaran bûye.

2.2.2.Li Gor Naverokê Cureyên Çîrokên Zarokan

Di çîroka zarokan de naverok xwedî nirx û bihayeke girîng e. Pêwîste çîroknivîs li gor astên geşekirina zarokan, temenê wan, pêdivî û arzûyên wan, naveroka çîrokê binvîsîne. Ji bo diyarkirin û destnîşankirina cureyên çîroka zarokan li gor naverokê, nivîskar û lêkolînerên akademîk di warê wêjeya zarokan de bi çend şewazên cuda, cureyên çîrokê dabeş dikin. Weke mînak hin kes li ser vê bawerê ne ku pêwîste çîroka zarokan xwedî wan beşane be.¹³⁸

- 1.Çîroka Folklor
- 2.Çîroka Cin
- 3.Çîroka Xeyalî
- 4.Çîroka Ajal û Jîndaran
- 5.Çîroka Rûdaw
- 6.Çîroka Pêkenî (Tinaz)
- 7.Çîrokên Efsanewî
- 8.Çîrokên Cesaret (Dastan)
- 9.Çîroke Helbest

Lê belê, hin lêkolînerên din tenê wan çar beşên jêr ji bo çîrokan destnîşan dikin.¹³⁹

- 1.Serpêhatiyên Jîndaran
- 2.Babetên Komêdî (Pêkenî)
- 3.Babetên Dîrokî

¹³⁷ Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 267.

¹³⁸ Bnr.: Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 108.

¹³⁹ Bnr.: Xalîde Qadir Ferec, *b.n.*, r. 80-86.

4. Babetên Zansitî

Her wiha lêkolînerên din¹⁴⁰ li ser vê bingegehê ku çîroka zarokan li gor astên temenê zarok guhgirtin bi xwe dibîne û zarok di temenê 3'ê salîyê şûn de hêza guhgirtin û tamwergirtina wateya çîrokê peyda dike, li ser vê esasê jî cureyên çîroka zarokan li gor astên temenê zarok bi şêwaza jêr tê dabêş kirin.

Ji bo qonaxa yekem (3-6) salî, li ser vê bawerê ne ku ji bo wê qonaxa temenê zarok, ev cureyên çîrokan guncav in:

1. Çîroka jîndaran
2. Çîroka xeyalî
3. Çîroka rehekan
4. Çîrokên ne-jîndaran

Ji bo qonaxa duyemîn (6-9) salî, ji bo vê qonaxê jî ev cureyên jor yên çîrokê zêdetir guncav in:

1. Çîroka Xeyalî
2. Çîroka Jîndaran
3. Çîrokên Pêkenî
4. Çîrokên Dînî
5. Çîrokên Perwerde û Hînkari

Ji bo qonaxa sêyemîn (9-12) salî, cureyên çîrokên zarokan di vê qonaxê de li gor hez û pêwîstiya zarokan ji bo behs kirin û mijarên çîrokê ev e ne:

1. Çîroka Pehlewanîyê û Serpêhatiyan
2. Çîrokên Riyalîstî
3. Çîrokên Zanistî
4. Çîrokên Dînî
5. Çîrokên Dîrokî

Ji bo qonaxa çaremîn (12-15) salî, wisa hizir dikin ku herçiqas nikarin ku şêwazên çîroka guncav ji bo vê qonaxa temenê zarokan bê sînordar kirin, ev jî ji ber cihgirtina kesayetîya zarok di vê qonaxê de, lê dibe ku ev çend şêwaze bin:

- a. Çîroka Sersirûştî (Xariq)
- b. Çîroka Hezkirin û Sozdariyê
- c. Çîrokên Pehlewanî û Serpêhatiyan

¹⁴⁰ Bnr.: Rizgar 'Ebidulqadr Se'îd, *b.n.*, r. 53-66.

- d.Çîroka Folklorî
- e.Çîroka Zanistî
- f.Çîroka Dîrokî
- g.Çîroka Rastî
- h.Çîroka Dînî
- i.Çîroka Pêkenî
- j.Çîroka Efsanewî

Ji aliyê din, lêkolîner Razaw Reşîd dibêje tevî ku cureyên çîrokên zarokan li hêla naverokê ve xwedî hejmareke zêde ye, lê ev cureyên paş şoreşê (1991, başûrê Kurdistanê) di nav wêjeya Kurdî de hene eve ne.¹⁴¹

- 1.Çîroka Efsanewî
- 2.Çîroka Folklorî
- 3.Çîroka Ajalan
- 4.Çîroka Xeyalî
- 5.Çîroka Pehlewanî û Serpêhatî
- 6.Çîroka Realistî
- 7.Çîroka Dînî
- 8.Çîroka Zanistî
- 9.Çîroka Pêkenî
- 10.Çîroka Dîrokî

Her wiha lêkolîner Muhsîn 'Arif ji bo diyarkirina cureyên çîroka zarokan di destpêkê de di bin sernavê curên çîrokê di wêjeya zarokan de, çend cureyên çîrokê diyar dike her wekî ku dibêje: Di warê wêjeya zarokan de renge ev dabeşkirina jêr, li gel nûjenbûn û geşekirina wêjeya zarokan bikar be ev in (Çîrokên Efsanewî, Hikayetên Milî, Çîrokên Nû) ji vê çendê, wêjeya zarokan dabeş dibe.¹⁴²

- 1.Çîrokên Efsaneyî
- 2.Hikayetên Folklorî
- 3.Hikayetên Jîndaran
- 4.Hikayetên Pêkenok
- 5.Hikayetên Dêv û Dirincan
- 6.Hikayetên Pir û Pûç

¹⁴¹ Bnr.: Razaw Reşîd Sebrî, *b.n.*, r. 125-148.

¹⁴² Muhsîn 'Arif Salih, *Çîroka Zarokan Li Devera Behdînan 1980-2004*, ç. 1, weş. Spîrêz, 2007, r. 99.

Di dawiyê de car din bi ser navê çîrokên nû çend cureyên din ji çîrokan diyar dîke û dibêje di derbarê cureyên çîrokên nû di wêjeya zarokan de ev li ser wan beşan dabeş dibin.¹⁴³

- 1.Çîrokên Jîndaran
- 2.Çîrokên Dîrokî
- 3.Çîrokên Xeyala Zanistî
- 4.Çîrokên Pêkenok
- 5.Çîrokên Qehremanî
- 6.Çîrokên Ne-jîndaran

2.3.ÇÎROKA AJALAN

Çavkaniya herî dewlemend ya wêjeya zarokane û zarok bi awayeke giştî jê hez dîkin. Ev jî ji ber vê çendê ye ku xwe di nav kesayetiyên wan cureyên çîrokan de dibînin û hevaltî û hevrêtiyê bi wan re girê didin û têkeliya wijdanî li gel wan çê dîkin, her wiha ji ber ku têkeliyên civakî yên zarokan pir sînordar in û tenê di çarçoveya malbat û cîranan de ye, jîndarên nava çîrokan de vê kêma ezmûnî û neşarezatiya zarok tezmîn dîkin û jê re tamam dîkin.¹⁴⁴

Kevintirîn awayê çîrokê ye ku zarokan sûd jê girtiye û jê nêzik bûn e. Zarok pir bi şewiq guh ji vê awayê çîrokan digrin û hezdîkin çîrok bi dawî nehê û hin caran jî daxwaza dubare kirina wan dîkin. Pir caran jî paş bi dawî hatina çîrokê zarok dest bi pirsan dîkin, ev jî di xwe de qadeke perwerdê ye.¹⁴⁵

Cihgirtina wêneyê ajal di nava çîrokan de cuda û cur bi cur e:

- Hin caran dibe weke hevlekê alîkar an jî dijminê mirov.
- Hin caran kar û kiryarên rasteqîn dibe weke xwedîkirina pisîkê ji bo fêrxên xwe û çêkirina hêlînê ji aliyê çivîkê ji bo xwe.
- An jî kiryarên vê xeyalî ne weke ku şêr dibe padşayê daristanê û rovî rola dekbaz digre.¹⁴⁶

Dikarîn cureyê ajalên nava çîrokan bi awayê jêr dabeş bikin:

- Teyr û Terewîl

¹⁴³ Muhsîn 'Arif Salih, *b.n.*, r. 107.

¹⁴⁴ Muhemmed el-Seyd Helawe, *b.n.*, r. 88.

¹⁴⁵ Xalîde Qadir Ferec, *b.n.*, r. 80-81.

¹⁴⁶ Muhemmed el-Seyd Helawe, *b.n.*, r. 88.

- Ajalên Kedi
- Ajalên Dirinde û Kûvî
- Marmarkî (xişok)
- Ajalên Avî
- Bihuk û Heşere

2.3.1.Navên Têgeha Çîroka Ajalan

Bi geryan û balkişandina ser piraniye nivîsîn û lêkolînên taybet bi wêjeya zarokan û di nav de jî cureya çîroka ajalan, li van behs û pênaseyên nivîskar û lêkolîneran, dibe amajê bi çend hêlên girîng bikin ku dibin e cihê balkişandina me.

-Piraniya nivîskaran li ser esasê çavkaniyên biyanî û bi taybet çavkaniyên 'Erebî, çend pênaseyên cur bi cur ji bo çîroka ajalan pêşkêş kirine, bi awayekê ku cureyekê tevliheviyê çêbûye.

-Lêkolîneran di pêşkêşkirina lêkolînên xwe de, çî di warê wêjeya folklore û çî di derbarê wêjeya nivîskî de, çend navkirinên cuda bi kar anîne û her lêkolînerê bi awayekê nav li ser vê janira wêjeyî anîye, weke mînak hemî ev nav ji bo têgeha çîroka ajalan hatine bikar anîn:

- 1.Çîrok û Hekiyatêd Derheq Heywanan, Teyr û Terawalan¹⁴⁷
- 2.Çîrok Derbarey Giyanewer û Balinde¹⁴⁸
- 3.Hîkayetî Giyandaran¹⁴⁹
- 4.Hîkayetî Giyanleberan¹⁵⁰
- 5.Hîkayetî Ajelan¹⁵¹
- 6.Heqayetî Giyandaran¹⁵²
- 7.Çîrokî Ajelan û Caneweran¹⁵³
- 8.Çîrokî Ser Zarî Ajelan¹⁵⁴
- 9.Beserhatî Giyanleberan¹⁵⁵

¹⁴⁷ Qenatê Kurdo, Li Pirtûka xwe de bi kar anîye, ji bo vê jî bnr.: Qenatî Kurdo (Kurdoyêv), *Komele Têksitî Folklorî Kurdî*, weş. Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 1976, r. 18.

¹⁴⁸ Şukriye Resul, *Edebî Folklorîyê Kurdî - Beşî Duwem*, r. 178.

¹⁴⁹ Bnr.: 1-Şukriye Resul, *Hîkayetî Folklorîyê Giyandaran*, r. 13.

2-Nahîde Ehmed, *b.n.*, r. 36.

¹⁵⁰ Şukriye Resul, *h.b.n.*, r. 20.

¹⁵¹ Şukriye Resul, *h.b.*, r. 15.

¹⁵² Îzop, *Çîrokekanî Îzop Yan Lenaw Giyandaran Da*, (Wer.: 'Ezîz Gerdî), r. 3.

¹⁵³ Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 122.

¹⁵⁴ Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 126.

- 10.Çîrokî Giyanleberan¹⁵⁶
- 11.Efsaney Giyanleberan¹⁵⁷
- 12.Çîrokên Ajalan (Fabl, Cefen)¹⁵⁸
- 13.Hikayetên Giyaneweran¹⁵⁹
- 14.Çîrokên Giyaneweran¹⁶⁰
- 15.Çîrokî Ajelan¹⁶¹

-Hin ji lêkolîneran çîroka nejîndar û çîroka rehekan li çîroka ajalan cuda kirî ye bi awayeke serbixwe pênaseya wan kirine, hin yê din jî ne li gel çîroka ajalan û ne jî bi awayeke serbixwe behs ji çîroka nejîndar û rehekan nekirine.

-Hin lêkolîner di behskirinên xwe de amaje bi vê çendê kirine ku armanca wan tenê ajal e ne balinde û teyr, wate teyr jî weke beşeke serbixwe danane û cuda kirine.¹⁶²

-Lêkolîner jî hey ji bo çîroka dastan peyva Fables dana ye!¹⁶³

-Wergêrên din ji bo Fable peyva efsane dana ye, wekî wergerê pirtûka “The Kurdish Fable” yê rojhilatnasê Rûs Margirîr Rodînkô (1930-1976) bi sernavê “Efsaneyên Kurdî” bi zimanê Kurdî wergerandiye.¹⁶⁴

Bi nerîna me, guncavtirîn nasandina çîroka ajalan weke têgehek, pêk tê ji ev raveya Dr. Celal Enwer Se’îd amaje pê kiriye:

“Di zimanê inglîzî de ev awayê çîrokê weke (Fable) tê binav kirin, di esasê xwe de li peyva latînî ya (Fabula) hatiye girtin. Ev peyve jî di destpêkê de amaje buye ji bo van peyvîn û hîkeyetên rengereng û cuda ku pûç û bêşûd bûne, paşê jî weke têgehekê cihê xwe vekiriye û pêk tê ji wan çîrokên ku lehengên wan ajal yan jî her tişt û nejîndareke din an jî mirov in. Wate di (Fable) de leheng û karakter tenê ajal nîne, Belkî dar û tiştên bê giyan jî dibin leheng, ev jî tê wê wateyê ku çîroka ajalan parçeyek e ji (Fable), lê ji ber ajal û çîroka ajalan qadeke berfireh jê digre, ji

¹⁵⁵ Xalîde Qadir Ferec, *b.n.*, r. 80.

¹⁵⁶ Rizgar 'Ebidulqadr Se'îd, *b.n.*, r. 54.

¹⁵⁷ Mewlud Îbrahîm Hesên, *b.n.*, r. 27.

¹⁵⁸ Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, ç. 1, weş. Doz, Istanbul, 2009, r. 94.

¹⁵⁹ Muhsîn 'Arif Salih, *b.n.*, r. 102.

¹⁶⁰ *H.b.*, r. 107.

¹⁶¹ Bnr.: 1-Newzad 'Elî Ehmed, *b.n.*, r. 49.

2-Razaw Reşîd Sebrî, *h.b.*, r. 132.

¹⁶² Bnr.: Newzad 'Elî Ehmed, *b.n.*, r. 63.

¹⁶³ Bnr. Xalîde Qadir Ferec, *b.n.*, r. 67.

¹⁶⁴ M. B. Rodînkô, *Efsane Kurdîyekan*, (Wer.: Kerîmî Hisamî), Stokholm, 1999.

ber vê jî ev tişte di mêjîyê xwendevanan de cih girtiye ku mebest li (Fable) ê çîroka ajalane”.¹⁶⁵

2.3.2. Pênaseyên Çîroka Ajalan

Gelek Pênaseyê cur bi cur ji bo nasîna çîrokên ajalan hatin e kirin, ji bo mînakê weke "Çîrokên ajalan ev çîrokin ku bi zimanê ajalan û jîndaran tînen vegotin. Wate cîhana nav çîrokê tenê ev ajal û dirinde û ev jîndarin bi mirovan re jîyan kirine an jî jê tirsîyan e, ev cureyê çîrokan li bal zarok û mezînan jî pir bi tam û dilhez bi hestî, ji ber ku zarokan bi awayeke hêsanî ber bi aliyê xwe we radikişî û bi hêsanî dikarin reftara wan ajalên ku di nava wê cîhanê xeyalî de hene texlîd bikin".¹⁶⁶

Her wiha pênasên din jî weke dibêje "Ev çîroke ku jîndar tî de rola sereke dibîne û ji bûyere hêsan pêk tî an jî çendî rûdanên ku serborî û îbret û armanc tîde hebe û bi taybet dawîya wê ku armanceke diyarkirî hebe. Di dema nivîsandina çîrokê de nivîskar hewl dide ku ji bo hîlbijartina kesayetiyên çîrokê wan jîndaran hîlbijêre ku nêzîk in ji jîngeha zarokan an li def wan nasiyar bin, weke şêr, pîling, rûvî, se, pisîk, keroşk, simbore û hwd".¹⁶⁷

Em jî dikarin pênaseyê wiha bikin ku "çîroka ajalên an fabl ev çîrokin ku tîde hemî cureyên ajalên kedî û kûvî, teyr, ajalên avî, marmarkî, bihuk û heşere, her wiha nejîndar, rehek û tiştên din yê sirûştê dibin leheng û roleke serek tîde digrin, weke mirovan di axivî û gotûbêjê dikin. Naverokê çîrokê jî bi awayeke balkêş şîret û peyameke pewerdehî, exlaqî ji bo zarokan digre xwe û çêjeke pir xweş jî dide wan".

2.3.3. Li Gor Qonaxên Temenê Zarokan de Cihê Çîroka Ajalan

Zarokî asta yekem yê temenê mirov e. Ji dêbûnê destpê dibe û bi gihîştîne (balixbûn)ê bi dawî tî. Xwedayê teala li Qurana pîroz di çend ayetan de behs ji zarokan dike weke dibêje: (إِذَا بَلَغَ الْأَطْفَالُ مِنْكُمُ الْحُلُمَ فَلْيَسْتَأْذِنُوا كَمَا اسْتَأْذَنَ الَّذِينَ مِنْ قَبْلِهِمْ).¹⁶⁸ Wate "Dema zarokên we balix bûn, bila ew jî (ji bo werin cem we) destûrê bixwazin, ka çawa yê berî wan destûr xwestine". Her wiha dibêje: (ثُمَّ نُخْرِجُكُمْ طِفْلًا ثُمَّ)

¹⁶⁵ Celal Enwer Se'îd, *Govarî Zankoy Koye*, J. 39, 2016, r. 114.

¹⁶⁶ Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 122.

¹⁶⁷ Muhsîn 'Arîf Salih, *b.n.*, r. 107.

¹⁶⁸ Sûreyê Nûr, ayeta 59.

(لَتَبْلُغُوا أَشَدَّكُمْ).¹⁶⁹ wate "Paşê em ê we zarok (ji zike dayîkên we) derbixin. Piştê hûnê bigihîjin çaxê xurtiya xwe".

Qonaxa zaroktiyê qonaxa herî girîng ya jiyana mirov e û li hemiyana bi talûke tir e. Ev qonaxe bi çendin sîfet û taybetmendî û amadekariyan ji qonaxên din tê cuda kirin û dibe bingeha qonaxên din yê jiyana mirov. Her di qonaxa zarokî de behre û şeyanên mirovan diyar dibin û hest û awatên zarokan geşe dikin. Kesayetiya wî çê dibe da ku di dawiyê de bi vê kesayetiye ji kesayetiye din bê cuda kirin. Gelek lêkolîn di mijarên derûnasî û perwerdê de, amajê bi wê çendê dikin ku rêjeyeke mezin ji bingehên merîfeti û wijdanî û reftariya kesayeta her kesekê, di 5 salên destpêkê de sax dibin.¹⁷⁰

Di bin ronahiya lêkolînan taybet bi geşekirina zarokan de, zanayên derûnasî û pisporên warê perwerdeyê, ji bo qonaxên geşekirina zarokan gelek dabeşkarî pêşkêş kirine. Her yek ji wan qonaxan jî xwedî taybetmendiye diyarkirî ne û zarokan ji hêla derûnî bi giştî û ji hêla eqlî û wijdanî bi taybetî li hevdu cuda dike. Ev dabeşkirina zana û şareza û pisporan amajê bi taybetmendiye jiyana zarokatiyê di qonaxên cur bi cur yê geşekirinê dike, ku ev jî alîkariyê dide naskirina meyl û hez û arezûyên zarokan ji bo cureyê çîrokê ev jî li gor salên temenê wan.¹⁷¹

Lêkolînerê ereb Ehmed Necîb li ser vê bawerê yê ku tevî hebûna wan bandorên jêr lê ev li hemberî girîng nasîna qonaxên geşeya zarokan û taybetmendiye wan nabine rêgir, ji ber vê çendê jî dabeşkirina qonaxên temenê zarokan di mijara nivîsandina ji bo zarokan rênîşanderekê pir bi sîde:

-Di helwest nebûna tam ya derûnnasan li ser yek şewazeke dabeşkirinê û lihevnekirina li ser mijara destpêk û dawiya qonaxan.

-Tevliheviya dem û zamanê qonaxan û cudayî ji hêla regezê nêr û mê, her wiha cudayîya di nava gel û kesan de.

-Arezûya zarokan ji bo cureyê diyarkirî yê çîrokê ku ji bo qonaxeke diyarkirî guncav e, li gel bidawîhatina qonaxa hanê bi dawî nabe û renga di qonaxên bèn de jî berdewam bin.

¹⁶⁹ Sûreyê Hec, ayeta 5.

¹⁷⁰ Mihemed Hesen Birîxiş, *Edeb el-Ûfal Ehdafîhî We Sîmatîhî*, ç. 2, weş. Miweset el-Risale, Beyrut, 1996, r. 13-14.

¹⁷¹ Ehmed Necîb, *Edeb el-Ûfal (Ûlim Wefen)*, ç. 1, Dar el-Fikr el-'Erebî, el-Qahîre, 1991, r. 37.

-Lêkolînên girêdayî mijara geşeya zarokan yê ku ji ber destê me ne ev in ku berhemên zanayên biyanîne û li sirûşteke civakî û çandî yê ku cudaye li gel sirûştê me û ji bo zarokên cuda li gel zarokên me hatiye encamdan.

-Pêşveçûna şaristaniya hevdem û pêşveçûnên mezin yên teknolojiyê, medya bi giştî û bi taybetî TV, hemî dibine sedem ku zarok di nava qonaxên xwe yên geşekirinê de derbaz nebe.¹⁷²

Me got ku zarok arezûdarê çîrokên jîndaran e û pir hez ji ev awayê çîrokê dikin, ezmûn û ceribandîna amarî piştrast dikin ku zarokên di bin temenê deh saliyê de zêdetir pêşwaziyê ji çîrokên jîndaran dikin di danberheva li gel çîrokên pêkenî û dîrokî ku weke mînak bîna berçavgirtin. Dibe ku çîroka jîndaran cureyê herî kevin yê çîroka zarokan be.¹⁷³

Zarok paş bidawî hatina temenê 3ê saliyê, dibe xwedî wê hêzê ku çîrok jê re bê amade kirin. Ev qonaxe destpêkeke girîng yê zarokan e, ji ber ku di vir de zarok hest bi hebûn û kesayetîya xwe dike. Dinyaya zarok di qonaxa (3-5) saliyê de pir teng e û ji bav û dê, bira û xwişk, hin ji eqrîba û cîranan pêk tê, her wiha ev bûkelika pê dilîz e û ev ajalên pê dilîz e. Di vê qonaxê de xeyal û hizra zarok pir tûj e. Wisa hizr dike ku bûkelik mirov e an jî jîndar e û pê re dipeyve. Zarok di vê qonaxê de guh dide çîrokê û paşê dikare vebêje jî, xeyala zarokî ev çîrok in ku lehengên wan li ajal û rehek û nejjîndar û mirovan pêk tên. Ji ber ku zarok wisa hizr dike nejjîndar jî di axivîn û gotûbêjê dikin. Balê dikşîne ser cureyên dar, pez, bizin, pisîk û jîndarên din ku li kêleka wî ne û wan dibîne.¹⁷⁴

Her wekî tê zanîn zarok ji hêla laş û aqil û sozdariyê ve ji çend qonaxên cuda de derbaz dibe, zanayên derûnnasî û pisporên geşe û perwerdeya zarokan bi çend şewazên cuda geşekirina temenê zarokan diyar kirine weke mînak:

- 1.Qonaxa zaroktiyê (3-5) salî
- 2.Qonaxa zaroktiyê (5-8) salî
- 3.Qonaxa zaroktiyê (8-12) salî
- 4.Qonaxa nûciwaniyê (13-19) salî
- 5.Qonaxa nimûneyî ya bilind (paş 19) saliyê.¹⁷⁵

¹⁷² Bnr.: Ehmed Necîb, *b.n.*, r. 37-38.

¹⁷³ Muhemmed el-Seyd Helawe, *b.n.*, r. 88.

¹⁷⁴ Mihemed Rehîm Remezan, *b.n.*, r. 21.

¹⁷⁵ 'Ebdulfetah Ebume'al, *Edeb el-Ëtîfal (Weesalîb Terbiyethîm Wete'lîmihîm Wetesqîfihîm)*, ç. 1, weş. Dar el-Şîruq, Emman, 2005, r. 52-53.

An jî dabeşkirineke din ji bo temenê zarokan heye ku ev jî bi vî awayî ye:

A. Qonaxa zaroktiya zû (3-5) salî, her wiha weke qonaxa rasteqîne û xeyalî sînordar bi jîngehê jî tê binav kirin.

B. Qonaxa zaroktiya navîn (6-8) Salî, an jî qonaxa hizra serbest.

C. Qonaxa zaroktiya dereng, an jî qonaxa serpêhatî û lehengiyê (9-12) salî.

D. Qonaxa hişyariya seksî (12-18) salî.

E. Qonaxa nimûneyî ya bilind (paş 18 saliyê).¹⁷⁶

Lêkolînerên Kurd jî li ser esasê çavkaniyên biyanî û bitaybet çavkaniyên 'Erebî, temenê zarokan li ser çend qonaxan de dabeş dikin, weke mînak:

1. Qonaxa hizr û xeyal nazikî ku sala 3-5'ê ye.

2. Qonaxa berfirehiya xeyalê ku 6-8 salî ye.

3. Qonaxa lehengiyê lu 9-12 salî ye.¹⁷⁷

Di vê qonaxê de ku weke qonaxa hizr û xeyal tengiyê tê naskirin (3-5 salî), zarok bihîstina çîrokê hez dike û bi taybet ev çîrokên xeyalî ku bi zimanê jîndar û balideyan ji bo wan tînin gotin. Ji ber vê çendê jî pêwîste çîrok bi zimanê wan jîndar û ajalan be ku zarok jê natirse û wan nas dike. Weke kevok û kev û se û pisîk û meymûn û hesp û mahîn û pez û bizin û ker û dar û dirext, di dema axvîna xwe de (Pez bi zimanê xwe û bizin jî bi zimanê xwe) biaxivin.¹⁷⁸

Di qonaxa duyemîn jî de ku weke qonaxa berfirehiya xeyalê 6-8 salî tînin naskirin, zarok hêj xwedî hezeweriya bihîstina çîroka ajalan e. Lê di danûstana xwe ya bi ajalan û nejiindaran re ji xeyala wehmî dîr dibe û li dewsa wê çendê ku weke berê kopal weke hesp bizane û siwar be, hez dike ku bi rastî siwar hespê rasteqîn be.¹⁷⁹

Nîvê pirsên zarokan di derbarê ajal û sirûşt e û li bal zarokan çîrokên ajalan xwedî navdariyeke mezin in. Ev e ji bilî vê çendê ye ku nivîskaran hewl daye ev cureyê çîrokê li hizrê dîr bikin û şîretên sincî tê de tetbîq bikin û cilên mirovan bikin e ber ajalan. An ku zarok bi taybet heya nêzik 10 saliyê li çîroka ajal hez dike û dibe ku rewaca berfireh ya zincîre kartonên (Walt Disney) û lehengê wê (Mickey Mouse)

¹⁷⁶ Ehmed Necîb, *b.n.*, r. 38-44.

¹⁷⁷ Bnr.: Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 56.

¹⁷⁸ Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 58.

¹⁷⁹ Bnr.: 1-Heme Kerîm Hewramî, *b.n.*, r. 59.

2-Ehmed Necîb, *b.n.*, r. 40-41.

balgeyeke baş be di wê derbarê de.¹⁸⁰ Ev tiştê ku di wir de ji bo lêkolîner girîng û cihê amajê ye ev e ku li gor encama lêkolînan, zarok li du qonaxên yekem yê temenê xwe de û heya nêzîk temenê deh salî yê, li cureyên din yên çîroka zarokan, zêdetir ji çîroka ajal û nejnîndaran hez dike.¹⁸¹



¹⁸⁰ Yusif Hesên Nufîl, *el-Qise Weseqafet el-Tifl*, weş. el-Heyae el-Mesriye el-'Ame Lilkitab, 1999, r. 55.

¹⁸¹ Arnold Geseld, *el-Tifl Min el-Xamise Îla el-'Aşire*, b. I, (Wer.: 'Ebidul'ezîz Tewfîq Cawîd), weş. el-Heyae el-Mesriye el-'Ame Lilkitab, 1995, r. 94, 236.

BEŞA SÊYEM

3. DÎ ROJNAMEGERÎYA ZAROKAN DE GEŞEDANA ÇÎROKÊN ZAROKAN

3.1. ROJNAMEGERÎYA ZAROKAN

Ronakbîrên Kurd di zû de girîngî daye zarokê, ji destpêka peydabûna nivîsandina bi Kurdî, nivîskar û hozanvanên Kurd berhemên taybet pêşkêşî zarokan kirine. Di dîroka gelê Kurd ya nû û hevdem li gel derketina rojnameya Kurdî ya yekemîn, girîngî bi zarokan jî hatiye dayîn û jê re nivîsandin e, lê ji ber asêmayîna rewşa siyasî ya gelê Kurd û nebûna serxwebûnê, rojname û kovar ên zarokan bi muqayese di gel rojnamegeriya mezinan dereng ketiye.

Dinyaya rojnamegeriya zarokan dinyayeke rengîn e û komek ji bingeh û yasayên cur bi cur li xwe digre, ku pêwîste hewşan û gûncav bin li gel wan armanc û payamên perwerdekariyê ku tê de hene. Rojnamegeriya zarokan taybet bi zarok e û ji bo rêberî û hînkariya zarokan tê bikaranîn. Ev jî ji bilî derbazkirina demê û geşekirina awata xwandina zarokan e.

Ji ber ku zarok xwedî dinyayek taybet û nazik û bi hest e, ji hêla temenê xwe jî ji çend qonaxan derbaz dibe. Ji ber vê çendê jî pêwîste rojnamegeriya zarokan ji hêla şêwaz û naverokê ve li gor hêza laşî û eqlî û civakî û derûniya zarok be, li gor temenê wî be. Weke mînak di temenê 3-5 saliyê de pêwîste ku mijar, mijarên wênekî û hêsan û rengîn bin, çîrok û gotûbêjek sade li xwe bigre. Di temenê 6 heya 12 saliyê de jî pêwîste girîngî bi wêne û nivîsandinê bê dayîn û hwd. Ev jî tê wê wateyê ku bi awayekî giştî di rojnamegeriya zarokan de pêwîste ku hîlbijartina mijar û berhemên li gor asta temen û tama zarokan û li gor dinyaya rengîn û derûna wan be.¹⁸²

Nivîskarê navdar yê rojnamegeriya zarokan, Heme Salih Ferhadî li ser vê bawerîye ku herçiqas “Armanca kovara zarokan rêberî kirina zarokane, ev jî ji ber pêrewkirina wan nirxan ku bûne bingeha nivîsandina ji bo zarokan û yên bi awayeke tam derbazî nava vê mijarê bûne û tetbîq dikin. Lê yên tenê ji bo cihtijî kirin an jî

¹⁸² Cewad Hemed Beg Salih, "Rojnamenûsîy Mindalan Le Başûrî Kurdistanda", *Raman*, J. 187, 2012, r. 123-124.

nanpeydakirinê xwe xişandiyê nava ev pêşeyê, guh nadin wan nirxan an jî bi rastî nanasin”¹⁸³.

Her wiha Ferhadî dibêje "Girifta xwandinê bi awayeke berfireh di nava me de heye û kêr malbat bi awayeke pêwîst kovar û belavokan ji bo zarokên xwe dabîn dikin, bi taybet gelek malbat hene ji bilî kovaran dixwazin pir tiştan ji bo zarokên xwe bikirin. Ev jî di demekê de ev kovar baştirîn xwarinê hizr û hişê wan e."¹⁸⁴

Ger dîroka peydabûna rojnamegeriya bi zimanê Kurdî bê mêze kirin, tê dîtin hevdem li gel derketina yekem rojnameya Kurdî bi sernavê "Kurdistan"ê di sala 1898ê zayînê. û xwedêyî wê rojnamê "Mîqdad Mîdhed Bedirxan" armanca wî di hejmarên destpêkê de zelal kiriye û amaje bi vê çendê kiriye ku zainst û zaniyariyên zêde ji Kurda re gereke. Ji ber vê jî zarok û gencên Kurd han dide ji bo ku biçin mektebê û ji dê û bav û mezinên zarokan dixwaze û wan hişyar dike ku pêwîste di derfeta herî nêz de zarok dest bi xwandinê bikin ji bo ku di dema mezin bûnê de kesek bi bandor û kêrhatî be. Bi taybet di serdema wî de gelê Kurd gelek pêwîstî bi neviyeke pêşketî û hişyar hebû.¹⁸⁵

Li gor lêkolînan, kovara yekemîn ya Kurdî ku çîrokên zarokan tê de belav bûn e û ji bo cara yekemîn di pêşveçûna çîroka zarokan de xwedî rol bûye, kovara "Zarî Kurmancî" ye. Ev kovare di salên 1925-1932 de li Rewanduzê û ji aliyê Huseyn Huznî Mukiryani ve hatiye weşandin û pir caran ji bo zarokan babet weşandin e. Çîroka yekemîn ya zarokan jî her di vê kovarê de belav bûye.¹⁸⁶

Kovara Hawarê jî ku di nava salên (1932-1943)yê de derketiye, kovara duyemîn e ya Kurdî ye ku çîrokên zarokan têde hatine weşandin û di pêşvebirina çîroka zarokan di wêjeya Kurdî de bandora xwe hebûye. Hin ji çîrokên kovara hawarê hunerîne û asta huneriya wan bilinde û di rêza yekemîn ya çîrokên hunerî de ne, hin yên din jî sîmaya hîkayetên folklorîk li xwe digrin û yên din jî bi zimanê jîndaran an ku "Fable" hatîne nivîsandin. Diyar e ku lehengê wan cureyên çîrokan

¹⁸³ Bnr.: Heme Salih Ferhadî, "Çend Berbestêk Leberdem Geşekrdinî Rojnamenûsiy Mindalanda", *Raman*, J. 161, 2010, r. 160.

¹⁸⁴ *Raman*, J. 161, 2010, r. 160.

¹⁸⁵ Îdrîs 'Ebdula Mistefa, *Rojnamegerîy Mindalan Be Zimanî Kurdî*, ç. 1, Berêweberayeti Çapxaney Roşinbîrî, Hewlêr, 2004, r. 26-27.

¹⁸⁶ Îdrîs 'Ebdula Mistefa, *b.n.*, r. 46.

ajal in û bêhtir li gor sirûştê derûnî ya zarokan in. Ji ber wê jî ev awayê çîrokan di çarçoveya çîrokên zarokan de cih digrin.¹⁸⁷

Paşî vê kovarê jî kovara Gelawêjê di nava salên 1939-1949 de bi weşandina gelek çîrokan bi taybet ji aliyê nivîskarên weke 'Elaidîn Seccadî roleke berçav di geşekirina çîroka zarokan hebû û ji cureyê çîroka ajalan ku babeta piraniya wan ji folklorê hatibûn wergirtin û ji bo armanca perwerdeya zarokan hatibûn pêşkêş kirin.¹⁸⁸

Di dema avakirina komara Kurdistanê sala 1946'ê li Mihabadê karmendên weşanxaneya Kurdistanê ji bo cara yekemîn di dîroka rojnamegeriya Kurdî de kovarek taybet bi zarokan bi sernavê (Grugalî Mindalanî Kurd) weşandin. Di sala 1972'yê de û li bajarê Silêmaniyê, komeleya ronakbîrên Kurd weke paşkoyê kovara "Rojî Kurdistan", kovareke taybet bi zarokan bi sernavê "Estêre" weşandin. Ev kovar jî weke kovara yekemîn ya zarokan bi zimanê Kurdî û li başûrê Kurdistanê tê binav kirin.¹⁸⁹

Li ser vê esasê jî rojnamegeriya Kurdî (peydabûna weşan û weşangerî û kovar û rojnamevaniyê) bandoreke xurt hebûye di peydabûn û geşeya çîroka Kurdî ya hunerî bi awayeke giştî û çîroka zarokan bi awayeke taybet. Li Kurdistanê li derketina kovara (Grugalî Mindalanî Kurd) heya niha gelek kovarên baş yên zarokan hatîne weşandin û belav kirin, hin ji wan heya îro jî berdewam dikin.¹⁹⁰ Weke mînak yek ji wan kovarên girîng yên zarokan li başûrê Kurdistanê, kovara Heng e ku di navbera salên 1993 heya 2011 de bi derxistina 174 hezmaran, rolek mezin di pêşvebirna çîroka zarokan hebû û bi sedan çîrokên ajalan ji bo zarokan têde hatine weşandin.

3.2.KOVARÊN ZAROKAN

Kovara zarokan koma mijarên cûrbicûr yên taybet bi zarokan e, bi awayekê rêzeyî û di dem û cihên diyarkirî de ji aliyê sazî an komele û komekê ve derdikeve.

¹⁸⁷ 'Ebdulsemed Îslam Tehe, *Rengdanewey Edeb Le Govarî Hawarda*, ç. 1, weş. Aras, 2002, r. 115,128.

¹⁸⁸ Rizgar 'Ebidulqadr Se'îd, *b.n.*, r. 19.

¹⁸⁹ Cewad Hemed Beg Salih, "Rojnamenûsîy Mindalan Le Başûrî Kurdistanê", *Raman*, J. 187, 2012, r. 125.

¹⁹⁰ Ji bo bêtir agahîya li ser kovarên zarokan bnr.: Heme Salih Ferhadî, *Lebarey Rojnamenûsîy Kurdîyewe*, ç. 1, weş. Mukriyanî, 2011, r. 28-37.

Yek ji mijarên girîng yê ku di nav kovarên zarokan de tê weşandin, çîrokên zarokan bi hemî awayên xwe ye. Piraniya çîrokên ku di lapereyên kovarên zarokan de belav dibin li ser wan cureyan tîr dabeş kirin:

- 1.Çîroka avakirî (ji aliyê nivîskarên xwemalî ve).
- 2.Çîroka ku li ser esasê folklorê hatiye amade kirin.
- 3.Çîroka ku ji zimanên biyanî ve hatiye wergerandin.
- 4.Çîroka senaryo (ku têda wêne parçeyeke vegotinên çîrokê ye).

Eşkere ye kovara zarokan di gelek hêlan de cudaye li gel kovara mezinan. Kovara zarokan xwedî gelek taybetmendiyan cur bi cur e û kovar bêtî hebûna wan taybetmendiyan nikare bi ser bikeve û xizmeteke gûncav pêşkêş zarokan bike. Li ser vê esasê jî Heme Salih Ferhadî, çend taybetmendiyan nirxdar yê kovara zarokan destnîşan dike, em ji ber girîngiya wan dê di vir de amajê pê bikin, ev jî ev in:

A.Pêwîste zarok di dema lêmêze kirna kovarê de, hestek wisa li bal wî/wê saz bibe ku kovarê weke yê xwe bizan be.

B.Mijarên kovarê ji hêla kiçe û mezintiya tîpan li gor qonaxa temenê zarok be.

C.Ger îmkan hebe, ji bo temenek diyarkir yê zarokan be.

D.Di nav mijaran de wêneyên rind û rengreng hebe.

E.Mijarên kovarê cur bi cur bin û tenê di bîrdozeke diyarkirî de sînardar nemîne, anku armanca kovarê ev nebe nerîneke teng û hizbî li ser zarok ferz bike.

F.Nirxê vê gûncav be û bi awayeke hêsan bigihije destê zarokan.

G.Her wiha pêwîste zimanê kovarê hêsan be û biwêjên vê di ferhenga zarokan de hatibin, ji ber ku ger nivîsîn bi zimanê hêsan be, kêmasiyên babetê vedişêre û zarok bêhtir hewla xwandinê dide. Berovajî jî zimanê negûncav zarokan dixê tengezariyê û bitaybet pir caran perîşan jî dike, mixabin ev tişt di gelek belavokên zarokan de diyar e û hest pê tê kirin.¹⁹¹

Li başûrê Kurdistanê bi taybet paş peydabûna sala 1992'yê heya îro rêjeyek baş ji kovarên zarokan hatine weşandin, di naveroka wan kovara û her wiha di rojname û kovarên giştî de jî, gelek mijarên cur bi cur yê taybet bi zarokan weke

¹⁹¹ Heme Salih Ferhadî, *Lebarey Rojnamenûsîyê Kurdîyewe*, r. 27-28, her wiha bnr. *Raman*, J. 161, 2010, r. 160.

çîrok û hozan û şanogerî hebûn, Lê çîroka zarokan hertim di nava babetan de piraniya lapereyên kovaran dagîr kiriye.

Dikarîn ji bo navbirina hin ji girîngtirînê wan kovarên ku bi salan xizmeta zarokên Kurd kirine û hin ji wan heya îro jî berdewam in, amajê bi navê wan bikin weke mînak kovarên Pepûle, Cigergoşekan, Sivore, Kepir, Xende, Minalanî Babegurgur, Kolare, Mêrgî Mindalan, Hêlaney Mindalan, Mişke, Hacîle, Asoy Mindalan, Kovarî Heng û hwd. Kovara Heng yek ji kovarên girîng yê zarokan bû ku demek dirêj xizmeta wêjeya Kurdî ya zarokan kiriye, ji ber vê jî me ji bo vê lêkolînê weke mînak bikar aniye.

3.3.KOVARA HENG

Kovareke perwerdehî û ronakbîriya giştî yê mehane bûye ji bo zarokan, ji aliyê wezaretê çanda hikûmeta herêma Kurdistanê ve hatiye weşandin û belav kirin. Hejmara yekemîn ya kovara Heng meha Adara sala 1993'yê derketiye. Hejmara dawî jî (174) di Adara sala 2011'ê de derketiye. Lê mixabin her di vê demê de heya amadekirina vê lêkolînê hatiye ragirtin.

Sikirtêrê nivîsîna hejmarên destpêkê Mewlûd Îbrahîm Hesên bûye, li hejmara 12'ê pê ve desteyek nû ji bo kovarê hate destnîşan kirin û Yasemîn Mehmûd Berzencî bû sernivîskar, bêyî ku desteya nivîskaran bê diyar kirin. Di hejmara 13'ê pê ve sernivîskarê kovarê bû Heme Salih Ferhadî û rêveberê îdarî hate zêde kirin û Guler Hebîb Siyemensûrî jî ji bo vê postê hate erkdar kirin. Her wiha desteya nivîskaran jî ev kesane bûn "Rostem Bacelan, Necat Refîq Hilmî, Soran Îzedîn Feyzî". Tenê di hejmara (36)ê de posta cêgirê sernivîskar hate ava kirin û Yasemîn Mehmûd Berzencî ji bo vê postê hatiye erkdar kirin.

Di hejmara 66'ê pê ve ji bo cara yekemîn posta rêveberê nivîsînê zêde bû û Guler Hebîb Siyarostemî ji bo vê postê hate erkdar kirin. Hemî hejmarên vê kovarê li weşanxaneya wezaretê ronakbîriyê li Hewlêrê hatîne weşandin. Buhayê hejmara yekemîn dînarek bûye û paşê guherî ye û hejmara dawî jî bi 500 dînanan hatiye weşandin.¹⁹²

¹⁹² Îdrîs 'Ebdula Mistefa, *b.n.*, r. 10-12.

3.3.1. Teybetmendiye Kovara Heng

Hin Teybetmendiye baş ye Kovara Heng evin:

- Babetên kovarê ji bilî zaraveya Soraniyê bi zaraveya Kurmancî jî hatine belav kirin.
- Ji aliyê perwerdehiyê ve weke naverok, babet li gor dîn û nerît û Kevneşopa gelê Kurd e û sûd darin.
- Bi sedan nivîskar û wergêr û amadekar û wênekêş, berhem û mijarên binirx tede nivîsandin e, ev jî bûye sedem ku ev berhemê tê pêşkêş kirin, ji bo zarokan sudeke gişt alî hebe.
- Rûpelên hin hejmaran, bi taybet hejmarên dawî rengreng in û ev tişte tameke zedetir dide zarokan.
- Piraniya babeta kurt in û ev jî yek ji taybetmendiye girîng ye mijarên zarokan e, Ji ber vê jî bi awayekê baş armancan dighînin.
- Zimanê nivîsandinê hêsane û li aloziyan dûre, ev çende jî ji bo zarok xwedî sudeke zedetire, Ji ber ku bi hêsaniyê fêhm dike û ji bal wî zedetir tê hez kirin.
- Berhem bêhtir weke çîrok û helbest hatine danan, ev formên wêjeyî armancê bi awayekê hêsantir dighînin.
- Kovareke temendirêje heyama 18 salan û bi 174 hejmaran xizmetek pir zêde bi zarokên Kurd kiriye.¹⁹³

3.3.2. Çîrokên Kovara Heng

Kovara Heng yek ji wan kovarên Kurdî ye zarokan e ku xwedî temenek dirêj e û girîngiyeke pir zêde daye çîroka zarokan. Dikarin bibêjin di piraniya hejmaran de derdora heft çîrokên cur bi cur û di nava wan de jî rêjeyek zêde ji çîrokên ajalan ji bo zarokan hatine pêşkêş kirin, ji ber vê jî kovara Heng di dewlemendkirin û bervepêşbirina hemî awayên çîrokên belavkirî ye zarokan de bandoreke xurt hebûye. Her wiha hebûna bingeh û teknîkên bihêz ye hunerî di çîrokên kovara Heng de, bûye sedem ku ev kovara zarokan bandoreke mezin le ser pêşketina asta hunerî ya çîrokên zarokan di wêjeya Kurdî de hebe.¹⁹⁴

¹⁹³ Îdrîs 'Ebdula Mistefa, *b.n.*, r. 138.

¹⁹⁴ Bnr.: Rizgar 'Ebidulqadr Se'îd, *b.n.*, r. 25, 77 (beşa 3).

Lêkolîner Pexşan Mihemmed Mehmûd li ser vê bawerê ye ku nivîskarên çîrokên zarokan yê kovara Heng jî weke nivîskarên kovara navdara Iranî ya zarokan “Kêyhanê Beçêha” jî bo afirîneriya mijarên cur bi cur û şewaza pir reng, di bikaranîna cureyên gotûbêjan de weke teknîkeke bingehîn di nivîsîna çîroka zarokan, hewlek baş dane.¹⁹⁵

Di vegotina çîrokê kovara Heng de teknîkên weke (Wesif, Diyalog , Monolog û hwd) hatîne bikar anîn. Şewaza vegotina çîrokan bi awayeke giştî li gor hêz û xwasta zarokan e û zimanê çîrokan jî zimanêke gûncav e, her wiha di awahiya huneriya çîrokan de bi awayeke giştî, bingehên sereke yê weke (bûyer, vegotin, kesayetî, cih û dem) hene.¹⁹⁶

Li ser esasê çîrokên kovara Heng, mirov dikare amajê bi hin xalan bike.

-Cudayîya çîrokan jî hêla kurtî û dirêjîyê ve, hin çîrok jî laperekê kêmîtir in û dişibine peyamek biçûk, lê belê hin yê din dirêj û du lapere ne.

-Nehatiye diyarkirin ku çîrok jî bo kîşan temenê zarok hatîne nivîsandin.

-Piraniya çîrokan an hemiyana wêne an bêhtir jî wêneyekê di gel de, herçiqas asta huneriya hin jî wan wêneyan nizm e.

-Di her hejmareke kovarê de rêjeyeke zêde jî hemî cureyên çîrokan hatine belavkirin.

Dikare çîrokên kovara Heng bi awayeke giştî li ser wan cureyên jêr dabeş bibe:

1-Çîrokê nivîskî yê xwemalî anku jî aliyê nivîskarên Kurd ve jî bo zarokên Kurd hatîne nivîsandin.

2-Çîrokên wergerkirî li zimanên biyanî û bi taybet li zimanên 'Erebî, Farsî, Tîrkî, Îngilîzî û hwd.

3-Çîrokên amadekirî an wergirtî ji folklorê dewlemendê Kurdî.

4-Çîroka Sînyayokirî an ku çîroka wêne û nîgar bûye parçeyek bingehîn ya vegotina vê, bêtir wêneyan çîrok na temam dibe.

5-Çîroka sazkirî bi awayê helbest û hozanê.

¹⁹⁵ Pexşan Mihemmed Mehmud, *Diyalog Der Dastanheyê Farsî Ve Kurdiyê Kûdekan Ber Mebnayê Mecelat Kêyhanê Beçêha û Heng (1993-2000)*, Teza Master, Danişgah Selaheddîn, 2009, r. 155.

¹⁹⁶ Bnr.: Rizgar 'Ebidulqadr Se'îd, *b.n.*, r. 153.

3.3.3.Di Kovara Heng de Cureyên Çîrokên Ajalan

Jiyana mirov bi awayeke giştî, jîndar û nejîndar, tiştên biçûk û mezin, madî û menewî, ev hemî dibine çavkaniyek girîng ji çavkaniyên çîrokên zarokan, bi taybet ajal û teyr û sirûşt û ev tişt û jîndarên ku li derdora zarokan hene û li wan nêzik in, bandorê ji hest û hiş û xeyala zarokan dikin û dibine çavkaniya sereke ji bo çîroka zarokan. Ji ber vê çendê jî tu kovareke zarokan nîne ku tijî çîrokên cur bi cur yên ajal û sirûşt bi awayeke giştî nebe.

Di nava çîrokên kovara Heng (Salên 2001-2011)ê de an ku di sînorê lêkolîna me de ku hejmarên 59 heya 174'ê li xwe digre, rêjeyeke zêde ji çîrokên ajalan hatîne belav kirin, dikarîn wan çîrokên ajalan bi çend cureyan dabeş bikin weke wane

- 1.Çîroka ajalên kedî û kûvî.
- 2.Çîroka teyr û firindan.
- 3.Çîroka jîndarên avî (masî,...hwd).
- 4.Çîroka bihukan (mêrû û heşerat).
- 5.Çîroka nejîndar û sirûştê (rehek û dar, roj, zevî, çem,...hwd).
- 6.Teyr û nejîndar.
- 7.Bihuk û nejîndar.
- 8.Teyr û ajal.
- 9.Nejîndar û ajal.
- 10.Bihuk, ajal, teyr, nejîndar û mirov.
- 11.Teyr û mirov.
- 12.Nejîndar û mirov.
- 13.Ajal û mirov.
- 14.Ajalên avî û mirov.
- 15.Bihuk û mirov.
- 16.Ajal û teyr.
- 17.Marmarkî... hwd.

3.3.4. Di Kovara Heng de Nirx û Bihayên Exlaqî û Perwerdeyî

Hêla naverokê weke hêla hunerî pir girîng e, bi taybet di çîroka zarokan de, ji ber ku çîrokbêj an çîroknivîsê zarokan bi liberçavgirtina hîmên çîrokên zarokan, dixwaze bi awayeke sanahî û balkêş peyemek exlaqî û perwerdeyî bide zarokan. Çîrokên kovara Heng (ji bilî ku asta huneriya wan çawaye) bi hemî cureyên xwe, tijî şîret û nirxên exlaqî û perwerdeyî ne. Di kovara Heng de li her çîrokeke ajalan de nirxek an çend nirx tên dîtin. Zarok her çava bi rêya tevlîbûna cîhana balkêş ya ajalan û xweşî girtina ji wan çîrokan hez dikin, bi heman şêwazê hînî gelek nirxên perwerdeyî û exlaqî û civakî dibin û di jiyana rojane de jî sûdê jê digrin.

Di çîrokên ajalan yê kovara Heng de, gelek nirxên perwerdeyî cih digrin weke mînak teşwîq kirina zarokan ji bo temîzî û parastina saxlemiyê bi awayeke baş, parastina jînge, gul û dar, teşwîq kirina zarok ji bo xwandina pirtûkan, azarnedana ajal û jîndaran, teşwîq kirina ji bo pişt bi xwe girêdanê û hîlbijartina hevalên baş, hevkarî û alîkarî kesên ku pêwîste, nîşandana reftarên ne qenc yê weke ezhezî û xwexwazî û direvkin, aqehdarbûn li firt û fêlên fêlbazan û hwd.

Ji bo nirxan çend çîrok weke mînak:

3.3.4.1. Parastina Jîngehê

Di çîroka “**jînge**”¹⁹⁷ de her wekî ku li nav û nîşana çîrokê jî tê dîtin, çîrokbêj li ser zimanê komek ajal û firindeyên weke simore, keroşk û beytik zarokan hişyar dike û şîretê dide wan ku jîngê biparêzin û dema geşt û seyranê, bermaka xwarina xwe kom bikin û fire nedin vê derê **"Bonî ew pîsîyey ke le cêgakeda firêyan dabû serincî giyanleberanî rakêşa û hatin bo cêgake. Mam simore gutî:- Ey hawar em hemû zible çîye lêre?!-Mam kerwêşkîş le heman katda gutî: -Eme karêkî zor xirap û nalebare"**, paş ku ji bo jara duyamîn zarok vedigerên heman cih û karê xwe yê ne qenc dubare dikin, her di vê demê de yek ji jîndaran wan li karê wan yê xirab agadar dike û ji van de dibêje ku **"Pîskirdinî em cêgaye debête hoy nexoşî bo ême û bêçuwekanman û lenawçûnman, herweha debête hoy nexoşî bo êweş"**.

Di dawiyê de jî şîreta ev ajal bandorê li zarokan dike û poşman dibin û daxwaza lêborînê jê dikin û paşê jî soz didin ku car din ev karê xirab dubare nekin.

¹⁹⁷ Solîn Mehdî Salih, "Jînge", *Heng*, J. 147, Mijdar 2008, r. 12-13.

Çîrokbêj dixwaze ku zarok xwe weke hevalê jîngehê bizanin û temîziya jîngehê biparêzin her wekî çîrok bi dawî tê û amajê pê dike ku **"Înca hawrêkan destiyankird be pakkrdinewey şiwêneke û supasî giyanleberekaniyan kird,... Biriyaariyan da ke lemewdiwa bibin be hawrêy jînge û rênmayî xelik biken bo pakuxawênî jînge"**.

3.3.4.2. Teşwîq Kirina Zarokan ji bo Xwandinê

Di çîroka **"Dermanî Janeser"**¹⁹⁸ de hirçek xwedî sê kudiyan e û di vê demê de janeserê digre, daxwazê ji kudiyên xwe dike ku dermanê janeserê jê re peyda bikin. Sê kudiyên vê li derdora xwe dizivirin û tenê bi dermanê kudiyê sêyem janesera hirça dê derman dibe, derman jî xwandina pirtukê ye, çîrokbêj di du lapereyan de û bi vî awayî zarokan ji bo xwandinê han dide û pirtûkan li pêş çavên wan şîrîn dike û dibêje ku **"Beçkey sêyem destî kird be gêranewey nawaxinî kitêbeka... gelê qise û bas û şîrî ciwanî bo xwendewe... wirçe bor... beyanî zû ke le xew hesta beçkey sêyemî maç kird û gutî:-berastî bo janeser her ew dermane be kelke.. bijî ew pêûs û kitêbey çarey janeser dekat"**.

3.3.4.3. Hînkirina Zanist û Zaniyaariyan

Di çîroka pir kurt ya **"Roj û Hewir"**¹⁹⁹ de çîrokbêj/çîrokgêr bi zimanê ewrê çend zaniyaariyên kurt yê roj û ewrê dide zarokan **"Pele hewreke gutî:-... hemû rûnakî cîhan le sayey toweye, eger rûnakîy to û baranî min nebê, hemû xelkî ser zewî birsîyan debêt û cîhan lenaw tarîkîda niqum debêt û mindalanîş natwanin bixwênin û yarî biken"**.

Di çîroka **"Giftugoy Nêwan Dirext û Kerwêşik"**²⁰⁰ de jî ji ber sersambûna keroşkê ji werîna pelên darekê û gotûbêja di navbera wan de, çîrokbêj nîşanî zarokan dide ku bi demarên biçûk xwarin ji bo pelên çiqên daran diçe, weke demarên xwînê yê jîndar û mirovan. Ku pel ketin tu car nikarin pê ve pê zeliqandin, lê biharê bixwe dê dîsan şîr bin **"Kerwêşeke lew kare serî surma lewey ke çon ew gelayane bew xêrayîye dewerine ser zewî û ew direxte û dirextekanî tirîş bê gela**

¹⁹⁸ Ehmed Mihemed Îsmâîl, "Dermanî Janeser", *Heng*, J. 88, 2003, r. 8-9.

¹⁹⁹ Qasim Mihemed Mistefa, "Roj û Hewir", *Heng*, J. 61, Adar 2001, r. 6.

²⁰⁰ Xalîd Sabîr, "Giftugoy Nêwan Dirext û Kerwêşik", *Heng*, J. 80, Kanûn 2002, r. 8.

demêninewe. Dirextekey... pêy gut: **Xem mexo, ke behar hat carêkî tir liqekanim gela derdekenewe".**

Di çîroka "**Hengêkî Sawa**"²⁰¹ de bi sedema pîrsa mêşa hingiveka biçûk ji diya xwe di derbarê zistanê de, çîrokbêj dixwaze ku zaniyariyan bide zarokan di derbarê jiyana mêşa hingivê ku çava zivistanê radizê û nikare bête der. Ji ber ku mêş jîndareke xwînsare û ne weke jîndarên xwîngerm e "**Siruşîfî ême waye le werizî zistan natwanîn le derewe bijîn, çunike le zîndewere xwên sardekanîn û... Her boye debê bedrêjayî werizî zistan lenaw şitekanmanda bixewîn. Em xewtine yarmetîman dedat ke çend mangêk bijîn be pişitbestin bew wizeyey leşman...**".

3.3.4.4. Azarnedana Jîndaran

Di çîroka "**Amojgarîy Pepûle**"²⁰² de çîrokbêj bi zimanê perwaneyeke nav bax, şîreta zarokan dide ku êrişê nekene ser perwane û jîndarên din. Zarêkê bi navê Azad di destpêkê de guh nade şîretê lê paşî perwane şîret û îbretê dide zarok û ev bi serî tê ku ji ber ketina li set dirêkê gulekê de birîndar dibe, paşê jî peşîman dibe "**Bibûre pepûley azîz, beniyazbûm bitgrim û balekant lêbikemewe, belam to le min wiryatir buwît. Lem karewe waneyekî taze fêrbûm ewîş eweye azarî hîç giyanleberêk nedem û ta hetaye hawrêy gul û pepûle bim**".

Di çîroka "**Şivan û Çolekeke**"²⁰³ de zarokek bi navê Şivan kevirekê li beytikekê dide û roja paştir beytik jî dixwaze ku tolhildanê bike ji ber vê jî kevirekê lê dide, lê paş gotûbêjekê di navbera wan de pêk tên û dibin hevalê hevdu. Çîrokbêj dixwaze ku hemî zarok mîna Şivan jîr û jêhatî bin û tu caran keviran li firindeya nedin û li hemberî wan dilovan bin "**Lew rojewe Şivan û ew çolekeye bûne dû hawrêy giyanî be giyanîy yektirî û..., çolekeke hemû beyanîyek zû Şivan le xew heldestand, Şivanîş be çend denikêk genim pêşwazî lê dekird**".

²⁰¹ Ferhad Qadir Omer, "Hengêkî Sawa", *Heng*, J. 163, Nîsan 2010, r. 2.

²⁰² Çinar Namîq, " Amojgarîy Pepûle", *Heng*, J. 85, 2003, r. 5.

²⁰³ Tahîr Salih Seîd, " Şivan û Çolekeke", *Heng*, J. 98, Îlon 2004, r. 4.

3.3.4.5.Reftara Neqenc ya Ezperestîyê

Di çîroka "**Simorey Xowîst**"²⁰⁴ de di nava çend simboreyên daristanê de simboreyek ezhez û xwexwaz hevkarîya yê din nake, paşê ku lêmişt/lehî ra dibe û ev simbore bi tûşî karesatê dibe, yê din hevkarîya vê dikin û vî rizgar dikin. Di vir de çîrokbêj vê çendê nîşanî zarokan dide ku xwexwazî û ezhezî du taybetmendiyên xirab in û wan şîret dike ku xwe li wan du taybetmendiyan biparêzin "**Baran westa û lafaweke kip buwe û simore xowîsteke leserman û le birsan heldelerizî û lew nawe dexulayewe. Hawrêkanî bezeyiyan pêdahatewe û çûne lay û birdiyanewe malî xoyan û giwêzêkî zoryan bo dana û têrî xward... û peşîmanîy xoy derbirî û têgeyşit ke ewey lûtberiz û lexobayî û xowîst bêt, hergîz le jiyanda serkewtû nabêt**".

3.3.4.6.Reftara Neqenc ya Serhişkiyê û Guhdar Nebûn

Di çîroka "**Lasarî**"²⁰⁵ de qazekê sê têşik hene û yek ji wan pir nerawestayî ye û karên wisa dike ku ne di cihê xwe de ne, ji ber vê jî diya xwe bêzar kiribû, rojekê di encama serhişkiya xwe de rêya vegeerê berze dike û roviyek êrişê dike ser, çîrokbêj zarokan şîret dide ku ger weke ev têşika qazê serhişkiyê bikin û guh nedin gotin û şîreta dê û bavê xwe, dê tûşî bobelatên pêşbînî nekirî bîn û jiyana wan dê rû bi rûyê metirsîyan bibe "**Rojêkiyan daykiyan xerîkî xorak peydakrdin debêt, amojgarîy beçkekanî dekat ke lew dewrubere dûrnekewnewe, keçî bêçuwe bizêweke giwêy be qise û amojgarîyekanî daykî neda... Serencam rêwîyekî lê peydadebêt û pelamarî dedat**".

Her bi vî awayî di çîroka "**Bêçuwe Kerwêşkêkî Lasar**"²⁰⁶ çîrokbêj zarokan aghdarê gefên serhişkî û guh nedana şîretên dê û bavan û mezinan dike, lê ev care bi rêya serhatiya keroşk û du zarên vî ku yek ji wan serhişk û neguhdar e, di encamê de tûşî roviyek dibe û kêr dimîne ku êrişê bike ser "**Daykiyan le maleweş amojgarîyi bêçuwekanî kirdbû, le metirsîy rêwî û balinde goşt-xorekan agadarî**

²⁰⁴ Kazim Koyî, "Simorey Xowîst", *Heng*, J. 113, Kanûn 2005, r. 4.

²⁰⁵ Şaxewan 'Elî Ehmed, "Lasarî", *Heng*, J. 131, Hezîran 2007, r. 21.

²⁰⁶ 'Ebidulrehman Me'rûf, "Bêçuwe Kerwêşkêkî Lasar", *Heng*, J. 94, Gulan 2004, r. 10.

kirdbûnewe,... Keçî bêçuwe lasareke her ember û ewberî dekird û heldeperî, daykî carêkî dîke bangî kird, belam ew her daye lamilî û diwayan nekewt".

3.3.4.7. Teşwîq kirin ji bo Pişt bi Xwe Girêdanê

Di çîoka pir kurt ya "**Kerwêşik û Zerafe**"de²⁰⁷ zirafeyek di daristanê de du keroşka dibîne ku dixwazin bi pêpelingekê çend sêvan jê bikin, zerafe dixwaze ku hevkarîya wan bike lê ev spasiya wî dikin û di vê karî de pişt a xwe bi xwe girê didin. Çîrokbêj zarokan han dide bi vê çendê di karên xwe de weke wan du keroşkan pişt a xwe bi xwe girê bidin û hevkarîya xelkî bikin "**Zerafekeş gutî:-aferîn bo êwe kerwêşke ciwanekan ke le cêbecê kirdinî karekanî xotanda pişit be xotan debestin**".

3.3.4.8. Agehdarkirina li Deb û Dolabên Fêlbazan

Di çîroka "**Mişke Jîreke**"de²⁰⁸ pişîkeke zik/hur mezin dixwaze mişkek biçûk bixapîne û bixwe, herçenda mişik biçûk e lê pir zîrek û hişyar û jîr e û bi sanahî baweriyê bi kesên biyanî naine û nakeve dawa fêlên fêlbazan de "**Pişîleke wirde wirde xoy le mişkeke nizîk dekrdewe taku pelamarî bidat, belam mişke biçkoleke zor le pişîleke jîrtir bû, boye pêy gut: pişîle giyan,... Boye natwanim pêşbirkêt legelda bikem, belam birakem le jûreweye, eger hez dekeyt ba ew pêşbirkêt legelda bikat**".

3.3.4.9. Hilbijartina Hevalên Qenc û Baş

Di çîroka "**Hawrêyetî Esip û Masî**"de²⁰⁹ çîrokgêr zarokan ji bo hilbijartina hevalên baş û wefadariya li hemberî wan han dide. Ji ber vê jî hevaltiyek di navbera hin masiyên nava çemekê û hespeke sipî yê nizîk wan çê dik, paş ku ev hevdu nas dikinû dibin rêheval dibêje ku "**Lew rojewe esip û masîyekan bûne hawrêy yektir û hemû rojêk legel rojhelat esipeke bo awxwardinewe deçuwe ser çemî aweke û masîyekanîş gijugiya û gulî ciwaniyan bo dehêna û pêşkeşyan dekird**". Vêca

²⁰⁷ Emîr 'Ebidulstar Mihemedemîn, "Kerwêşik û Zerafe", *Heng*, J. 70, Sibat 2002, r. 7.

²⁰⁸ Azad Tofîq, "Mişke Jîreke", *Heng*, J. 95, Hezîran 2004, r. 26.

²⁰⁹ Naz Felekedîn Kakeyî, "Hawrêyetî Esip û Masî", *Heng*, J. 135, Cotmeh 2007, r. 5.

rojekê firindeyê masîgir tê û dixwaze ku masiyan bixwe, lê hesp, rêhevaleke wefadar e û yarmetiya wan dike û wan rizgar dike **"Masîyekan hemû têkra hawariyan kird û gutîyan: werin firyaman bikewin, pêwîstman be yarmetiye... Masîyekan supasî espekeyan kird û belêniyan da ta detwanin dawa le çemeke biken bo ewey awî xoy rûntir bikat, ta hawrêkeyan têr aw bêt"**.

3.3.4.10. Hevalî û Yarmetiya Hevdu

Di çîroka **"Xoşewîstî Kerwêşik û Simore"** de²¹⁰ çîrokbêj şîretê dide zarokan ku hevkarîya hevalên xwe bikin, bitaybet di demên pêdivî û tengasiyan de, her wiha pêwîste li hember çakiya hevalan wefadar bin weke ev simbore û keroşka ku hevalên hevdu bûn û pir ji hevdu hez dikirin **"Simoreyekî hawrêy dengî kerwêşeke denasêtewe, guric dête derewe û her lew ser darewe hawar le xêlî simoran debestê, ewanîş destbecê û heryeke be koşêk giwêzewe le kune daran dêne derê û rêwîyeke be ber giwêzan deden"**.

Di çîroka **"Friyakewtin"** de²¹¹ kotireke zirav ji ber baran û sermayê li rê de maye û zarên wî jî çaverê ne ku xwarinê ji wan re peyda bike. Teyrê darkok jî wî tiştî dizane û bi hewarê diçe û li vê taliyê rizgar dike. kotir û zarên vê jî li hember vê çakiyê spasiya darkokê dikin. Çîrokbêj dixwaze zarok hertim bi hewara wan kesan biçin ku pêwîste hevkarîya wan bê kirin û yarmetiya hevdu bikin, her wiha yê ku çakî pê tê kirin, pêwîste spasdar û wefadar be **"Darkunkere gutî:-xefet mexo firyat dekewim... Înca be denûke req û sextekey kewte teqe teq kirdin, kunêkî gewrey le qedî dartuweke kird û kotire barîkekey serxist û birdîye nawîyewe û gutî:-em zistane êre bo xot û bêçuwekant başe..."**.

3.3.4.11. Xavênî û Saxlemî

Weke mînak di çîroka **"Pakuxawênî"** de²¹² de bi rêya serhatî û gotûbêja di navbera çar mîkrobên qelew û hin mîkrobên lewaz, çîrokbêj dixwaze ku zaroka ji zirarên hin karên nesaxlem yên weke nînok lê nedan neşoştina fêkî û xwarinên sernegirtî, her wiha diran neşoştin bitaybet di dema şevê û paş xwarina şîrînatîyê, ku her wiha bêyî şoştina dest û çavan û diranan radizên, paşê jî ji ber vê çendê diranên

²¹⁰ Şewbo Yehya Xidir, "Xoşewîstî Kerwêşik û Simore", *Heng*, J. 98, Îlon 2004, r. 26.

²¹¹ Ehmed Husên Ehmed, "Friyakewtin", *Heng*, J. 157, Cotmeh 2009, r. 8.

²¹² Sirwe Mistefa 'Elî, "Pakuxawênî", *Heng*, J. 108, 2005, r. 4.

wan xira dibin û êşê digrin û gelek nexweşîyan digre. Çîrokbêj bi zimanê yek ji mîkrobên qelew vê çendê ji bo zarokan eşkere dike û dibêje: "**Mindalêkim bînî nînokekanî dirêjbûn û pîrbûn le pîsî, carcarêkîş destî bo demî debird û be didanekanî nînokî deqrtand, minîş yekser bo jêr nînokekanî ramkird û xom heşarda taku têrbûm, paşan mindalekem nexoş yexist**".

Di dawiya çîrokê de jî çîrokbêj bi zimanê mîkroba lawaz vê çendê eşkere dike ku zarokên xavên nexweşîyan nagirin "**Mîkrobe lawazekanîş gutiyan: belam hoy lawazîyê me eweye be pêçewaneyê we deçuwîne lay her mindalêk pakuxawên bû, be hîç şêweyek pasewanekan, wate -xiroke sipîyekan- neyan dehêşit mindalekan nexoş bixeyn, leber ewe eme lawazbuwîn û maweyekî zore hîç xwardinêkman nexwarduwe**".

Di çîroka "**Giftugoy Nêwan Pepûle û Mêşûle**"²¹³ de çîrokbêjbi sedema zarokê bi navê Salar ku gotûbêja di navbera perwane û mêşê guhdar dike, zaroka li zirara mêşê agehdar dike ku ji ber pîsî û temîz neşostina dest û rûyê xwe bi awayeke paqij, mirov nexweşîyan digre. bi zimanê mêşê dibêje: "**Min nebim kê ciyawazî dekat le nêwan mirovêk ke hemû rojê xoy bişorê û ... Mirovêk ke pîs û poxl bêt û dest û demî ciwan neşorê**"? Paşê jî di dawiya çîrokê de çîrokbêj dixwaze hemî zar wekî Salar yê lehengê çîrokê biryar bidin "**Salar ke giwêy lew qisane bû pelamarî mêşûlekey da û biriyarî da ke lemewdwa hemû rojêk xoy bişwat û nînokekanî be pakî rabgirê û ... Bergî pîsî firê bidat**".

²¹³ Xezale Yûnis, "Giftugoy Nêwan Pepûle û Mêşûle", *Heng*, J. 138, Sibat 2008, r. 13.

ENCAM

Di dawîya vê xebatê me de hin encam û pêşniyarên jêrî derketin holê.

1. Têkeliya mirov bi ajalan û jîndarên derdorê, vedigere kevintirîn serdemên bi hev re li ser rûyê vê zeviyê jiyan kirine. Di berê de ajalan bala mirovan kişandiyê û mirov bi wan re mijûl bû e. Têkeliyeke derûnî bi wan re çêbûye, ji hêla maddî jî eşkereye pir sûd jê hatine. Mirov li hin ajalan tirsîyaye û xwe ji wan parastiyê, hinek ji li wan kevî kirine û li bal xwe xwedî kirine û sûd lê wergirtine.

2. Hêla têkeliya derûnî ya mirov û ajal gihiştîye astekê ku mirov bi çaveke pir bilind û pîroz li ajalan mêze bike, heya bighêje vê astê ajalan weke xwedawend lê mêze bike û bi periste. Perestîna ajal û rehek û tiştên nejîndar heya îro jî di nava gelên paşketî û xwedî şaristanî jî tê dîtin. Di nava wan de jî mînaka herî zelal çêlek perestîna Hîndoyane li welata Hindistanê. Di encama ev têkeliya ruhî de jî, mirovan bi hizr û xeyala xwe gelek xurafe, efsane, hîkayet û çîrokên ajalan afirandine.

3. Bermayiyên wêjeyî yên netewî yên navdarên cîhanê, weke hîkayetên “Pancatinitra” hîkayetên Kelîle û Dimne, çîrokên Îsop, çîrokên Hezar û Yek Şev û hwd. ku tijî çîrokên ajal û jîndaran e, bandoreke mezin li ser jiyan û wêjeya gerdûnî de hebûye û li bal netewên cîhanê bûyne çavkaniyên pir girîng û bitaybet ji bo nivîskarên wêje û çîrokên zarokan. Ji ber vê jî destpêka peydabûna çîrok û wêjeya zarokan li bal Kurdan jî weke netewên din, li ser binyada efsane, hîkayet, wêjeya netewî û folklor hatiye damezrandin. Di folklorê Kurdî de jî hejmareke zêde ya hîkayetên jîndara û teyr û nejîndaran tê dîtin.

4. Di nava wêjeya zarokan de, çîrok hunera herî bi bandor ya wêjeyê ye, avakerê bîr û bawer û bingeha geşekirina hizra zaroka ye. Ji ber ku zarok pir ji çîrokê hez dike û li karakter û lehengên di nava çîrokên de hînî gelek zaniyarî û reftaran dibê. Zarok têkelî nava kesayetiyên çîrokê dibê û dixwaze wan teqlîd bike.

5. Çîroka ajalan çavkaniya herî dewlemend ya wêjeya zaroka ye. Ev cureyê çîrokê weke “Fable” jî tê binav kirin û ji çîrokên ku lehengên wan ajal an her tişt û nejîndarê din an mirove pêk tê. Yanî di “Fable”yê de leheng û leyizvan tenê ajal nîne belkî dar û tiştên nejîndar jî li xwe digre. Di wêjeya Kurdî ya zarokan de peydabûna yekem û destpêka çîroka zarokan li cureyê çîroka ajal û jîndaran pêk tê. Di çavkanî û

lêkolînên Kurdî yên taybet bi wêjeya zarokan, ji bo cureyê çîroka ajalan gelek pênaseyên cur bi cur û têgeh û binavkirinên cuda hene û tên bikaranîn.

6.Li gor lêkolîn û îstatîstîkan, zarok di her du qonaxên yekem yên temenê xwe de, yanî qonaxên (3-5) û (6-9) saliyê de bi muqayese di gel çîrokên din zêdetir ji çîrokên ajal û nejiândaran pir hez dike. Çîrokên ajalan hest û hişê zarokan ji bo aliyê xwe radikêşin. Her wiha ji bilî ku zarokan dilxweş dikin, xwedî armancê perwerdehiyê ne û şîret û sûdeke zêde jî ji bo zarokan hen e.

7.Rojnamegeriya Kurdî yê zarokan bi awayeke taybet, bandoreke mezin li ser peydabûn û pêşveçûna çîroka zarokan û di nav wan de jî çîroka ajalan kiriye. Tu kovareke Kurdî yê zarokan nayê dîtin ku ser û binê vê tijî çîrokên ajal û sirûşt û nejiândaran nebe. Kovara Heng yek ji wan kovarên girîng yên zaroka ye ku li başûrê Kurdistanê û di nava salên 1993-2011 de bi weşandina 174 hejmaran bandoreke mezin hebûye di pêşvebirina çîroka zarokan û bi sedan çîrokên ajalan têde hatîne belav kirin.

8.Kovara Heng girîngiyeke mezin daye çîroka zarokan û di nav de jî rêjeyeke zêde li cureyê çîroka ajalan pêşkêşî zarokan kiriye. Çîrokên ajalan yên kovara Heng gelek cure û şewazên çîrokan li xwe digre. Di naveroka wan de gelek biha û nixên exlaqî û perwerdeyî yên zarokan cih digrin. Em pêşniyar dikin ji aliyê komeke pispor ve bijartek ji van çîrokan, di nav pirtûkekê de bînin komkirin û bi awayeke serdemî, balkêş û tijî ji wêneyên rengreng bê weşandin.

9.Kovara Heng di demê borî de xizmeteke mezin bi zarokan kiriye. Ji ber vê jî em pêşniyar dikin hikûmeta Herêma Kurdistanê dîsan dest bi weşan û belavkirina vê kovarê bike. Bi awayekê ku kesên pispor, şarezayên ziman û wêjeya zarokan, pisporên taybet bi derûnasî û perwerdeya zarokan têde bixebitin.

ÇAVKANÎ

TEFSÎR

QURANÎ PÎROZ, (Wer.: Hejar), ç. 2, weş. Îhsan, Îran, 2010.

TEFSÎRA BÎ SANAHÎ BO QURANA PÎROZ, (Wer.: Tehsîn Îbrahîm Doskî), ç. 2, 2008.

WERGERA MANEYA QUR'ANA PÎROZ SER ZÎMANÊ KURDÎ, ç. 7, (Amd.: M. Huseyn Êsî, M. Se'îd Girdarî, yê din), weş. Aryan Basim, Istanbul, 2016.

FERHENG

BEHRÎ, Ehmed, *Ferhengî Balinde*, ç. 1, weş. Aras, 2001.

DOSKÎ, Mihemedemîn, *Ferhenga Spîrêz 'Erebî - Kurdî*, ç. 2, weş. Spîrêz, Dihok, 2016.

ESWED, Newzad Ehmed, *Ferhengî Zarawekanî Edeb û Zanîste Mirovayetîyekan*, ç. 1, weş. Xezelinûs, Silêmanî, 2015.

XERÎB, Kemal Celal, *Ferhengî Wênedarî Giyandaran Be Taybetî Le Kurdîstanda*, ç. 2, weş. Aras, Hewlêr, 2012.

PÎRTÛK BÎ KURDÎ

CAF, Hesên, *Çîrokî Niwêy Kurdî*, weş. Dezagay Roşinbîrî û Bilawkirdinewey Kurdî, Bexda, 1985.

ÇÎROKÊN HEZAR û ŞEVEKÊ, (Wer.: Serdar Roşen), weş. Nûdem, Stockholm, 1998.

EHMED, Nahîde, *Seretayek Derbarey Serheldanî Edebî Mindalanî Kurd*, ç. 1, weş. Mukriyanî, Hewlêr, 2005.

EHMED, Newzad 'Elî, *Mindal û Edeb*, ç. 1, weş. (?), Silêmanî, 1998.

'ELÎ, 'Îsa, *Çîrokî Kelebab*, (Wer.: Bo Ser Diyalêkta Kirmanciya Jêrî Giywî Mukriyanî), ç. 3, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr, 2582î Kurdî.

FEREC, Xalîde Qadir, *Çîrokî Mindalan Le Edebî Kurdîda 1970-1990*, ç. 1, weş. Çapxaney Şehab, Hewlêr, 2013.

- FERHADÎ**, Heme Salih, *Lebarey Rojnamenûsîy Kurdîyewe*, ç. 1, weş. Mukriyanî, Hewlêr, 2011.
- FETAH**, Mihemed Reşîd, *Nimûne û Lêkolînewe Le Edebî Mindalanî Kurd*, ç. 2, weş. Berêweberayeti Zîncîre Kitêbî Mindalan, Hewlêr, 2009.
- HESEN**, Mewlud Îbrahîm, *Geran Bedîway Nemirîyda*, ç. 1, weş. Aras, Hewlêr, 2002.
- HEWRAMÎ**, Heme kerîm, *Edebî Mindalanî Kurd*, b. I, ç. 1, weş. korî zaniyarî Kurdistan, Hewlêr, 2005.
- HUSÊN**, Hîmdadî, *Derwazeyek Bo Rexiney Edebîyî Kurdî*, ç. 1, Mukriyanî, Hewlêr, 2007.
- HUZNÎ**, Husên, *Sercemî Berhemî Husên Huznî* (Kokrdinewe û Leçapdan: Aras), b. I, ç. 1, weş. Aras, Hewlêr, 2007.
- ÎBN EL-MÛQEFE'**, 'Ebdulah, *Gelawêjî Kurdistan Kelîle û Dîmine Be Kurdî*, ç. 1, (Wer.: Hacî Mela Kerîmî Zengene), weş. Aras, 2001.
- ÎBN EL-MÛQEFE'**, 'Ebdulah, *Kelîle û Dmine*, ç. 1, (Wer.: Mihemedemîn Doskî), weş. Spîrêz, Dihok, 2004.
- ÎSOP**, *Çîvanokên Îsopî*, (Wer.: Fazil 'Umer), weş. Spîrêz, Dihok, 2004.
- ÎZOP**, *Çîrokekanî Îzop Yan Lenaw Giyandaran Da*, (Wer.: 'Ezîz Gerdî), weş. Çapxaney el-Hewadis, Bexda, 1982.
- KURDOYÊV**, Qenatî Kurdo, *Komele Têksitî Folklorî Kurdî*, weş. Korî Zaniyarî Kurd, Bexda, 1976.
- MÎSTEFA**, Îdrîs 'Ebdula, *Rojnamegerîy Mindalan Be Zimanî Kurdî*, ç. 1, weş. Çapxaney Roşinbîrî, Hewlêr, 2004.
- PERTEV**, Ramazan, *Zarok û Çîrok (Destpêka Pedagojiya Kurdî)*, ç. 1, weş. Doz, Istanbul, 2009.
- REMEZAN**, Mihemed Rehîm, *Mindal û Çîrokî Mindalan*, weş. Çapxaney Zankoy Selaheddîn, 1984.
- RESUL**, 'Îzeddîn Mustefa, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, ç. 3, weş. Aras, Hewlêr, 2010.
- RESUL**, Şukriye, *Edebî Folklorîy Kurdî - Beşî Duwem*, weş. Zankoy Selaheddîn, 1984.

....., Şukriye, *Hikayetî Folklorîy Giyandaran*, ç. 1, weş. Înstîutî Kelepurî Kurd, Silêmanî, 2005.

SALÎH, Muhsîn 'Arif, *Çîroka Zarokan Li Devera Behdînan 1980-2004*, ç. 1, weş. Spîrêz, 2007.

SEBRÎ, Razaw Reşîd, *Çîrokî Mindalan Le Edebî Kurdîda (1991-2005)*, weş. Bilawkrawekanî Ekdîmyay Kurdî, Hewlêr, 2010.

TEHE, 'Ebdulsemed Îslam, *Rengdanewey Edeb Le Govarî Hawarda*, ç. 1, weş. Aras, 2002.

XEZNEDAR, Me'rûf, *Mêjûy Edebî Kurdî, b. I, II, III*, ç. 2, weş. Aras, Hewlêr, 2010.

PÎRTÛK BÎ 'EREBÎ

BEHCET, Ehmed, *Qises el-Heywan fî el-Quran*, ç. 4, weş. Dar el-Şîruq, el-Qahîre, 2000.

BÎRÎXÎŞ, Mihemed Hesên, *Edeb el-Etfal Ehdafihî We Simatihî*, ç. 2, weş. Miweseet el-Rîsale, Beyrut, 1996.

'EBAS, Fezil Hesên, *Qises el-Quran el-Kerîm*, ç. 3, weş. Dar el-Nefays, 'Emman, el-Urdin, 2010.

EBUME'AL, 'Ebdulfetah, *Edeb el-Etfal (Weisalîb Terbiyetihîm Wete'lîmîhîm Wetesqîfîhîm)*, ç. 1, weş. Dar el-Şîruq, 'Emman, 2005.

ELHÎTÎ, Hadî Nu'man, *Seqafet el-Etfal*, weş. el-Meclis el-Wetenî lilseqafe uel-Finun uel-Adab- el-Kiweyt, 1988.

ELTUNCÎ, Muhemmed, *el-Mu'cem el-Mufessel Fî el-Edeb*, ç. 2, weş. Dar el-Kutub el-'Lmiye, Beyrut, 1999.

GESELD, Arnold, *el-Tifl Min el-Xamîse Îla el-'Aşîre*, b. I, (Wer.: 'Ebidul'ezîz Tewfîq Cawîd), weş. el-Heyae el-Mesriye el-'Ame Lilkitab, 1995.

HELAWE, Muhemmed el-Seyd, *el-Edeb el-Qisesî Liltifil*, weş. Miwessest Huris el-Dewliye, Eskenderiye, 2000.

HEMÎDE, 'Ebdulrezaq, *Qises el-Heywan Fî el-Edeb el-'Erebî*, weş. Mektebet el-Encilu el-Mesirye, el-Qahîre, (?).

KAMÎL, Mîrvet Muhemmed, *Medxel Îla Sehafet el-Etfal*, ç.1, weş. Dar el-Fikr el-'Erebî, el-Qahîre, 2003.

LAFUNTÎN, *Hikayat Min Lafuntîn*, (Wer.:Cibra Îbrahîm Cibra), ç. 1, weş. Dar Seqafet el-Etfal, Bexdad, 1987.

NECÎB, Ehmed, *Edeb el-Etfal ('Îlim Wefen)*, ç. 1, Dar el-Fikr el-'Erebî, el-Qahîre, 1991.

NUFÎL, Yusif Hesên, *el-Qise Weseqafet el-Tifl*, weş. el-Heyae el-Mesriye el-'Ame Lilkitab, 1999.

SE'DEDÎN, Kazim, *el-Hikaye el-Şe'biye el-'Raqiye - Dirase We Nisus*, weş. Dar el-Reşîd Lilneşr, Bexdad, 1979.

SELUM, Dawid, *Kitab Qises el-Heywan Fî el-Edeb el-'Erebî el-Qedîm*, weş. Dar el-Reşîd lilneşir, Bexdad, 1979.

TEZ

BEHÎCE, Sasî, *Hikayet el-Xurafe 'Ela Lisan el-Heywan (Îbn el-Muqefe' we Lafuntîn Enuzecen)*, Teza Master, Kulliyet el-Adab we el-Luxat, Camîet Telmesan, el-Cezayir, 2012.

MEHMÛD, Pexşan Muhemmed, *Diyalog Der Dastanhayê Farsî Ve Kurdiyê Kûdekan Ber Mebnayê Mecelat Kêyhanê Beçêha û Heng (1993-2000)*, Teza Master, Danişgaha Selaheddîn, Hewlêr 2009.

SE'ÎD, Rizgar 'Ebidulqadr, *Bînay Hunerîy Çîrokî Mindalan Le Çîrokekanî Govarî Heng (1993-2000)*, Teza Master, Kolêcî Ziman, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr 2008.

KOVAR

BACELAN, Rostem, "Çîrokî Mindalan (çemik, wergêran, nûsîn, amadekrdin, wênekêşan)", *Kovara Raman*, J. 117, 2007.

'EBAS, Mihemed Silêman, "Pîrozî Darudirext Le Efsane û Bawerî Kon û Milîda", *Kovara Raman*, J. 180, 2012.

FERHADÎ, Heme Salih, "Çend Berbestêk Leberdem Geşekrdinî Rojnamenûsîy Mindalanda", *Kovara Raman*, J. 161, 2010.

HESEN, Mihemed Ferîq, "Mindal û Çîrok", *Kovara Raman*, J. 161, 2010.

HEWRAMÎ, Heme Kerîm, "Merçe Gşitîyekanî Edebî Mindalan", *Kovara Raman*, J. 160, 2010.

HEWRAMÎ, 'Usman Mihemed, "Zimanî Mindal û Zimanî Nûsîn Bo Mindal", *Kovara Raman*, J. 109, 2006.

MEHMÛD, Fazîl Mecîd, "Helsengandinî Kitêbî (Edebî Mindalanî Kurd)", *Kovara Raman*, J. 207, 2014.

MÎHEMEDÎNÎJAD, 'Elî Reza, "Çon Be Witnewey Çîrok Felsefe Fêrî Mindalan Bikeyin?", *Kovara Raman*, J. 208, 2014.

REHMANÎ, Ehmed, "Çîrokekanî Hezar û Yek Şewe", (Wer.: Sara Ermenî), *Kovara Raman*, J. 116, 2007.

RESÛL, Yûsf 'Ebidulqadir, "Cîhanî Taybet Be Mindal", *Kovara Raman*, J. 186, 2012.

REZAYÎ, Yûnis, "Edebî Mindalan Çirayek Leser Rêyi Dahatû", *Kovara Raman*, J.168, 2011.

SALÎH, Cewad Hemed Beg, "Rojnamenûsîy Mindalan Le Başûrî Kurdistanda", *Kovara Raman*, J. 187, 2012.

SE'ÎD, Celal Enwer, "Gêranewe be Zimanî Ajelan Romanî (Gemalî) Xwsrew Caf be Nimûne", *Kovara Zankoy Koye*, J. 39, 2016.

ŞÊXANÎ, Zeyto, "Saykolojiyî Çîrokekanî Dapîre", *Kovara Raman*, J. 107, 2006.

CAVKANIYÊN ÎTERNÊTÊ

"Aesop", [http://www.hewalnews.com/Topic_4147_14], Gihîn: 11 Çile 2017.

"el-Etfal uel-Heywanat.. Sedaqe Wistiksaf el-Sifat",

[<http://site.alroeya.ae/2013/08/04/81634>], Gihîn: 20 Sibat 2017.

"Keyfe Tiwesir Terbiyet el-Heywanat el-Menziliye Fî Nemu el-Tifil".

[<http://alrai.com/article/581053.html>], Gihîn: 20 Sibat 2017.

"Lafontîn Keleefsanenûsî Çîrokeşî'r Bo Mindalan".

[<http://www.emrro.com/lafontin.htm>], Gihîn: 11 Çile 2017.

"Mêjuwî Edebî Mindalan", [<http://www.emrro.com/mejuyedebimindalan.htm>],

Gihîn: 11 Çile 2017.

"Orientalism- el-İstişraq: el-Nez'e el-Şerqiye"

[<http://www.feedo.net/LifeStyle/Arts/PlasticArts/Orientalism.htm>], Gihîn: 25 Çile 2017.

"Seykuluciyet el-'Laqe Beyine el-Tifil uel-Heywan",

[<http://paulaharika.com/goeoergd>] ,Gihîn: 20 Sibet 2017.

"el-Însan uel-Heywanat el-Elife 'Elaqet Leha Esraruha".

[<https://www.lebarmy.gov.lb/ar/content/الانسان-والحيوانات-الأيفة-علاقة-لها-أسرارها>], Gihîn: 25 Çile 2017.



PÊVEK-1


Ev Çîrokên Kovara Heng Ku Weke Mînak Hatine Bikaranîn:


1	Azad Tofîq, Mişke Jîreke, Govarî Heng, J. 95, Huzeyranî 2004.
2	Çinar Namîq, Amojgarîy Pepûle, Govarî Heng, J. 85, 2003.
3	'Ebidulrehman Me'rûf, Bêçuwe Kerwêşkêkî Lasar, Govarî Heng, J. 94, Maysî 2004.
4	Ehmed Husên Ehmed, Friyakewtin, Govarî Heng, J. 157, Tişrînî Yekemî 2009.
5	Ehmed Mihemed Îsma'îl, Dermanî Janeser, Govarî Heng, J. 88, 2003.
6	Emîr 'Ebidulstar Mihemedemîn, Kerwêşik û Zerafe, Govarî Heng, J. 70, Şubatî 2002.
7	Ferhad Qadir Omer, Hengêkî Sawa, Govarî Heng, J. 163, Nîsanî 2010.
8	Kazim Koyî, Simorey Xowîst, Govarî Heng, J. 113, Kanûnî Yekemî 2005.
9	Naz Felekedîn Kakeyî, Hawrêyetî Esip û Masî, Govarî Heng, J. 135, Tişrînî Yekemî 2007.
10	Qasim Mihemed Mistefa, Roj û Hewir, Govarî Heng, J. 61, Adarî 2001.
11	Sirwe Mistefa 'Elî, Pakuxawênî, Govarî Heng, Govarî Heng, J. 108, 2005.
12	Solîn Mehdî Salih, Jînge, Govarî Heng, J. 147, Tişrînî Duwemî 2008.
13	Şaxewan 'Elî Ehmed, Lasarî, Govarî Heng, J. 131, Huzeyranî 2007.
14	Şewbo Yehya Xidir, Xoşewîstî Kerwêşik û Simore, Govarî Heng, J. 98, Eylûlî 2004.
15	Tahîr Salih Se'îd, Şivan û Çolekeke, Govarî Heng, J. 98, Eylûlî 2004.
16	Xalîd Sabîr, Giftugoy Nêwan Dirext û Kerwêşik, Govarî Heng, J. 80, Kanûnî Yekemî 2002.
17	Xezale Yûnis, Giftugoy Nêwan Pepûle û Mêşûle, Govarî Heng, J. 138, Şubatî 2008.


PÊVEK-2

Çend Fotoyên Kovara Heng









JÎNENÎGARÎ

Agahiyên Kesane

Paşnav, Nav :KHIDHIR, Mohammed
Rajerî :Kovara Heng ya Zarokan
Cih û Sala Ji Daykbûnê :Erbil/ 1974
Têlefona : 05373414837
Faks :

E-mail :kteb74@gmail.com

Perwerde

Rade

Doktora

Lîsansa Bilind

Lîsans

Yekeya Perwerdeyê

.....

.....

Zanîngeha Selaheddîn – Hewlêr, Fakulteya

Wêjeyê, Ziman û Wêjeya Kurdî

Mêjûya

Destûrdariyê

.....

1995/1996

Tecrûbeyaya Kar

Sal

1997-2007

2008-heya niha

Cih

Hewlêr

Hewlêr

Peywir

Mamoste

Wezareta Çandê

Zimanê Biyanî

'Erebî

Weşan

.....

Xweşxwazî/Hobî

Ziman, Xwendinî, Nivîsîn, Werger û Gerok.